# ***Feqiyê Teyran 5***

*Abdusamet Yîgît*

Weşanên SORAN

.
.
.
.

*Feqiyê teyran 5*
*Abdusamet yigit*
Weşanên SORAN e
Çap 2.
.
Berlin- 21 tabaxa 2015
Berpirsiyariya Redaksiyonê: Zagros Baran
Grafîk û Design : Gazîn Han
.
email: han-grafik@hotmail.de
.
Çap û Grêdan :
Concept Medienhaus GmbH
Bülowstr. 56-57 10783 Berlîn
.
ISBN 978-3-945956-03-8

**FEQIYÊ TEYR5N-5**

Dem di harikî.Mirovan ji di jiyana xwe ye rojene de diçûn û dihatin.Herkesek bi karekî ve diçû û dihat.Her kesek bi derekê ve diçû û dihat.Dengê zarokan jiyan ji aliyekî din ve bixaml dikir.Mirovên kal ji ji xwe re li ber hêt rûnişti ne û bi hev re diaxiftin.Jin ji bi karê xwe yê rojene ve diçûn.Piştî ku sawal ji malê derketin û çûne çolê, êdî jinan ji kar û barê xwe yê malê dide dest pê kirin. Piştî çûna sawalan re pir karê wan hebû.Ji ber vê yekê ji ew ji hê ku roj derneketî bişavaqê re dirabûna ser xwe û bidest kirina karê xwe dikirin.Piştî ku sawal çû, êdî paliştin û paqijkirin, heyandin û li hev dan, li hevdana cihê sawalan û çêkirina tapik û pêvadan û hwd, hê gelek karê wan yên din ji ku dikirin hebû.Wan ew kar hemû dikirin.Karê ku derdikete pêşîya wan dikir.Ti carî ne digotin ne.Wan jiyan li hevdû dide hevdû.Ew ji ne bes bû, pêre li zarokan ji meyîzendin û piştre di nav waqas kar û baran de taştê ji amede kirin li ser pişte wan bû.

Deme ku mirov li ber hêt di wan demên sibehê de dirûnişt û li dore xwe dimeyîzend, hingî ew çûn û hatin hemû bi hev re dihata ber çavên mirov. Lê tiştekî dî ji di vir de divêt ku mirov binî xatkê û bêne ser ziman. Ew ji her weha ew bû ku mirov bi jiyana re bêne ser ziman. Ew ti carî ji wê kirina ne aciz bûn. Wan hij karkirinê dikir. Li çûn û hatina wan deme ku mirov dimeyîzend, hingî, mirov ev yek bi wan re di wê heyeme de pir baş û qanc didît.

Li Xîzanê deme ji nû ve dibû germ û xweş. Mirovên ku pîr bûn, ji axlabe ji li medresê li hevdû digahana hevdû û li wir ji xwe re diaxiftin.Bi hev re didan û distandin.Mihamed ji di wê heyeme de li wir bû. Ew demek bû ku ew hatibû wir. Ew ji Amede hatibû wir. Demeke dirêj ew li amede mabûbû. Berî hingî ne bi gelekî re mele Taha çûbû bû ser dilavaniya xwe. Mihamed ji ji ber vê yekê çûbû bû Amedê. Deme ku çûbû bû wir, êdî ew li wir weke demeke dirêj ji mabûbû. Haya ku çilê dernekeve ew li wir dimêne.Lê piştre ku çilê wî derdikeve, êdî ew ji vegerihê Xizanê.Li wir li medresê ew dima.Li medrese wir dima.Wî li wir fêr ji didan. Li wir, ew deme ku hatibû wir, li wir êdî pir faqihên wî çêbû bûn..

Mihamed divêt ku mirov hinekî li ser demên wî yên li Dînwerê û piştre ji bêne ser ziman. Piştre mirov bi buhurê van demên wî û bêne ser ziman. Ew demeke dirêj li Dinwerê dimêne. Deme ku ew li wir dimêne ji, li wir, ew li gelek deverên din ji digerihê. Haya bi herêmên Xorasanê diçê û li wanderan ji dimêne. Li wanderan ji bi gelek zanistan re di rûnihê û bi wan

re dide û distêne. Li wê herêmê ji Mihamed di demeke kin de tê naskirin.navê wî derdikeve. Pir tê naskirin. Her herême ku diçiyê de li wir pir mazin weke zanistekî mazin tê pêşwazi kirin. Ew her herême ku diçiyê de, weke alimekî deme xwe yê mazin tê pêşwazkirin. Li Dînwerê demeke dimêne. Di wê deme ku li wir dimêne de li herêmên li dore wê digirihê.Wan herêman hema bêja hemûkan ew nasdike.Mihamed weke demekê li wir dimêne, piştre bi seyde Avdilrehîmê xaniqî re dike ku were herême Amede û Xizanê wan deran. Bihev re ji piştre ne bi gelekî re êdî tên ji. Deme ku dikin werine wir, hingî, mîr Eyûb ji wan pir xweş bi rê dike. Bi wan re sûwarne dişêne haya bi wir. Piştî ku ew têne wir, êdî piştre bi hinekî re sûwar divegerihin û ew li wir dimênin.Li wir mayîna wan dilê mirovên wir yên zanist û navserî xwe ne, xweş dike.Seyde Avdilrehîmê xaniqî piştî ku ew têne wir û li wir ji hinekî dimênin, êdî dike ku herê Cizîre bota. Ew xwesteke dilê wî ewe ku ew careke dî di saxiya xwe de xwe bigihine Cizire bota. Ji deme ku ew têne wir, êdî ne bi gelekî re deme ku karwanak ji wir diçê ku herê Cizîre bota, hingî, Mîr Ahmed ji, wî, ku hinek mirovan ji pêre dişêene bi rê dike. Seyde Avdilrehîmê xaniqî pir pîr bûya û li ser xwe di wê heyeme de xwe girtin ji hinekî zore. Lê piştî ku mîr wan di şêne û ew ji bi rê dikevin û diçina Cizîre bota û ku digihinê de ji, ne bi gelekî re li wire w nexweş dikeve. Piştre ne bi gelekî re êdî xabere wî ye biêş digihê wir. Hê ku mirovên ku pêre çûne ne vegerehene ew dikeve ardê de. Ew ji deme ku dibînin ku ew ketiye û rewşe wî ne xweşa êdî ew ji li wir dimênin. Ew hêvî dikin ku wê ew rabe ser xwe. Lê ew ne rabe ser xwe û diçê ser dilovaniya xwe.Deme ku xabera wî digihê Mihamed hingî xabera wî pir dilê Mihamed diêşêne.Wî û Mihamed demeke dirêj bi hev re buhurandibûn.Bi hev re çûbûban pir der û deveran. Bi hev re gelek dever dîtibûn. Bi hev re li gelek zanistan rûniştibûn.Wan bi hev re nîvê temenê xwe bi hev re buhurandibû bûn. Piştî ku ew jev divaqatihin, ne bi gelekî re êdî ku xabera wî ye biêş ji Mihamed re tê êdî pir dilê wî diêşihê. Ew deme ku xabera wî digihê wî, dike ku herê Cizîre bota.Lê di wê heyeme de mele Taha ji gihiştiya rehmate xwûde. Ji ber vê yekê ew li wir dimêne.

Deme ku ew bi hev re tên ji rojhilat, hingî, li herême Serhadê li Îdîrê û Agirî wanderan ji weke demekê dimênin. Mihamed ewder dîtibûbûn.Ji ber vê yekê deme ku divegerihê wanderan pir kêf û dilperîya wî têt.Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî bi hev re deme ku têne wir, ji wir bi hev re xwe digihênin Varazûzê wanderan ji. Li wanderan ji weke demekê dimênin. Ewder, deverên ku Mihamed li wanderan mazin bûbû. Seyde Avdilrehîmê xaniqî wanderan ji dibîne. Mihamed, deme ku ew ji wanderan

vaqataha bû, weke faqihekî ji wanderan vaqataha bû. Lê hingî, deme ku tê wir, ne weke faqihekî di vegerihê wir. Weke alimekî mazin tê wir. Deme ku tê wir ji, ew ti tiştekî weke xwe nabîne. Hemû tişt hatiya guharandin. Ew wan guharandinan dibîne. Pîrka wî dêbava wî çûbû ser dilovaniya xwe. Hê gelekên din ji, yên ku wî nasdikirin û wî divîbû ku wan bibîne çûbûn ser dilovaniya xwe. Dayika wî û bavê wî bûbû bûn weke komek hesto. Pir pîr bûbûn. Li ber mirinê bûn.

Mihamed, deme ku ew wê carê derdikeve ber wan, pir kêfe wan ji têt. Ew ji pir kêfxweş dibin ku wî dibînin. Ew ji weke ku fahmdikin ku li ber mirinê ne. Berê ku herine ser dilovaniya xwe êdî wî dibînin û wî pir mazin ji dibînin. Bi vê yekê ji dilê wan xweş dibe. De ne, weke kevneşopîyekê ye di nav wan de, ku dilê dê û bav bê xweş kirin û xweş bê hiştin.Ev ji ji rastiyeka civakê tê hasibandin.

Mihamed û seyde avdilrehîmê xaniqî weke demeke dirêj deme xwe li wir dibuhurênin. Piştre bi hev re dikevine rê de û têne Amede. Li wir ji, li dergaha mele Taha weke demekê dimênin. Mala taha temenekî pir dirêj li jiyanê ma. Wî seydetiyê meleyê Cizîrî dabûbûyê de. Lê ew ji çûbû bû ser dilanîya xwe. Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî bi hev re hatibûbûna dergaha wî û li dergaha wî weke demekê mabûbû bûn. Piştî mele Taha re kurê mele Birehimê xorzî li dergahê bû. Ew li dewsa wî bû.Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî hatibûbûna wir û li cem kurê wî demeke dirêj mabûbûn.Piştre ji wir, ku têne Xizanê, êdî li wir ji demekê dimênin û piştre seyde Avdilrehîmê xaniqî diçê ku herê Cizîre bota. Mihamed li wir li medresê dimêne. Li wir, Mihamed, deme ku dimêne, bidest fêrdayînê dike.

Mihamed ku seyde Avdilrehîmê xaniqî diçê, êdî weke ku hinekî xwe bitenê hîs bike lê têt. Ew ji xwe wilo hîs dike.Li wir ji divêt ku mirov bêje ku mirovên navserî xwe yên zanist hene. Mirovên weke seyde Avdilreqadir hene. Ew ji li wir pir mazin in û navê wan ji heya. Her weha hê gelek zanistên din ji hene. Hemû ji yên ku xwedî dîwan in. Yên ku navê wan heya ne.Seyde Avdilqadir ji mirovekî ku pir zane ya û li ser hiş û aqil pirtûkên wî ji hebûn. Bi navê ”hişyata mirov” pirtûkaka wî ya ku pir bi zimanekî xweş û wêjeyî hatibû nivîsandin hebû.Ew ji li medresê weke mirovekî ku fêr dida bû. Mihamed deme ku diçê wir wî dibîne. Xizan bi medrese xwe re bi nav û deng bû. Pir zanistên herêmê lê dibûna kom.Ew ji weke navedekê bû. Ewder ji weke navendeke zanistê kurd bû. Berî deme misilmanetiyê de ji ewder xwedî hebûn bû.Piştî ku misilmanetî ji hat, êdî gelek zanistên deme yên olî xwe li wir dana hevdû. Wan ne hişt ku ewder hêjabûna xwe winda bike.Li wir man. Bi vê yekê, di deme xwe de ew de

weke navenede zanistan ji bû. Li wir gelek zanistên olî jîn bûn. Hemû yên ku navdar bûn. Hemû ji yên ku di pêşketina ola misilmantiyê de weyneke mazin leyistine bûn. Bi gotin dihata gotin ku şêx teymîyê Heranî demekê hatibû wir û li wir demekê mabû bû.Bavê wî bixwe ji mirovekî ku zanist bû û pir navê wî hebû. Di ciwaniya xwe de tê gotin ku ew hatibû bû.Li wir demekê mabû û di medrese wir de ji faqih û aliman re axiftiya.Ev yek di nav xalkê de dihata gotin. Şêx Mahmûdê Xozî ji ku dergaha wî ji amede ne dûr bû û berê wê demê jî bûya û navê wî ji pir mazin hebû ya, hatiya wir û li wir weke demekê maya. Li wir jên bû ya û li wir ji aliman re axiftiya. Reham xwûde lê bê. Deme ku bahsa şêx Mahmûdê xozî tê kirin, tê gotin ku ew xwedî keremet ji bûya. Li ser navê wî tê gotin ku rojekê agirekî mazin derketiye û ti kesekî nikarîbûya ku bimiviranda. Xalkê serî li wî daya. Dibêjin ku wê kopalê xwe ji destê daya wan û ji wan re gotiya ”herin û li cihê ku agir lê haya li wir di ardê bi çikênin”. Ew ji diçin û wilo dikin. Dibêjin agir piştre i mivirê û mal û manên xalkê ji ji sawatandinê xilas dibe..

Ew ji hatiya wir û li wir maya.Nahaka vêce Mihamed li wir wir e.Êdî wê demek ji bi wî re li wir dest pê kiribana.Wê deme dî yen û ji bo wî dest pê kiribana.Mihamed, êdî mirovekî ku pîr bû. Wilo zêde ne li ser xwe bû.Lê hê ku dimeşî û bi deran ve diçû, weke ciwanekî li ser xwe bû.Wilo dihata berçavan.

Mihamed, êdî li Xizanê bû. Li wir li medresê bû. Ew demek bû ku li wir bû.Hêdî hêdî li wir ji hatibû naskirin û li wir ji jiyana wî dirûniişt.Mihamed li Xizanê, ji deme ku hatibû wir pêde, bidest dayîna fêran li feqeyan kiribû. Fêr dide feqeyan.Hin bi hin dem têve diçû, êdî li wir ji hizre xwe û zanebûna xwe di nav mirovan de dihata naskirin.PIştî ku hatibû wir, êdî ji wir wî xwestibû ku carakê xwe bigihinê Rihayê û li wir ji hinekî weke demekê bi mêne. Wî pir dixwest ku herê wir. Ewder ji di wê heyeme de pir li pêş bû. Weke navendekê bû. Piştî salahadînê Eyûbî re êdî mazin navê wê mazin hatibû ser ziman. Weke navedeneke mazin hatibû ser ziman. Lê berî hingî ji, navê wêderê hebû.Bi birehim Xelîl re hebû.

Mihamed dixwest ku herê wir û wir ji bibîne.Lê di wê heyeme de li Xizanê bû û êdî li wir bicih bûbû. Lê wî hê Cizîre bota ji bîr ne kiribû. Hê weke wê deme wî ye berê ku hê ji nû ve ji wir derketibû û bi riyan ketibû, weke hingî xwestina careka din çûne wir pêre hebû. Seyde Avdilrehîmê xaniqî bi nêhte herê xaniqê ji wir bi rê ketibû. Lê çûbû bû Cizire bota û li

wir rêvaniya wî ya li jiyanê dawi lê hatibû.Ne gaha bûbû ku herê malê. Lê piştî ku gahabûbû rehmata xwe, êdî ew biribûbûna wir û veşartibûn.

Li Xizanê, di wê heyeme de seyde Avdilrehîmê weke zanist û mirovekî navdar hebû.Navê wî hebû.Piştre Sofî Ahmedê Bazîdî ji hebû.Ew ji pir zaneistekî ku mazin bû. Ew ji xwedî dîwan bû. Ji xaynî wî ji, şêd Avdilrehmanê pîranî hebû.Ew ji pir mirovekî ku dihata naskirin. Ew ji xwedî dîwan bû. Rêzeke mazin li wir ji van mirovan re hebû.Lê ne tenê ew mirovên zanist û navdar li wir hebûn. Mele Mendûhê Xarzî ji li wir bû. Ew ji car bi car dihata wir û li wir demekê dima û piştre careka dî diçû.Ew li Cizire bota ji mabûbû.Lê mirovekî dî hebû ku pir bala wî li ser Mihamed hebû. Ew ji navê wî faqa Said bû. Faqa Said, mirovekî ku pir zanebû.Navê wî ji bi zanebûna wî hebû. Wî pirtûkek bi navê ”dilê safî û aqilê serê mirov” ji nivîsandibû.Pir mirovekî ku zanebû. Pir caran ew û Mihamed li hevdû dirûniştin û bi hev re diaxiftin.Mihamed hij hizikirinê dikir. Lê danûstandinaka bi hizir ji dilê wî xweş dikir.Faqa Said dihata cem şêx Birehim. Şêx birehim. Li wir dima. Dergaha wî ji bi medrese ve bû. Jev ne dûr bûn. Mihamed pir caran bi hev re ew û şêx Birehim li hevdû rûniştibûn û bi hev re axiftibûn.Li medresê ji pir carana li hevdû dirûniştin û bi hev re diketina axiftinan de. Mîr Ahmed ji car bi car dihat û bi wan re dirûnişt.Lê axlabe, wî ew dibirina qasre xwe bi hev re lê li civate hevdû dirûniştin û bi hev re diketina axiftinê de.Deme ku diketina axiftinê de pir dirêj li hevdû dirûniştin û mazin bi hev re diaxiftin.Mîr Ahmed ji mirovekî ku zanebû. Kurê Mîr Dawidê kurê Mîr Şerefedin Xizanî bû.Mîr şerefedin ji mirovekî ku pir biaqil û zanebû. Wî Xizan navê wê mazin kiribû. Bavê mîr Şerefedinê Xizanî Mîr Avdileh bû. Li herêmê pir xurt û bi hêz bûn. Mîrê bota pir piştgirîya wan dikir. Ji gelek êrîşên Selçukiyan û Mogolan wî ew xilas kiribûn. Selçukiyan û Mogoliyan ew herêm bigiştî hema bêja kiribûbûna qada şer û pevçûnan. Lê bi hêzên mazin newêrabûn ku herinêne ser herêmê de.Ji ber ku herêm ne tenê di bin ewkariya hêzên mîrê Xizanê mîr Ahmed de bû. Eyûbîyan li Kurdistanê bigiştî hêzeke ewkariyê ku di serî de heskîf, Amed, Riha, herême botanê(wê demê başûr rojavayê kurdistanê di nav sînorê herêmê ku jê re digotin herême botanê de cih digirt.) û li gelek herêmên serhedê ku Xizan ji nav de lê bicih kiribûn.Hêzên mîrên wan herêman ji weke hêzên Eyûbîyan dihatina hasibandin.Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku hêzeke mazin Eybûyan bi navê xwe avakiribû.Hêze mîr Ahmed wilo dihata hasibandin. Kengî siltanê Eyûbîyan hêz ji wan xwestibana, tevde li ber fermana wî amede dibûn. Ta deme Îdrîsê bedlisî ew rewş wilo berdewam dike. Piştî ku Îdrîsê bedlisî li

ser navê mîrên kurdan bi Yavuz Selîm re levdike, êdî rewş hin bi hin diguharê. Bi wê levkirinê re serwerriya Osmaniyan serdest bûbû û kurd hîç ji wê yekê nexweş bûn.Ew nexweşbûn, deme ku mirov li ruyê Mîr Ahmed ji dimeyîzend mirov pêre kifş dikir.Lê bandûra mîrê Bota pir mazin bû û ji herderî dihata dîtin. Mîrê bota weke gelek mîrên herêmên din ew ji di bin mîrîtiya xwe de di bin mazinatiya xwe de diparast. Wî pir rêz dide wan. Wî bixwe ji hijê dikir ku ew li qasrê li civate hevdû bi wî re rûnihin.Wê yekê dilê wî xweş dikir.Pir dilê wî xweş dikir.

Mihamed û şêx Birehim, gelek mirovên din ji yên navserî xwe û zanist bi wan re ne, çûna û bi hev re gelek caran li qasrê rûniştine. Li wir bi hev re ketina axiftinê de.Li ser gelek mijaran bihev re diaxivin.Mihamed piştî ku hatibû Xizanê ji, li wir dev ji nivîsandinê ne berda bû. Li wir ji wî di nivîsand. Wî li wir pir ji dinivîsand.Li wir demên wî yên vala ku çêdibûn, wî hemû bi hizirkirin û nivîsandinê di buhurand.Wî pir dinivîsand.MIhamed, ku mirov li vir çend gotinan li ser nivîsandina wî bêne ser ziman, mirov wê her weha bêje. Mihamed li Cizire bota pir mazin bidest nivîsandinê kiribû. Piştre deme ku ji wir derketibû ku keti riyan de ji, wî dev ji nivîsandina xwe ne berdabû bû.Wî berdewam kiribû.Li Zaxoyê û li Urmiyê ji û li Kirmaşanê ji û li Dînwerê ji wî nivîsandina xwe berdewam kiribû.Piştre ku ji wir ji hatibû wir, li wir ji berdewam kiribû.Li wir wî bidest hinek nivîsandinên pir dirêj kiribû. Weke nivîsne ku ji gelek bergan pêk werin, wî bidest nivîsandina wê kiribû.Mihamed, ser wî pir biaqil bû.Bi vê yekê re ji, hertimî dixwest ku wî aqilê xwe bêne ser ziman.Wî hij nivîsandinê dikir.Wî ji deme wî ye li Cizire bota hata wir gelek nivîsên mazin nivîsandibûn.Ew zanistekî mazin bû. Zanistekî pir mazin bû.

Di wê heyeme de li ser gelek hizrên wî, ew bi şêx Birehim re ketibû danûstandinê de.Şêx Birehim mirovekî ku pir zane bû. Li ser çi mijarê ji Mihamed pir pirsî bû, Mihamed bersive wî xweş dabû bû. Wê xweş dayîna wî ye ji wî re, dilê şêx Birehim ji pir xweş kiribû.Wê yekê ji kiribû ku pir dilê wî herê ser wî. Mihamed êdî hertimî di bin bal û heya wî de bû.Di demê de ku wî Mihamed pir mazin û baş naskiribû, êdî pir lê germ bûbû. Êdî hertimî xwestibû ku ew bi wî re bê û ew li hevdû rûnihin bi hev re bi axivin.Mihamed ji hij wî dikir.Dilê Mihamed ji li ser wî bû.Wî dixwest ku hertimî bi wî re bê..

Li Xizanê jiyana pir geş bû.Ji gelek deveran zanist dihatina wir. Zanistên ku dihatina wir ji, yên ku pir bizane bûn.Zanistên ku aqilê wan pir mazin bûn.Mirovên her weha yên zanist ku dihatina wir ji, li medresê

wir ye ku bi zanistan re nav û deng dabû diman.Lê axlabe ji li qasrê mîr civat hebû.Li wir lê digahana hevdû.Li hevdû dirûniştin.Ji ber vê yekê ji deme ku mirov di hatin û medresê diman, piştre ji diçûna qasrê ji li wir ji li civatê dirûniştin.Civate mîr hertimî li dar bû. Li civatê wî mirovên ku ji dûr dihatin ji hebûn. Hemû ji li dîwana mîr ye civatê li hevdû bi wî re dirûniştin.

Mihamed ji li medresê dima. Li gelek demên wan ji li qasrê li hevdû rûniştinê di buhurtin. Deme ku li qasrê dirûniştin ji, pir dirêj li hevdû dirûniştin.Wê sihehê ji Mihamed, weke her sibehên xwe yên berê zû rabûbû ji nav cihên xwe û kara xwe kiribû û piştre çûbû bû Mizgeftê. Piştre ku li mizgeftê ji mêj dikin bi hev re, êdî piştre hinekî din ji li hevdû rûniştî dimênin û bihev re diaxivin. Seyde Bîrehim li pêşîya cimaatê li mêj dikir. Lê li wir car bi car Mihamed ji li pêş mêj dikir. Wê rojê ji wî li pêşîye cimaatê mêj kir. Piştî ku mêj kirin, êdî jev bela ne bûn û i hevdû rûniştî man û bi hev re ketina axiftinê de. Ku hinekî Mihamed ji wan re axift, piştre êdî kirin ku jev belav bibin.Mihamed, wê rojê piştî mêj kiribû ji, piştre ji ji cimaatê re yê ku axiftibû ji ew bû.Car bi car ku wî mêj dikir, wê axiftin ne dikir mafê axiftinê dide şêx Birehim û wî dikir. Lê wê carê wî herdû ji kiribûn. Wî hem li pêş mêj kiribû û hem ji piştî mêjê re ji cimaatê re axiftibû.carên şêx Birehîm ji li pêşîya Cimaatê mêj dike, mafê axiftinê dide Mihamed û Mihamed axiftinê dike. Her weha bi hev re pir li hevkirinaka wan ye baş hebû. Lê wê sibehê, piştî ku Mihamed li pêş mêj kir û weke qadarekê piştre ku mêj ji xilas kir, êdî li şêx Birehim mêeyîzend.Şêx Birehim deme ku wî lê meyîzend, wî çend gotin ji gotin.Lê piştre mafê axiftinê da Mihamed û kir ku ew biaxivê.Di wê heyeme de mîr Ahmed ji li wir bû. Ew ji mirovekî k navserî xwe bû.Pîr ji bû.Lê hê hinekî li ser xwe ji bû.Lê ne wilqasî ji li ser xwe bû.Li ser jiyana wî ji pir gotin dihatina gotin. Li ser deme kalkê wî pir dihata vegotin. dapîrê wî ji gotinan pir mirovekî ku mêr bû.Ew ketibû gelek şeran de û di hemûkan de ji bi ser ketibû. Pir bahsa wî dihata kirin. Weke ku bahsa mêreniya Rûstemê Zal bê kirin, bahsa mêreniya wî ji dihata kirin.Ew ji bixwe ji navê wî Mîr Şerefedin. Lê jê re ”kalê şerefedin” ji dihata gotin. Mîr Dawid ji gotinan çar kurên wî hebûn, her yekê yê dî mêrtir bû. Pir bahsa wan û mêreniye wan dihata kirin.Ew kurê wî bi wî re dikevine gelek şeran de û di şerên ku dikevinê de mêreniyeke pir mazin didien nîşandin.Piştre tê gotin ku her yekê ji wan li derekê dibina mîr û navê xwe didina der. Bavê Mîr Avhmed ji navê wî mîr Dawid bû.Ew ji li wir dibe mîr. Ew pir jê hatibû bû.Li herêmê xwe Hukumete xwe ava dike. Hêzeke mazin ji ew dibin destê xwe

de ava dike.Hêzên herêmê ji wî weke hukumetekê nas dikin.Bi vê yekê ew pir mazin bû.Navê wî hebû.

Mîr Ahmed ji di wê heyeme de li wir bû. Ew ji di rex şêx Birehim de rûniştî bû.Ew ji di wê heyeme de di rex wî de rûniştî bû û li axiftina ku Mihamed di wê heyeme de ji wan dikir lê dihisand.Mihamed pir mazin diaxift.Ew li ser zanebûna qanc diaxift. Mihamed deme ku diaxift di axiftinên xwe de pir bahsa ”zanebûna qanc” dikir. Wî weke ku pir girîngî dide vê bêje. Ku ne wilo bana wê di hema bêja her axiftina xwe ne anîbana ser ziman.Deme ku bahsa zanebûna qanc dikir, pir dirêj ji diaxift. Pêre pir hizir dianîn ser ziman.Di wê heyeme de ji wî pir hizir pêre dianîn ser ziman. Pir xweşik dianî ser ziman. Deme ku dianî ser ziman ji pir xweşik û biaqil dianî ser ziman.Ew di wê heyeme de diaxift û yên li dore wî pir bi hey bala wan li ser wî bû lê di hisandin. Her weha şêx Birehim û mîr ji bala wan pir bi hey li ser wî bû di wê heyeme de û lê dihisandin.

Mihamed weke qadarekê di wê heyeme de diaxivê.Ku weke qadarekê diaxivê, piştre axiftina xwe bidawi dike û dimêne sekinî.Piştî wî re şêx Birehim ji çend gotinan têne ser ziman. Piştî axiftina şêx Birehim re ti kesekî din ne axivê. Herkesek bêdeng dimêne.Piştî axiftina wî re, ji xwe, êdî mirov ji ji ciihê xwe di rabin û dikin ku jev belav bibin.Piştre ne bi gelekî re jev belav dibe.Mirovên ku rûniştî bûn, hema bêja gişte wan diçin.Lê hinek ji dimênin. Yên ku dimênin ji, hinek sofî û hinekî mirovên ku her dayimî bi şêx Birehim û wan re bûn, mabûn.Mihamed hê di cihê xwe de rûniştî bû. Ew hê li cihê ku lê diaxift bû. Hê li wir bû. Şêx Birehim ji li cem wî bû.Mîr, deme ku mirov rabûbûn ew ji rabûbû. Ji xwe, ji ber ku ew rabûbû, êdî gelek mirov pêre rabûbûn.Lê deme ku derketibûbûn, li derve li hewşa mizgeftê mabûbûna sekinî li hevdû û ji hevdû re diaxiftin. Piştre ne bi gelekî re Mihamed û şêx Birehim ji derket.Mihamed ji û şêx Birehim ji pir pîr bûn. Hinekî zor dikişandin di meşa xwe de di wê heyeme de. Ji ber vê yekê hinekî ji wan re zor dihat ku zû bi meşîn.Piştî ku ew ji derketibûn, êdî bala mirovên li derve bi careka re çûbû bû ser wan. Deme ku bal çûna ser wan, êdî ew ji di bin wan balan de hatin û di nav wan de sekinîn.Di rex mîr de sekinîn.Deme ku ew hatina nav wan, êd bi hev re bidest axiftinê kirin.Mihamed û şêx Birehim û mîr di rex hevdû de bi hev re ketine meşê de û meşîn.Mirovên din yên li dore wan ji bi wan re li dore wan ketine meşê de.Mizgeft û medresê jev ne dûr bû. Qasrê mîr ji di rastiyê de ji wir ne dûr bû.Lê belê ji bo ku mirov herê qasrê, divîya bû ku mirov çend gavan bi meşîyana.

Bi hev re dikevine meşê de û têne bi medresê ve.Li dore Mihamed, şêx Birehim û mîr gelek mirovên navserî xwe hebûn.Hinek sofî ji hebûn.Lê hinek feqeyên ku li medresê dixwandin ji di heyeme de li wir hebûn.Ew ji li dore wan dimeşîn.Deme ku dikevine meşê de, ji xwe diaxivin û dimeşîn.Di wê heyeme de bi zêdeyê ji dengê mîr û şêx Birehim dihat. Mihamed ji car bi car diaxift.Lê ew weke hwe car wilo zêde ne diaxift.Bêdeng dima û dihisand.Ku dikete derba xwe de ew ji diaxift. Lê ku ne ketibana derba xwe de, ne diaxift.Lê divêt ku mirov bêje ku bala herkesekî ji li ser Mihamed bû.Mihamed dibin balan de bû.Ew di serê xwe de dihizirî. Li ser demên xwe yên berê dihizirî. Wî çi jîn kiribû û çi jîn ne kiribû.Wî gelek tişt û rewş jîn kiribû.Di wê heyeme de deme ku dihizirî ew ji li ber çavên wî bûn.Di wê heyeme de di serê xwe de weke ku ne li wir bê di hizir û ramanan de bû.Şêx Birehim bala wî pir li ser Mihamed bû.Wî farq dikir ku Mihamed pir di hizran de ye.Wî ew hizirkirina wî didît.Lê ti tiştek di wê heyeme de ne got. Mabûbû sekinî û car bi car bi mîr û yên li dore xwe re diaxift.Mihamed, car bi car çend gotin digotin.Lê belê ne wilo zêde. Wilo zêde li wir weke ku ne bi hey bû.Wilo rewşe wî dihata berçavan. Weke qadarekê weha dimeşîn û tên ku werine medresê û hinekî ji xwe re li wir lê rûnihin bi hev re bi axivin bi hev re.

Medrese ji hinekî mazin bû.Ji gelek beşan pêk dihat.Beşeke zarokên biçûk ji hebû. Ji bo wan bû ku ew werine wir û li wir li hevdû rûnihin û bixwênin.Li wir, deme ku wan zarokan dixwand, mazinên wan fêrên wan didana wan. Yên mazin ji fêrên xwe ji yên ji xwe maztir di girtin.Di fêrkerinê de her weha rewşek hebû.Her sibeh piştî mêjê ji dihatin û li hevdû dirûniştin û bi hev re didan û distandin. Her weha rewşeke wan hebû.

Di wê heyeme de ji Mihamed û yên pêre dihatina wir ku hinekî li hevdû rûnihin û bi hev re biaxivin û bidin û bistênin.Deme ku ew dihatina wir û bi hev re diaxiftin ji, gelek mirovên din ji bi wan re dihatin û li wan dihisandin.Piştî ku dihatina wir ji li wir ji gelek mirov li wan di bûna kom.Wê li wir hinekî li hevdû rûniştiban û piştre wê jev belav bûban.Mirovên din ji wê êdî çûban bi kar û barên xwe ve.Piştre ku bû êvar êdî wê ew rewş berdewam kiribana. Lê wê carê ji wê li qasrê mîr bi li hevdû rûniştinê re wê berdewam kiribana.Li qasrê mîr, di pêşengtiye wî de hertimî ku dibû êvar li hevdû li civatên hevdû rûniştin dibû.Deme ku li hevdû dirûniştin ji, ne hindik li hevdû dirûniştin. Gelek mirov li hevdû dirûniştin. Axlabe ji, zanistên deme yên li wir li hevdû digahana hevdû.Mihamed ji û şêx Birehim ji diçûna wir.Ji xwe gelek mirov axlabe

ji ji bo ku li wan bihisênin dihatina wir.Bi vê yeê, her şev qasrê mêr bi civate mazin bû.Lê gelek mirov lev digahana hevdû.

Piştî ku Mihamed, şêx Birehim û mîr bi mirovên li dore wan re hinekî dimeşîn, êdî di gihine ber medresê.Deme ku digihine ber medresê, êdî weke werine xwe li wan têt.Mihamed ji serê dirake û li pêşîya xwe dimeyîzenê.Weke ku were xwe lê têt.Lê ew hê ji bi hizir bû.Ji rewşe wî ev yek dihata farq kirin.

Ku digihine ber medresê, êdî ne bi gelekî re tenê ber devê derê û dikevine hundurê hewşa medresê de.Deme ku dikevine hewşa medresê de, êdî dibînin wa hinek feqe ji wê li hundurê hewşê ne û li hevdû kom in. Deme ku ew ketine hundur de, êdî bala wan ji çû ser wan û êdî ew ji bi ber wan ve hatin.Ew hatin û li ber wan sekinîn. Piştre ku ew buhurtina hundur, êdî ew ji bi wan re buhurtina hundur.Feqihên ku hatibûbûna pêşiye wan ji bi wan re buhurtibûbûna hundur.Deme ku buhurtibûbûna hundur, êdî li hundurû li hevdû rûniştin. Mihamed û şêx Birehim û mîr ji di rex de li ber mirovên li dore xwe rûniştin.Yên din ji li dore wan rûniştin. Deme ku rûniştin, deng ji ti kesekî dernediket.Herkesek bêdeng ma.Bala herkesekî li ser Mihamed û şêx Birehim û mîr bû.Herkesekî li wan dimeyîzend. Wan ji ev yek farq dikir. Piştre ku herkesek rûnişt û xwe di cihê xwe de xwe adiland, piştre kirin ku bi hev re biaxivin. Deme ku kirin ku biaxivin, yê ku pêşî kir ku bi peyîvê şêx Birehim bû.Ew şêx bû û mazin bû. Lê deme ku wî kir ku bi axivê ji bala wî li ser Mihamed bû. Li Mihamed meyîzend û kir ku bi peyivê.De ne, Mihamed yê mazin bû.Bi temen ji weke ku ji şêx maztir bû.Bi zanebûna xwe ji mazin dihata hasibandin.

Şêx Birehim deme ku kiri ku biaxivê û deme ku kir ku bi axivê û u li Mihamed û meyîzend, piştre êdî wî bidest axiftina xwe kir.Deme ku axift ji wilo zêde dirêj ne axift.Kin axift.Çend gotin ji dev gotin û ma sekinî. Pişt wî re yê ku mafê axiftinê hilde û hinekî baş dirêj axift ji mîr bi xwe bû.Mîr deme ku axift, weke hizreke ku di serê wî de mayî, ew gotinên Mihamed yên ku di cimaatê de wî anîbûbûna ser ziman, hinekî ji wan axift.Mihamed, deme ku ew axift ji, bala wî pir bi hey çû ser mîr.Mîr ku axiftina xwe bidawi kir û ma sekinî, êdî weke ku Mihamed li ber bû ku axiftibana. Pişt mîr re, ji xwe, wî ji di cih de mafê axiftinê hilde û axift. Mihamed deme ku li Cizîre bota mabûbû, pir li ser Nebi Nuh xwandibû û his kiribû.Ji ber vê yekê di her axiftina xwe de ku carekê bahsa wî ne kiribana ne bû.Hema bêja di her axiftina xwe de wî bahsa Nebî Nuh dikir.Ji Cizîre bota çûna wî ya li Zaxo ji hinekî bi vê yekê ve girêdayî bû. Evder ji, cihekî girîng û li gor hinek aliman pîroz ji dihata dîtin. Navê Zaxo bixwe

ji, ji navê nevîyê Nebî Nuh Azîyax hatiya afirandin. Pîştî tûfanê re çawa ku zaroyên wî li dore Cudî û wanderan bicih dibin. Piştre nevîyî wî Azîyax ji li herême Zaxo yê bicih dibe û piştre evder bi navê wî tê binavkirin. Li gor ku tê gotin, ku li ber herême Hazaxê bû û navê wî Hêlax ji bû, wilo bû. Mihamed, li ser van mijaran ji pir xwedi zanebûn û têgihiştin bû. Ku diaxift û bahsa Nebî Nuh dikir, di nav de bahsa van ji dikir. Zaxo, di deme Mediyan de pir pêşketibû. Zaxo, ne dûrî herême botanê bû. Bi awayekî din ji, mirov karê bêje ku başûr, bakûr û rojhilat ji di nav de di xala xwe de ku xwe dikira navend, digihanda hevdû. Di wê heyeme de ji deme ku axiftibû li Mizgeftê, di axiftina xwe de bahsa wî kiribû. Bahsa jiyana wî ye dirêj ku di gotin 960( li ser jiyana Nebî Nuh deme ku tê axiftin û bahsa temenê wî tê kirin tê gotin ku ew 960 jîn bûya.Lê ew hijmar li gor çi tê hasibandin ji me di derbarê wê de haya nahaka agahî ne dîtin) salî jîn bûya dihata kirin. Mihamed ji bahsa kiribû.Pir dirêj ji bahs kiribû.Piştî ku mîr axiftina xwe bidawi kiribû, êdî wî xwe di cihê xwe de xwe adilandibû ji bo axiftinê.Deme ku Mihamed xwe di cihê xwe de xwe adiland, hingî, bala herkeskî çû ser wî. Bala Şêx Birehîm ji çû ser wî di wê heyeme de.

Mihamed ku xwe di cihê xwe de adiland û bal ji çûna ser wî, êdî herkesek li bendî wî û axiftina wî ma.Piştre ne bi gelekî re êdî wî bi wî dengê xwe yê xweş û zîz bidest axiftina xwe kir û heskesekî ji lê hisand.Mihamed deme ku axift, ji deme Nebî Nuh û li ser jiyana wî ye dirêj demekê axift.Piştre Nebîyên ku pişt wî re hatina kir. Wî got ku ”nebîyên ku piştî wî re hatina, hemû ji ji tuxmê wî ne”. Li ser vê yekê ji weke demê axift.Hizre xwe anî ser ziman. Weke demekê dirêj axift. Piştre ku ew weke demekê her weha axift, êdî weke bêhnekê bide axiftina xwe ma skeinî.Lê deme ku wî bêhn da axiftina xwe û ma sekinî, êdî piştî wî re di cih de şêx Birehim kete devrê de û axift.Mihamed weke ku hê tiştên ku bigotina hebûn.Lê deme ku mabû sekinî û piştî ku ew mabû sekinî û şêx Birehim ketibû devrê de, êdî ew mabû bû sekinî di cihê xwe de di wê heyeme de.Piştre şêx Birehim axiftina xwe kir.Mihamed ji lê hisand.Lê Mihamed deme ku dihisand ji dihizir de bû.Di serê xwe de dihizirî. Di wê heyeme de hem dihisand û hem ji dihizirî di serê xwe de.Şêx birehim ji ku weke qadarekê axift, piştre wî ji axiftina xwe bidawi kir û ma sekinî di cihê xwe de di wê heyeme de.Piştî wî re mîr mafê axiftinê hilda û axift. Wî ji çend gotin bi ser yê wan ve kir.Lê ew zêde ne axift.Dise mafê axiftinê ji wan re hişt û ew axiftin. Piştî mîr re weke çend gotinên din ji şêx Birehim anî ser ziman û piştre ku ew ma sekinî di piştî ku axift, êdî Mihamed careka

din mafê axiftinê hilda û axift û wê carê deme ku ew axift ji pir dirêj axift û herkesekê li dore wî tenê lê hisandin.

Mihamed deme ku axift, bizêdeyî ji li ser hizre mazina sekinî.Deme ku axift, diaxiftina xwe de pir caran, wê carê, bahsa seyde mazin meleyê Cizîrî kir. De ne, seydeyê mazin meleyê Cizîrî li wê herêmê mabûbû. Li dore Amede wanderan ji mabûbû. Wî gelek dever û der ji wanderan dîtibûn. Gelek mirov naskiribûn.Pêre ji gelek mirovan ew naskiribû.Meleyê Cizîrî bi hebûn û hizre xwe re bandûraka mazin li ser mirovan berda bû.Haçîkê li wê herêmê ku ew nasdikirin, weke mirovekî ku pir zana û alim nasdikirin. Gelekan ji ew weke mirovekî ku keremetên wî hene, nasdikirin.Li dore Amede û ku li herême botanê ji dihata gotin, gotinaka pir mazin ji bo meleyê Cizîrî li ser zimanan bû.Lê piştî çûna meleyê Cizîrî ye li ser dilovaniya xwe dihata gotin.Dihata gotin ”ku jinek ku hevirê xwe hevirt û piştre hinek tirş kir, piştre ku herê ber kevirekî ku wî destê daye de û hevirê xwe bi pehêne û nanê xwe lê pêvedê, wê nanê wê di cih de çê bibe”.Her weha dihata gotin.Ji bo alimatiya wî bînine ser ziman, ev vegotina dihata gotin.Meleyê Cizîrî dirastiyê de ji mirovekî ku pir mazin bû.Hizreke wî ya mazin hebû. Ew ji bo civakê bi hizre xwe xwediyê hizreke mazin ye bi pergalî bû.

Hizre meleyê Cizîrî biçend gotinan ku mirov werenê ser ziman, mirov karê weha bêne ser ziman.Ew bi bihzire xwe re pir mazin bû.Li gor wî civak di xwe de bi gelek awayan heya.Ji ber vê yekê divêt ku mirov bi her awayên wê fahmbike.Hizrên civakê yên ku afirêne û yên ku bi hebûna wê re diafirin ji hene.Mirov divêt ku wan ji fahm bike.Li gor wî, mirov di nav civaka xwe de û di cihê xwe de heya.Divêt ku mirov ji civakê dûr neyêne ser ziman.Ew bixwe ji civakaka. Lê ew civakaka ku bi civaka xwe re heya.Li gor meleyê Cizîrî di demê de di civakê de, ji xaynî mirov bi mirov ku xwediyê hiş û bîreke(xêv) xwe ya, civak ji bi teybetî bi teybetiyên xwe xwediyê hiş û bîreke wê ye ku afirî ya.Ev bîr û hiş, biqasî ku hiş û bîre mirov bi rê ve dibe û rê di dijiyanê de şanî dide, wilqasî ji mirov bi hiş û bîr dike, û mirov karê bêje ku mirov bi wê bi pêşketineke mazin bi pêşdikeve.Lê ti carî bila mirov ji bîr neke ku wê bêcivak ji jîn bibe.Meleyê Cizîrî bi vê hizre xwe re hinek hizirne wî yên ku mirov ji aliyê civaknasî ve bêne ser ziman ji hene. Ew her weha mirov karê bêne ser ziman.Wî her mirov bi mejiyekî dihasiband û pêre ji ew meji hemû digahandina hevdû û dikire mejiyek û ew mejî ji dikire mejiyê Civakê. Piştî ku wî her weha dikir û dianî ser ziman, êdî li ser wê li hewkirinê ji wî hinek hizrên xwe dianîna ser ziman. Ew hizrên wî ji weke ku li ser ”mejiyê civakê” bin dihatina ser

ziman.Bi vê yekê ew mazin bû. Bi hev re axiftin û axiftinaka bizane ji mirov mazin dike.Bi vê yekê, wî hizreke mazin bi civatan dianî ser ziman.

Meleyê Cizîrî li ser gelek mijarên civakî hizre xwe mazin anîya ser ziman. Lê mixabin ew hizrên ne gahana roje me. Yan gahana roje me û hatina winda kirin û yan ji ji demekê ne buhurîne demekî din û winda bûna.Lê di deme xwe de wî bi hizre xwe di deme kin de pêşketineke mazin bi hizrî dabû çêkirin. Hizre wî di nav xalkê de ji her alî ve ji aliyê zanistan ve dihata ser ziman.Ew zanistekî ku mazin bû.Mihamed ji hizre wî pir xwandibû û zanibû. Deme ku diaxift ji hizre wî dianî ser ziman, di nav hizre xwe de. Di wê heyeme de ji deme ku bidest axiftinê kiribû û bahsa wî kiribû, piştre ku hin gotin li ser navê wî anîbû ser ziman, her weha hinek têgihiştinên wî ji mirovên dore xwe re dianî ser ziman.Demeke dirêj her weha bahsa wî dike û wî têne ser ziman.Di deme ku ew diaxift û wî dianî ser ziman de ji, herkesekê li wir pir bi bal heya wan li ser wî bû û lê dihisandin.Piştre, Mihamed di axiftina xwe de ku hinekî ji wî anî ser ziman pêde, êdî hinekî hizre xwe ji anî ser ziman. Wî ku hizre xwe anî ser ziman, li ser bêja ”mirov” û ”xalkê” pir bi hev re li ser sekinî.Wî di axiftina xwe de anî ser ziman ku ”mirov di jiyana xwe de biqasî ku bixweza û dore xwe ve girêdayî ye, divêt ku wilo bixwûdeyê xwe ve ji girêdayî bêt”.Deme ku wî weha anî ser ziman, êdî hinekî ji axiftin û hizre xwe kir ku safî bêne ser ziman.Ji bo ku mirovên li dore wî pir baş fahm bikin û tê bigihin, wî hewldide ku pir zelal bêne ser ziman. Bi vê yekê weke qadarekê axiftibû.Di deme ku ew axiftibû de deng ji ti kesekî ji derneketibû.Herkesekî bala xwe bi hey dabûbû ser wî û lê dihisand.Mîr ji û şêx Birehim ji pir bi hey bala xwe dabûbûnê de û lê dihisandin.Mihamed, ku ew her weha weke qadarekê axift, piştre wî axiftina xwe bidawî kir û ma sekinî di cihê xwe de. Deme ku ew ma sekinî, êdî yê ku piştî wî re axift ji şêx Birehim bû.Wî ji çend gotin anîna ser ziman û piştre ma sekinî.Lê hê bala wî li ser Mihamed bû. Mihamed ji weke ku di cihê xwe de hinekî ne rehet be û êş di derne wî de hebe di cihê xwe de dima.Wilo dihata berçavan. Deme ku mirov lê dimeyîzend mirov ev yek fahm dikir û farq dikir.

Mirovekî ku êş di laşê wî de hebe kifşa. Ew ji kifş bû.Lê wî weke ku dixwest ku ti tiştekî nede der di xwe de tevdigerehe.Her weha ev yek ji pêre dihata ber çavan.Şêx Birehim weke ku ev yek pêre farq kiribû.Lê wî ti tiştek nede kifşkirin.Mîr ji bala wî li ser Mihamed bû.Hebû ku wî ji kifşkiribû.Lê ye wî ne kifş bû ku wî kifş kiriya an ji ne.Ev yek jê ne dihata fahm kirin. Lê şêx Birehim kifşkiribû.Piştî ku wî ev yek pêre kifşkiribû, êdî bala wî ji bêhtir çûbûbû ser wî di wê heyeme de.

Lê ev yeke ne didana der. Ne Mihamed weke ku êş pêre hebû dide der û ne ji şêx Birehim dide der ku êş pêre heya.Axiftin ji berdewam dikirin. Piştî ku şêx Birehim axiftibû, êdî Mîr ji axiftibû. Wî ji çend gotin gotibûn û piştî wî axiftina xwe bidawi kiribû, piştre yên ku mafê axiftinê hildabûn û axiftin çêbûbûn.Gelek mirov li wir hebûn.Mirovên ku li wir hebûn ji, hemû ji yên ku navserî xwe û zanebûna wan hebû bûn. Hemû ji yên ku pîr bûn.Hemû ji yên ku seyde an ji sofî bûn. Yên ku karîbûn ku bi mirovên zane re bidin û bistênin bûn.Wan mafê axiftinê hildabûn û wan ji hizre xwe dianîna ser ziman.Lê ew, deme ku diaxiftin ji, wilo zêde dirêj ne diaxiftin. Di cih de mafê axiftinê ji mîr an ji şêx Birehim û an ji Mihamed re dihiştin. Mihamed bizanebûna xwe li wir hatibû naskirin.Di demeke kin de mazin hatibû naskirin.

Mihamed, şêx Birehim, mîr û yên bi wan re weke demeke dirêj her weha li hevdû rûniştî dimênin û bihev re diaxivin.Demeke dirêj bi hev re didin û distênin.Mihamed piştî ku wî ew axiftina dirêj li ber wan kiribû, piştre çend carên din ji diaxivê û hizre xwe têne ser ziman. Her cara ku ew diaxivê ji, pir xweş û xweşik diaxivê. Her cara ku ew diaxivê, bala herkesekî bihet diçê ser wî.Ew bi zanebûna xwe alimakî pir mazin bû.Ew êdî wilo dihata naskirin û erêkirin. Lê ew êdî ne li ser xwe bû. Êdî pir bû û car bi car ji bi alikarî dimeşî.Her weha ew pîr bûbû. Ew kal bûbû.Lê deme ku diaxift ji pir li ser xwe û weke ku ciwanak biaxivê diaxift.Her weha li ser xwe û bixwe diaxift.Hizre wî pir hebû.Ew di wê heyeme de li medresê dime. Hema bêja her şev ji diçû civata mîr û li wan dirûnişt. Lê ew di demên xwe de bêhtir li medresê dima û ji xwe re dihziirî.Lê Mihamed li Xizanê bidest nivîsandinê kiribû. Di wê heyeme de hinekî lez ji dide nivîsandina xwe wî di wê heyeme de.Weke ku hinek hizrên girîng di serê wî de hebin û ew bixwezê bi lezekê bêne ser ziman tevdigerehe.Her caran ku ew bi faqihên xwe re dirûnişt û hinekî fêrî wan dikir êdî piştre ew diçû û li kûrcika xwe dirûnişt û dihizirî û dinivîst.

Mihamed, ji xwe êdî nikarîbû ku weke berê li ser bigerihî.Lê wî hê ji ji dev li ser xwe gerandinê ne diberda.Li nav xweza û li hevdirdore digeraha.Bi mirovên ku digaha wan, bi wan re dirûnişt û diketa axiftinê de.Her weha pir demên xwe derbas dikirin.Lê di wan demên xwe yên dawiyê de êdî ji ber ku ew nikarîbû ku wilo zêde li ser xwe begarihê, êdî ew li Medresê ji xwe re dirûnişt û hizir dikir û dinivîst.Hinek nivîsên wî yên ku pir dirêj bûn di nav faqihên wî de weke pirtûkên perwerde û fêrkirinê dihatina bikar anîn.Wî li wir ji bo ku temenekî mazin û baş biafirêne pir dinivîsand.

Jiyana Mihamed beşa wê ya li Xizanê bi du tiştan dimeşî. Yen perwerdekirin û fêrkirin û ye din ji nivîsandin bû.Wî li wir girenî dabûbû van herdûkan.Li wir bi vê yekê ji hatibû naskirin. Deme ku hatibû wir ji, bi zanebûna xwe hatibû naskirin.Lê divêt ku mirov bêje ku berî ku ew were wir û li wir bicih bibe navê wî hatibû hatibû û hatibû hiskirin.Yên ku navê wî ne bihîstibûn hema bêja nebûn.Herkesekî navê wî bihîstibû.Herkesekî ew naskiribû.Herkesekî navê wî naskiribû.Navê wî bi zanebûn naskiribûn.Yên ku ew naskirbûn û navê wî bihîstibûn ji, hem navê wî yê malbatî û hem ji navê wî yê ku di deme perwerde û zanebûna xwe de hildabû ji zanibûn.Bi vê yekê ew pir baş hatibû naskirin.Navê wî pir baş û qanc hatibû nas kirin. Mihamed ku mirov bahsa wî bike û demên jiyana wî bike, divêt ku mirov vê demê wê ye li Xizanê biqasî deme wê ye li Cizîre bota mazin û girîng şîrove bike û bêne ser ziman. Ji ber ku her weha pir girîng bû.Mihamed li Cizirê Bota bi pêşketina xwe pir bi pêş ve çûbû bû û li wir pir nivîsandibû.Li Xizanê ji ketibû heman rewşê de di wê heyeme de.

Mihamed ku weke qadarekê axiftibû piştre mabû sekinî û pişt wî re ji miorvên li dore wî bi hev re ketibûbûna axiftinê de.Pir bi hev re di dan û distandin. Şêx Birehim û mîr ji di nav axiftinê de bûn. Mîr yê ku di axiftinê de herî li pêş bû bû.Wî ji hizre di anî ser ziman. Ew ji mirovekî ku zanebû.Wî ji ji biçûkatiya xwe haya ciwaniyê de demên xwe li ber destê seydayan bi xwandinê buhurandibû.Li ser mijarên ku ew li ser diaxiftin, ew ji xwedî zanebûn bû.Mihamed deme ku axiftibû, di axiftina xwe pir bahsa seyde Mazin meleyê Cizîrî kiribû. Li ser wî û hizre wî sekinî bû. Pir ji wî anî bû ser ziman.Ji xwe yên ku li wir rûniştî bûn ji, mirovne ku zane bûn.Ji ber ku vê yekê, mirov nikarê bêje ku ew bêzan bûn. Ew ji bizane bûn. Hizre wan ji hebû.Heya wan ji ji hizre seyde mazin meleyê Cizirî hebû.Ji ber ku di deme ciwaniyê de bê û piştî demên ciwaniyê xwe bê, seyde mazin meleyê Cizirî çûbû bû wê herêmê û li wê herêmê li civatên wan rûniştibû û hizrên xwe ji wan re li ber wan anibûbûna ser ziman. Lê di vir de tiştekî ji divêt ku mirov binî xatkê û bêne ser ziman.Ew ji her weha ev bû.Seyde Mazin meleyê Cizîrî di deme xwe de pir nivîsên wî yê dirêj ku wî bidestê xwe nivîsandibû hebûn.Pir ji bi zimanekî xweş û xweşik wî nivîsandibû. Li wê herêmê ji, heya mirovan ji wê yekê hebû.Ew nivîsên wî gelekan ji xwandibûn.Hinek nivîsên wî li medrese amede bûn.Hinek ji li dergaha şêxê heskîfê şêx Hisên bûn.Hinek ji li Cizîre bota bûn.Gelek mirovên li wir ku di wê heyeme de li wir rûniştî bûn ji, ew nivîsên wî xwandibûn.Lê Mihamed divêt ku mirov bêje ku ew nivîsên wê hebûn

xwandibûn. Bi wê ve ji nema bû.Di deme ku ew gehabûbûyê de û pêre mabû de pir lê hisandibû û hizre wî gelek ji wî his kiribû. Ew ji di serê wî de jîn û zîn bû di wê heyeme de.Hemû ji di bîre wî de bû.Ew mirovekî ku pir bi bîr bû û pir bîrewer bû.

Di wê heyeme de deme ku ew axiftibû ji pir xweşik axiftibû û anîbû ser ziman. Bi xweşik axiftina xwe kiribû ku bala herkesekî di deme axiftinê de herê ser wî û bi xweşik gotinê ji kiribû ku her gotina wî ya ku wî gotibû bikeve seran de û di seran de bimêne.Bi vê yekê, ew di wê heyeme de pir di bîrê de bû.Mihamed, piştî ku wî axiftina xwe bidawi kiribû ji û mabû sekinî û piştî axiftina wî re mirovên li dore wî bidest axiftinê kiribûn û gelek mirov ji axiftibûn ji, hê jî bala herkesekî li ser wî bû di wê heyeme de.Hê gotinên ku wî gotibûn, di serê mirovên li dore wî de dikirina zingezing.Bi vê yekê, balaka mazin li ser wî bû.Bala mîr ji li ser wî bû. Mîr demên ku ew diaxift ji, bala xwe ji ser Mihamed ne divaqatand.Şêx Birehîm ji her weha mirov karê ji bo wî bêje.Lê bala şêx Birehîm ne tenê ji bo axiftina wî çûbû bû ser wî û li ser wî mabû bû.Di deme axiftina wî de û piştre de wî bi Mihamed re farq kiribû ku Mihamed hinekî bi ser dilê xwe digirê.Ma gelo çi wî hebû?Wî bersive vê pirsê nizanibû.Lê ev pirs di serê wî de hebû û pirsi ji dixwest ku bersive wê zanibe.Lê nizanîbû.Piştî ku wî wilo di Mihamed de kifş kiribû, êdî bala wî çûbû bû ser wî û êdî bala wî ji ser wî nevaqataha bû.Di demên axiftinên xwe de ji ew pir bi bal bû li wî di wê heyeme de.Mihamed, weke ku wî dixwest ku nexweş nede nîşandin tevdigerehe.Her weha ew tevdigerehe.

Weke qadarekê her weha li hevdû man û bi hev re axiftin. Dem ji hin bi hin bi ber dereng bûnê de diçû.Êdî wan ji wê kare xwe kiribana ku rabina ser xwe di wê heyeme de.Deme mêjê ji dihat. Divîyabû ku rabûbûban û çûban û kara xwe kiriban. Ew demeke dirêj bû li hevdû rûniştîbûn. Gelek mirov li hevdû rûniştî bûn. Deme ku ew hatibûbûna medresê ji bi rûniştînê, ew ne hindik bûn.Piştî ku hatibûbûna medresê, êdî li medresê faqihên ku hebûn ji li wan zêde bûbûn.Piştre hinek sofî ji hatibûn û tevlî wan bûbûn.Bi vê yekê, êdî bûbû bûn gelek.Piştre ku hinekî dî ji dem têve çû, û li hevdû rûniştî man û bi hev re axiftin, êdî piştre yê ku bahsa rabûnê kir şêx Birehîm bixwe bû.Wî rabûn bi bîr xist.Piştî ku wî dem bi bîr xist, êdî mirovên ku li wir rûniştî ji bûn, weke ku dem were bîre wan li wan hat.Weke ku werine xwe di wê hyeeme de li wan hat.Bi vê yekê re êdî wan ji got deme rabûnê hatiya û bahsa rabûnê kirin. Piştre ku her weha bahsa rabûnê hata kirin, êdî ji xwe ew li hevdû bicivîn zêde neman.Piştre kara xwe kirin û rabûna ser xwe.Deme ku rabûna ser xwe, êdî Mihamed û şêx

Birehim û ku mîr ji di rex wan de dana pêşîya civatê û bi hev re kirin ku derkevin.Deme ku rabûn ji, di wê heyeme de baa şêx Birehîm li ser Mihamed bû. Mihamed weke ku hinekî zorê bikişêne dihata ber çavan.Wilo ew dihata xuyakirin.

Ku wan da xwe û rabûna ser xwe, êdî piştre şêx Birehîm û Mihamed û ku mîr ji di rex wan de, dana rex hevdû ji hundur derketine derve.Deme ku derketina derve, êdî bi hev re derketin. Faqihên ku li wir hebûn û sofîyên ku hatibûbûna cem wan bi hev re ketina rex wan de û bi wan re çûn ku herine mizgeftê.Ku ketine rê de ji axiftina di nav wan de ne hata birrîn. Ew bi hev re diaxiftin û dimeşîn. Mihamed ji car bi car hin gotin ji mirovên li dore xwe digotin. Di wê heyeme de di deme meşandinê de, ji xwe yên ku zêde dengê wan derdiket û diaxiftin, mîr, şêx Birehîm û Mihamed bûn.Yên din hinek ji wan yên ku pir pîr bûn car bi car ku hin gotin gotiban, wekî dî ji ew bêdeng diman.Wan bizêdeyî ji xwe dide hisandinê. Li wan dihisandin. Li Mihamed, mîr û şêx Birehîm dihisandin.Hersê mirov ji, mirovne ku rêzeke mazin ji wan re hebûn bûn.Navê wan û rêze wan hebû.

Weke bêhneke di rê de meşîn. Di rê de dimeşîn û bi hev re diaxivin. Mîr ji û şêx Birehîm ji şû Mihamed ji diaxivin.Mihamed deme ku cara pêşî di wê heyeme de axift, di axiftina xwe de bizêdeyî deme ku wî bahsa hin zanistan kir. Di axiftina xwe de wî dise bahsa seyde mazin meleyê Cizirî kiribû.Ji wî hinekî dî ji anîbû ser ziman.L wê carê wilo zêde ne axiftibû.Wî axiftina xwe kinbirrî bû.Lê çend gotinên ku ji wan wî anîbû ser ziman, gotinên girîng bûn. Bahsa hizre wan kiribû.Hinek gotinên wan yên ku di nav xalkê de pir dihatina zanin û pir diaxiftinan de dihatina ser ziman, wî bahsa wan kiribû.Mihamed deme ku axiftibû, di wê heyemê de bi çend gotinan wî hizre xwe ji anî bû ser ziman. Wî hizre xwe li ser zanebûnê anîbû ser ziman. Deme ku wî bahsa zanebûnan kir, hingî, wî di serê axiftina xwe de got ku ”divêt ku hizre zanistan rastiyê bêne ser ziman” û piştre wî axiftina berdewam kiribû.Piştre hinekî li ser gotin û hizre wan, weyne wê di nav xalkê de çiya û çawa ye li ser wî rawastaha bû.Li ser wê pir anîbû ser ziman.Li gor Mihamed divîyabû ku zanist ji rastiya xalkê axiftibû bûna.Ji rastiya xalkê anîbana ser ziman.Rastîya xalkê çi bû?Wî li ser vê pirsê ji pir serî wastandibû û li ser wî di serê xwe de xwe gehandibû hinek hizirne.Mihamed, digot ku hizrek ku dinav xalkê de hata ser ziman, wê ew hizir hebe nebe bandûraka xwe çêke û dê nîşandin. Bi vê yekê re li gor wî hizir rastbûna ji. Wî di bêja hizir û hizirkirinê de wate bêja rastiyê ji dianî ser ziman.Mirovê zanist bixwe ji li wî, yê ku zanibû ku rast bi peyiyê bû. Yê ku rast peyivîbana, ew mirov zanist bû.Bi vê yekê re, wî

berdewam dikir û hizre xwe dianî ser ziman. Wî digot ku medam, ku mirov karê rastyê bêne ser ziman, wê çaxê, pêre têgihiştineke rastiyê ji heya. Bi vê yekê re wî berdewam dikir û û her weha digot.Ku rasti, têgihiştinê wê pêre bû, wê çaxê ji, hinekî xwe gehandina rastteqîniyê ji pêre bûya.Ew mirovê ku xwe gehandî têgihiştinê rastiyê, yê ku xwe kiriya riya xwe gehanda rastteqîniyê ji. Ev mirov, mirovê ku karê di nav xalkê de bi hizre xwe û hebûn xwe hinek tiştan bêne ser ziman a. Mirov ku karin bi hizre xwe û hebûna hinek tiştan bênine ser ziman, yên ku karin, pêşketinekê bidine çêkirin û ji pêşketinê di nav xalkê pêşevaniyekê bikin.Di nav xalkê de ji xwe pergalak ava bû. Pergalak hebû. Mihamed ew pergal bi hizir û têgihiştina wê dîtibû û fahmkiribû.Wî deme ku hizre xwe di nav xalkê de li ser alim û zanistên weke seydeyê mazin meleyê Cizîrî dianî ser ziman weke ku di çerçove wê pergala di nav xalkê de dianî ser ziman. Wî ev yek bi xwe re hîs dikir û di dît.Mihamed di wê têgihiştinê de bû, ku mirov bide xwe wê karibe di serê xwe de xwe bigihêne pir hizran.Lê ji bo wê ji, li gor wî riyaka rast û wî di deme hizirkirinê de karibûna têve herê, pêdivîya wî pê hebû.”Riya rast”, bêjeyeke ku pir girîng bû.Wî di axiftinên de gelek caran bahsa wê bêjê kiribû û anîbû ser ziman.Mirov ku bihzir bû, hinekî di serê xwe de hebû ji ji xwezê dûrketibana. Wî ev yek ji pir girîng didît.Ji ber vê yekê li ser vê yekê, deme ku diaxift, bahsa awayê hizirkirinê cerna pir disekinî. Pir li ser dianî ser ziman.Riya ku mirov dimeşê û têve diçê di nav xalkê ve diçê.Ji ber vê yekê, hzire mirov ji, divêt ku li gor wê yekê bana. Wî girîngî dide wê yekê.Ew li ser wê yekê di rawastaha. Di deme axiftina xwe de, deme ku axift, li ser ”hizre rast” û ”rastiye hizir” sekinî.Wê heyeme de hin faqihên wî di rex wî de dimeşîn.Wî li wan ji meyîzend. Weke ku gotina xwe ji wan re bêje û bêne ser ziman li wan meyîzend.Di hizre Mihamed de xweza bêjeyeke pir pir girîng bû. Divîyabû ku xweza pir baş bihatana fahmkirin.Xweza, bi hebûna xwe re jiyana mirov bixwe ya ji.

Deme ku mirov li ser hizre Mihamed rawastihê, hingî, mirov dibîne ku ew li nav xalkê û mirovan bixwe ji, xwediyê nêzîkatiyaka pir bixweza bû.Wî pergalaka xweza ku afirî di dît.Ew yek ji, di demê de xwediyê hebûn û pêşketineke çawa bû, wî fahm kiribû.Li ser hizir û olê dirawastiha.Li ser hizre dianî ser ziman. Li ser gelek mijarên hizrî ku di nav xalkê de ji di civatan de li ser dihata axiftin wî hizre dianî ser ziman.Bi vê yekê, weke ku bixwezê riyakê bi anîna hizre xwe ye li ser ziman re, şanî mirovan bide diaxift.Ew her weha xwediyê hebûnekê bû.Mirovekî ku zane ji xalkê ne dûr e. Ew, li gor wî, çend ku pêşketinên demê dixwêne û têne ser ziman,

awçend ji zaniste.Wî zanistitî li ser hinek xalan dide rûniştandin.Ji aliyê hizir ve nerîn û fahmkirina jiyanê û di nav mirovan de ji fahmkirin û dana fahmkirin li gor wî pir girîng bû.Nirxek li gor wî bi serê xwe ne afirê. Jê re dem û mirov lezima. Wî wilo dianî ser ziman.Bi vê yekê, hizirne xwe dianî ser ziman.

Deme ku Mihamed di rê de dimeşî û diaxift, hingî, balaka mazin li ser wî bû.Mîr bixwe ji, lê pir bi hey bû û lê dihisand.Şêx Birehîm ji her weha lê pir bi hey bû û lê dihisand.Ew demek bû ku Mihamed û şêx Birehîm hatibûbûna cem hevdû.Lê belê ew deme dem ji, têrê kiribû ku ew hevdû nasbikin û mêhle wan herê ser hevdû.Mihamed mirovekî ku zanebû û ji aliyê saxsiyetê ji mirovekî ku xwûn şêrîn bû.Ji ber vê yekê, zû bi mirovan re kelegerm dibû.Di wê heyeme de ji ev yek wilo bû.Deme ku hatibû wir, pêşî cara pêşî ku axiftibû ji dore xwe re, kiribû ku bi zanebûna wî bala mirovan herê ser wî.ew her weha mirovek bû.Di wê heyeme de deme ku diaxift, mîr bi hey lê serê zîvirandibû lê dimeyîzend û dihisand.Lê axiftina Mihamed ye wê deme, wilo zêde berdewam ne kir.Piştre ne bi gelekî re wî axiftina xwe bidawi kir.Wî axiftina xwe bidawi kir û ma sekinî.Deme ku wî axiftina xwe bidawi kir û ma sekinî, êdî pişt wî re yê ku di cih de mafê axiftinê hilde û çend gotin ji dore xwe re gotin şêx Birehîm bû.Wî çawa ku mafê axiftinê hilde û bidest axiftinê kir, balaka mazin çû ser wî ji.Lê wî axiftina wilo zêde berdewam ne kir.Ji xwe di meşê de wan nizanibû ku wan deme xwe çawa buhurandiya. Hew dîtibûn ku wa li ber devê derîyê mizgeftê ne. Deme ku gehana ber devê derî, êdî zêde wilo li derve ne man û buhurtine hundur.Ku buhurtina hundur, êdî li hewşa mizgeftê li ser lingan kirin ku hinekî bimênine sekinî.Li hewşa mizgeftê ji mirov hebû. Deme ku ew ketine hundur de, êdî ew ji bi ber wan hatibûn û li ber wan sekinî bûn.Mihamed li pêşiyê bû.Şêx Birehîm û mîr ji di rex wî de bûn.Bi hev re ku di rex hevdû de ketibûbûna hundur de.

Ku ketibûbûna hundurê hewşê de, êdî li hewşê hinekî bi mirovên ku hatibûbûna pêşiye wan û li ber wan sekinî bûn re, hinekî, weke qadarekê li ber hevdû sekinîn û bi hev re çend gotin ji hevdû gotin.Mihamed zêde li ser lingan nema.Ji ber ku wî nikarîbû ku zêde li ser lingan bi mêne.Piştre bi bêhnekê re wî gote mirovên li dore ”deka nexwe em herine hundur û li hundur li cihê xwe rûnihin” û piştre kirin ku berê xwe bidine hundur.Şêx Birehîm hê ku li medresê bûn, wî bi Mihamed re farq kiribû ku hinekî nerehetî pêre heya.Ji ber wê yekê, hingî, bala wî çûbû bû ser wî û êdî bala wî ji ji ser wî ne vaqataha bû. Di rê de ji, deme ku dihatin ji, bala şêx Birehîm li ser wî bû.Lê deme ku Mihamed di hewşa mizgeftê de weke ku

êşek bikeve laşê wî de ruyê xwe qarmiçand û ma sekinî û piştre gote mirovên li dore xwe deka em ne xwe herine hundur û li cihê rûnihin, hingê, weke ku mîr ji pêre nerehetiyek kifşkiribû.Deme ku Mihamed wilo gotibû, êdî ti kesekî ne gotibû ne û di cih de herkesekî di pêşîye mîr û şêx Birehîm û wî de berê xwe dabûbûna hundur.Hê hinek dem ji mêjkirina wan re hebû.Ji ber vê yekê ji, deme ku çûne hundur hinekî li hundur li hevdû rûniştin û bi hev re ketine axiftinê de.

Mihamed, deme ku ew rûniştin li hevdû, hinekî ma sekinî di cihê xwe de.Lê mirovên di axiftin hebûn.Lê bêdengiye Mihamed ye wê demê ji bala mirovên dore wî kişandibû ser xwe di wê heyeme de.Piştre ne bi gelekî re yê ku ji Mihamed pirsî bû û gotibûyê de ”ti başî seydeyê min” mîr bû.Mîr deme ku jê pirsî Mihamed weke ku ji dil xwe baş bide nişandin got ”ez başîm” û ma sekinî û piştre wî ji kir ku tevlî axiftinên ku dibûn bibe.Ew ji weke qadarekê tevlî axiftinan bû.Wî ji mafê axiftinê girt û di wê heyeme de hizre xwe di çerçove axiftina mirovên li dore xwe de anî ser ziman.Lê jê dihata fahmkirin ku ew nexweş bû.Lê wî dikir ku li xwe neyêne der.Wî her weha hewl dide di wê heyeme de.

Weke qadarekê ku ew li hevdû bi hev re diaxivin, êdî piştre deme mêje wan têt û piştre bihev re dikin ku mêj bikin.Mihamed li pêş bû.Wî, wê li pêş mêj kiribana.Di rêze pêşde mîr û şêx Birehîm ji hebû.MIhamed di cihê xwe de sekinî û piştre weke qadarekê ku qamat hata kirin, êdî ew bi hev re rabûna ser xwe û ketine rêzê de û bidest mêjkirinê kirin..

Weke qadarekê ku di mêjê de man û mêj ji kirin, êdî piştre li hevdû biciviîn man û Mihamed hinekî ji wan re axift.Mihamed deme ku axift herkesek lê şaq bû. Wî axiftinaka pir xweş kir ji mirovên li dore xwe re.Lê dengê wî ji hin bi hin diçû û dihat.Ji dengê wî dihata fahm kirin ku derdekî wi Mihamed di laşê wî de hebû.Li dore wî gelek mirov hebûn û lê dihisandin.Wî bi wê zanebûna xwe pir mazin ji wan re axiftin dikir.Ji wan re bahsa qancî û başbûnê dikir. Bahsa têkiliye mirovan ye bihev re kir.Bahsa têkiliyê wan ye bi bawerî û nirxên wan re kir.Li ser vê yekê pir sekinî.Li ser wê yekê pir sekinî û axift. Mihamed axiftinaka pir dirêj kiribû. Deme ku axiftibû ji ne tenê ji olê û baweriyê olê axiftibû.Ji hizir û dîroke hizir ji hinekî anîbû ser ziman. Di wê heyeme de bi vê yekê, wî axiftinaka pir xweş kiribû.

De ne, di wê heyeme de li ser teyrê sîmûrg pir nîqaş hebûn.Li ser cihê wî û xwe gahandina wî de pir nîqaşaka mazin hebû. Her zanistên demê hizre dianîna ser ziman. Berî wê demê ji gelek zanistan li ser hizre xwe anîbû ser ziman.Herkesek li dinyê li cihê wê digerehe. Gelekan bawer dikir

ku çiyayê Araratê cihê ku ew lê bû.Li Kurdistanê cihê ku herî bilind ji ew der bû.Ji ber vê yekê bawerî bi vê yekê hebû û di nav xalkê de li vê yekê bawerî dihata ser ziman. Hinekan ji bahsa çiyayê Cudî dikir.Ji ber ku ev çiyayê Kurdistanê, bawer dihata kirin ku Nebî Nuh lê û ber wê jiyanaka mazin jîn kiribû.Ji ber vê yekê ji, hebe nebe wê teyrê sîmûrg wê xwe li wir bigirê.Cizirê bota Nêzîkî Çiyayê Cudî bû û tirba Nebî Nuh bixwe ji li wir bû.Ew li wir li ber avê diclê bicih bû.Ji ber vê yekê ji, dihata bawer kirin ku ti mirov û ajal ne dixwest ku xwe ji wî û ji cihê ku ew lê ye, jê dûr li cihekî bimêne.Bi vê yekê, êdî dihata gotin ku ew li wir bû.Teyrê Sîmûrg şaxê teyran bû.

Mihamed ji li ser teyrê Sîmûrg hizre wî hebû û dianî ser ziman.ew demeke dirêj li Cizîre bota mabû.Cizîre bota ji navende vê vegotinê bû.Ew vegotin ye dore wêderê bû.Ye wê herêmê bû.Mirovên wê herêmê ji pir li ser diaxiftin.Li ser pir xwedi zanebûn bûn. Weke efsenaya Şahmaran, ev efsena ji di nav kurdan de heft şev û heft rojan dihata gotin, lê dawiye wê ne dihat.Pir dirêj dihata vegotin.Pir xweş ji dihata vegotin.Deme ku dihata vegotin, yên ku lê dihisandin, weke ku xwe di dinyeyekê din ji bibînin li wan dihata.Wilo xwe di xwe de hîs dikirin.Ku ji heyemên berê mabûbûn û heya wê heyemê mabûbûn sê çar efsenayên kurdî yên ku pir dirêj dihatina vegotin hebûn.Ev efsenayan ji her weha Rûstêmê Zal, Şahmaran, Teyrê Sîmûrg û Keçelok bûn.Lê gelek efseyanên din ji hebûn.Lê yên bi nav û deng ev bûn.

Mihamed li ser wan ji xwedi zanebûn bû.Li ser dîroke wan pir bizanebûn bû.Mirov divêt ku li vir bêje ku her kurdî efsenayên xwe zanibûn.Ji ber ku di kevneşopîya wan de civat hebûn û di her civatê de ev dihatina vegotin.Civatên wan ne tenê li qasr û deverên mazin dibûn.Li herdeverî dibûn.Deme ku mirov lev digehana hevdû ji, êdî ji hevdû re her weha çend efsenayên wan hebena ji hevdû re digotin.Ji ber vê yekê, di nav kurdan de çandeka devkî yanî çandeka vegotinê pir xurt hebû.Ji dev çîrok û efsena û vegotinên ku hebûn dihatina vegotin.Bi vê yekê re, yên ku his dikirin ji êdî ji bîr ne dikirin û devereke dî ye ku ew diçûnê de ji, êdî wan ji dianî ser ziman.Di çanda kurdan de civat u çanda devkî hevdû temem dikin. Hevdû di parezên û dibine pêşarojê ji.Pêşketinê ji di hevdû çêdikin.Di civaka kurdan de civat, deme ku were ser ziman, divêt ku were rayaka civakê ya xwûne û pir girîng were ser ziman.Civat divêt ku pir girîng were ser ziman.Di civatan de hizrên olî û yên felsefî yên di nav xalkê de dihatina ser ziman û parastin. Civat weke platformên xalkê yên li hevdû civîbûnê û hizirkirinê bûn. Ji xaynî vê ji, civat cihên ku hizir û felsefe têde

dihata afirandin bûn.Bi civatan de pergalaka civakî ye ku di nav xalkê de hebû li ser lingan dima.Ji ber vê yekê, divêt ku mirov civatan pir mazin, binirz û bi rêz bêne ser ziman.Civat, her weha di nav xalkê pir girîng bûn.Kevne şopîyeke civatan ye ku bi hezar salan re were ser ziman hebû.

Mihamed, deme ku piştî mêjê ji mirovên li dore xwe re bidest axiftinê û hinekî axift, êdî piştre wî axiftina xwe bidawî kir û piştî wî re hinekî şêx Birehîm mafê axiftinê hilda û axift. Wî ji hinekî hizre xwe û ye di serê xwe de anî ser ziman ji mirovên li dore xwe re.Lê ew deme ku axift, weke ku Mihamed axift li ser hizir û aliman sekinî. Li ser hizre aliman rawastaha. Di axiftina xwe de wî bahsa Nebî Nuh ji kiribû.Demeke dirêj li ser wî rawastaha bû.Piştre wî axiftina xwe bidawi kiribû û mabû sekinî di cihê xwe de. Piştî ku ew mabû sekinî, êdî hinek mirovên li dore wan, ku zanebûn û zanebûna wan ji mazin bû, kiribûn ku ji dore xwe biaxivin û ew ji hinekî bênine ser ziman.Wan ji xwestibû ku hizre bênine ser ziman.Wan, piştî şêx Birehîm xwe ji axiftinê re amede kiribûn.Yê ku di nav wan mirovên ku xwe ji axiftinê re amede kiribûn, yek ji wan ji mîr bixwe bû.Lê deme ku şêx Birehim di axiftine xwe bahsa Nebî Nuh kiribû û hinekî hizre wî ji anîbû ser ziman, êdî Mihamed ji weke ku dii cihê xwe de were xwe lê hatibû. Deme ku wî navê Nebû Nuh his kiribû, di cih de weke ku hinek hizir yên ku di derbarê wî de an ji bi wî ve girêdayî hatibûbûna bîre w di wê heyeme de.Bi vê yekê re wî ji xwe axiftinê re weke ku amede kiribû. Weke ku wî dixwest ku careke dî mafê axiftinê hildê û bi peyîvê.Deme ku hê ku şêx Birehîm axiftina xwe xilas ne kirî, ku mirovên li dore wan farq kiribûn ku wî ji xwe ji axiftinê re amede kiriya, êdî wan weke ku xwe di nêzîkatiye xwe de xwe bi şûn ve kişandibûn û mafê cihê axiftinê yê pêşî ji Mihamed hiştibûn.Deme ku mirov li wan dimeyîzend Mihamed ev yek fahm dikir.Mîr Ahmed ji xwe ji axiftinê re amede kiribû.Lê deme ku wî ji dîtibû ku Mihamed ji xwe ji axiftinê re carekê dî amede kiriya, êdî ew mabû sekinî di cihê xwe de di wê heyeme de.Piştî ku şêx Birehim axiftina xwe bidawi kir û ma sekinî di cihê xwe de, êdî di wê heyeme de di cih de Mihamed mafê axftinê hilda û axift.Ji xwe hê ku şêx Birehîm axiftina xwe bidawi ne kiribû, mirovên li dore wan dîtibûn ku Mihamed xwe ji axiftinê re amede kiriya.Ji bo axiftinê êdî bal çûbûbana ser wî di wê heyeme de.Mihamed ji ev yek di wê heyeme de di mirovên li dore xwe de kifş kiribû ji bo xwe di wê heyeme de.PIştî ku şêx Birehim axiftina xwe bidawi kir, êdî wî mafê axiftinê hilda û careke din wî bidest axiftinê kir.Deme ku wê carê Mihamed axift, Mihamed axlabe wê carê li ser jiyan û hizre Nebî Nuh rawastaha. Ew anî ser ziman.Bahsa wî kir.Deme ku bahsa wî kir,

hingê, di nava axiftina xwe de bahsa deme xwe ye ku ew li Cizîre bota mabû ji kir.Di axiftina xwe bahsa Faqa Qasim û mele Silêman ji ji kir. Faqa Qasim seydeyê mizgeftê Nebi Nuh bû. Wî li wir li pêşiye mirovan mêj dikir.Ew seydeyekî pir bizane bû.Hizre wî pir mazin bû.Wî hizre xwe dirijanda ser rupel ji.Nivîsên wî yên ku pir dirêj bûn û faqihên medresê Sor û mirovên ku li mezgeftê diketine hizir de li wir dixwandin.Faqa Qasim bi Mihamed re pir mabû û pêre pir ketibû danûstandinê de.Pêre pir axiftibû.Wî hizre xwe pir ji Mihamed re anî bû ser ziman.Li wî li s er Nebî Nuh û deme wî û wê jiyana wî ya dirêj ji nivîsandibû.Mihamed ji ew nivîsên wî xwandibûn.Ji ber vê yekê pir di derbarê hizre Qasim de xwedi zanebûn bû. Pêre ji li ser Nebî Nuh ji pir xwedi zanebûn bû. Mele Silêman ji li ser Jiyana Nebî Dawid ji nivîsandibû.Wî li ser jiyana wî û hizre wî pirtûkeke ku navê wî lê kiribû û pir stûr bû nivîsandi bû.Mihamed ew pir pirtûka wî ji xwandibû. Li ser pirtûka wî ji pêre ketibû dan û standinê de.Hizre wî jê ji hisandibû.Mele Silêman û Faqa Qadim du mirovên ku pir zane bûn. Herdû ji alim bûn.Mele Silêman, navê wî bi ”Mele Silêman” derketibû.Lê ew bixwe ji ji mala şêx bû.Ji ber vê yekê ji qadarekî wî yê pir mazin û hebû.Faqa Qasim ji weke wî bû.Ew ji wilo bû.Herdû ji li wir bûn û li dore wan herduyan ji hertimî sofîyên ku ji wan qutnedibûn hebûn.

Mele Silêman li ser Jiyana Birehîm xelîl ji pir diaxift. Li wir jiyana wî ji pir xwedi zanebûn bû.Li ser hizrên wî pir xwedi zanebûn bû.Deme ku wî bidest axiftinê dikir, herkesekê li dore wî bi bal heya xwe didanê de û lê dihisandin.Ew, xwediyê zimanekî ku pir xweş ji bû. Mirov deme ku lê dihisand, mirov hema wilo tenê dixwest ku ew bi peyivê û mirov lê bihisêne. Wilo dilê mirov ji mirov dixwest.Li ser jiyana Birehîm xalîl ku diaxift, dikir ku mirov ji xwe herê. Wilo xweşik û bizane diaxift.Hizre Birehim xelîl li ser gelek mijaran hebû. Birehîm xelîl li ser gelek mijaran hizre xwe anîbû ser ziman. Ew hizre wî ye ku wî bixwe anîbû ser ziman, bi gotinê herkesekî zanibû.Deme ku li hevdû dirûniştin ji pir ji hevdû re dianîn ser ziman.Birehîm xelîl biqadrekî nêzîkî mirov û jiyanê dibû.Têkiliyê wî û ye jina wî ye bi hev re pir li ser  dihata axiftin. Jina wî Sarê jnaka zanebû.Birêhîm xelîl jê re pir rêz didayê de.Birehim Xelîl, mele Silêman di derbarê wî de pir bizanebûn bû, weke ku çawa ku di derbarê Nebî Dawid de bizanebûn bû.

Mihamed di wê heyeme de deme ku ji dore xwe re bidest axiftinê kiribû û axiftibû, ji wê demê û axiftinên xwe yên ku bi faqa Qasim û mele Silêman re ji kiribûn, minaq ji wan ji mirovên li dore xwe re dianîn ser ziman.Wan ji, pir bi bal lê dihisand.Mihamed demeke dirêj Li ser Nebî

Nuh axift û wî çawa bi faqa Qasim re li ser axiftibû faqa Qasim ji wî re çawa anîbû ser ziman, wî ji wilo ji wan re anî ser ziman.Bîreke Mihamed ye xurt hebû. Her tişte ku berî jîn kirbû di hiş û bîre wî de bû.Pêre ji bahsa mele Silêman kiribûn û deme ku bahsa wî kiribû ji, êdî pêre bahsa ew hizrên wî yên ku wî di derbarê wan nebîyên ku ew di derbarê wan û hizre wan û zanebûna wan de diaxift ji diênê ser zimên.Deme ku bahsa anîna ser ziman ye mele Silêman kiribû, pêre pir li ser nebî Dawid ji axiftibû.Bahsa nivîsên wî yên di derbarê wî de ji kiribû.Weke ku pirtûka mele Silêman di wê heyeme de ji wan re bixwêne dianî ser ziman.Demeke dirêj her weha Mihamed diaxiftinê de weke ku xwe winda bike lê tê û tenê diaxivê û tenê ser ziman.Ew pir xweşik bi zane tenê ser ziman.

De ne, divêt ku mirov li vir bêne ser ziman, ku di nav kurdan de weke kevneşopîyekê bû ku li ser jiyana Nebîyan di civatên de bênine ser ziman.Li ser jiyana nebiyên weke Yusif, Yunis, Birehim xelîl, dawid, Îsa, Lut û Mihemmed û hwd pir dihata axiftin. Yên ku li ser wan ne bi agahdar bû, weke ku nebû.Herkesek li ser wan û jiyana wan û hizre wan pir biagahî bû. Mihamed ji pir bi agahî bû. Deme ku hê ji zaroktiyê bidest xwandinê dihata kirin, fêrbûna jiyana nebîyan weha felsefeyeke sincê dihata fêrkirin. Ji bo ku ew ji jiyana wan fêrê derxin ji pir li ser dihata sekinandin.Mihamed, deme ku hatibû deme ciwaniya xwe, hê hingî, ew hema bêja di derbarê jiyana wan de bûbû xwedi agahî.Lê piştî ku çûbû bû Cizîre bota, êdî li wir wî xwe di hizirkirin û di felsefe û hizre wan de pir kur kiribû.Bi vê yekê, wî pêşketineke mazin di xwe de çêkiribû.Li jiyana wan di serê xwe de ew pir kur bûbû.Pir bi hizir bûbû.Bi vê yekê, wî di serê xwe de hizre rastteqîniyê afirandibû û hertimî di wê hizrê de ew kur dibû.Rastteqînî bêjeyeke ku ku mirov di hizre Mihamed de pir li ser bisekinê ye.Divêt ku mirov pir li ser rawastihê.Li ser wê bêje wî jiyana xwe afirandibû.Li lêgerîne rastteqîniyê wî jiyana buhurandi bû.Bi vê yekê ew mazin bû û di nav mirovan de û civatan de hata naskirin.Wî serweriyeke pir mazin di serê xwe de çêkiribû. Wê heyeme de deme ku diaxift, mirov ev yek pêre kifş dikir. Di wê heyeme de, ew weke demeke dirêj diaxivê.Di axiftina xwe de her weha pir mazin tenê ser ziman. Pêşî ji jiyana alim û nebîyên bidest axiftinê dike. Piştre çend gotinan ji li ser hizre bawerî û rastteqîniyê têne ser ziman.Piştre ku weke qadarekê her weha diaxivê, êdî ew axiftina xwe bidawi dike û di sekinî. Ew demeke dirêj axiftibû.Lê ew ji nizanê ku ew çiqaî dirêj axiftibû.Lê deme ku ew axiftina xwe bidawi dike û di sekinê, êdî ew ji fahmdike ku ew demeke pir dirêj

axiftiya.Pîştî wê axiftina wê ya dirêj û xweş re êdî ji hundurê ti kesekî naye ku ti gotinê bêne ser ziman û bêje.

Piştre bi qadarekê re yê ku mafê axiftinê dihildê û çend gotinê dibêje ji, şêx Birehîm bi xwe ya.Wî bidest axiftinê kir, wî hinekî ji mijarên ku Mihamed li ser wan axiftibû anîbû ser ziman.Mihamed bi rasti ji deme ku diaxift, weke ku pirtûkaka dîrokî ji dev bixwêne wilo bi pergal û zane diaxift.Di wê heyeme de ew pir dirêj ji axiftibû.Wê dirêj axiftina wî, balaka mazin kişandibû ser xwe di wê heyeme de. Piştre axiftina wî re bi qadarekî re êdî Şêx Birehîm mafê axiftinê hilda bû û axiftibû.Wî ji hinekî li ser jiyana Nebîyan anîbûser ziman.Ew ji li ser Jiyana Nebî Nuh pir bi zanebû.Wî ji di axiftina xwe de pir li ser wî û jiyana wî û hizre wî rawastaha bû. Ew anîbû ser ziman.Pêre ji li ser Birehîm Xelîl û hizre wî û jiyana wî ji hinekî sekinî bû.Lê zêdetir li ser Nebî Nuh sekinî bû.

De ne, divêt ku mirov bêje, ku şêx Birehîm di jiyana xwe ye ku buhurndî de demekê çûbû bû Cizîre bota û li wir mabû bû.Lê ew zûve bû. Di deme ciwaniye wî de bû. Piştre ku ew li ser serê dergahê rûnişt ji çend çaran bi gelek mirovên ku li dore wî bûbûna kom çûbû bû.Bi vê yekê, mirov karê bêje ku wî Cizîre bota û zanistên têde yên navdar naskiribû.Ji xwe yekî ku navê seyde Mazin meleyê Cizirî û mîr Huseyinê ku berê wê demê bi çendekê jîn bûbû ne bihîstibû ji nebû.Ew mirovne navdar bûn. Ji xwe deme ku mirov bahsa mîrê bota bike, divêt ku mirov bixweze bêje ku ew navdar bû.Yê ku ew nas nedikir ji nebû. Navê mîrê bota hertimî herkesekî zanibû.Mîrê bota weke mîrê kurdistanê hemûkî navdar bû.Her weha navê wî hebû. Yê ku li mîrê bota nas nekiriban nebû. Bi vê yekê, ji bo wî dihata gotin ”mîrê mîran”. Ew bi rast ji bi nav û dengitiyê xwe mîrê mîran bû. Wilo navdar bû. Her mîr li Cizîre bota, ku li qasrê rûnişt, êdî navê wî derdiket.Dihata naskirin. Qasrê mîrê bota ji weke wî bi nav û deng bû.Nav û dengitiyê wê ji hebû.Deme ku çîrok ji dihatina vegotin, di wan çîrokan de mîrê bota, qasre mîrê bota û birca belek  gotinên sereke bûn.Şêx Birehîm çûbû bû cizîre bota û ew hewaya wê ya xweş bizane kişandibû kezebên xwe di wê heyeme de.Ji ber vê yekê, deme ku di wê heyeme de Mihamed axiftibû û bahsa Cizîre bota kiribû li ser Nebî Nuh û jiyana wî kiribû, ew yek ji wan mirovê ku herî baş wî ew fahm kiribû bû.Nebî Nuh li Cizîrê jiyana xwe jîn kiribû. Piştre ku gehabû rehmata xwe ji, li wir hatibû bicihkirin.Lê tirba wî biqasî qama du mirovan dirêj hatibû çêkirin.Li ser wê dirêjbûna tirba wî ji pir axiftin û vegotin dihatina vegotin. Dihata vegotin ku ew biqasî ku tirba wî dirêj bû ew ji dirêj bû.Lê di hinek vegotinan ji dihata vegotin ku ew nebî bû û xwûde dîtibû, ji ber vê yekê ji,

divîbû ku Tirba wî wilo mazin hatibana çêkirin.Wî dît ji baweriyaka dî ji di nav kurdan de hebû û ew baweri ji her weha dihata vegotin. Dihata vegotin ku mirov ku mir, ku kî ji bê, tirba wî piştî mirina wî re jê re dibe mal.Ji ber vê yekê ji tirba wî deme ku ew mir, ku çendî mazin û dirêj bihatana çêkirin, wê cihê wî yê wê dinyeye din ji mazin kiribana.Mirovên alim û Nebî tirbên wan mazin di hatina çêkirin.Li ser vê yekê ji pir hadîs û bawerîyên ku bi vegotin dihatina gotin hebûn. Tirba Nebî Nuh ji mazin bû.Ji ber ku ew nebî bû.Li ser vê yekê di nav kurdan de pir bawerî û vegotinên pîroz hebûn. Ew vegotin ji weke çîrokan ji bihatan vegotin, ji wan re rêzeke mazin dihata nîşandin.Şêx Birehîm ji deme ku bidest axiftina xwe kiribû, hinekî wî ji li ser Nebî Nuh û jiyana wî û hizre wî ji sekinî bû. Deme ku dianî ser ziman ji, her weha wî weha dianî ser ziman. Wî pir xweş zanibû bêne ser ziman. Zanibû ku wê çawa lev bêne û bêne ser ziman. Deme ku wî kir ku axiftina xwe bêne ser ziman, di dawiye axiftina xwe demeke dirêj ew li ser Birehîm xelîl ji sekinî bû.Mihamed deme ku axiftibû gotibû ku Birehîm Xelîl ji xwûna Nebî Nuh e. Wî ji ew anîbû ser ziman û piştre hinekî ser jiyana wan sekinî bû. Bi wan li ser jiyana Nebî Salih ji sekinî bû. Pir li ser wî ji anî bû ser ziman.Lê deme ku Şêx Birehîm deme ku axift, wî di axixftina xwe got ku ”ji ber ku Birehîm xelîl ji xwûna Nebî Nuh bû, piştî ku ew çû ser dilovaniya xwe, tirba wî ji weke ye wî mazin hata çê kirin û li cihekî ku Nêzîkî ye wî hata çêkirin. Di nav qawmê xwe de hata bicihkirin”. De ne, Birehîm Xelîl ji li pey xwe hizreke mazin hiştibû. Piştî wî re li ser wî i pir hatibû nivîsandin. Gelek pirtûkên ku di pertûkxane Cizîre bota de bûn û tenê jiyan û hizre wî dianîn ser ziman hebûn. Deme ku Şêx Birehim çûbû bû wir û li wir mabû bû, wî pir jiwan pirtûkan xwandibû. Mihamed ji her weha pir xwandibû. Mihamed demeke dirêj li Cizîre bota mabûbû û li wir li ser jiyana wî û ya Nebîyên din çend pirtûk hebûn wî xwandibûn.

Pirtûkxane Czirîre bota pir mazin bû û tişî pirtûk bû. Gelek pirtûk têde hebûn. Pirtûkên gelek alim û zanistên demê û berî deme têde hebûn.Li Cizîre bota ji hertimî pir zanist hebûn. Lê digehana hevdû. Bi vê yekê, Cizîre bota, bi xwe, hertimî weke dibistanaka mazin bû.

Şêx birehim weke qadarekê her weha didiaxivê û tê ser ziman. Ji Cizîre bota ji têne ser ziman. Weke ku Mihamed aîn ser ziman, wî ji anî ser ziman. Wî ji wilo dirêj axiftinak kir di wê heyeme de.Piştî ku wî her weha axiftinaka mazina kir. Êdî piştre wî axiftina xwe bidawi kir û ma sekinî di wê heyeme de. Ku ew ma sekinî, êdî bêdengbûnak di wê heyeme de di nav wan de bû. Deng ji ti kesekî derneket. Herkesek bi bêdeng ma di

cihê xwe de di wê heyeme de.Mîr ji di rex wan de bû û li wan dimeyîzend. Piştî ku şêx Birehîm axiftina xwe bidawi kir, weke ku çend bal bi hey çûna ser Mihamed. Lê Mihamed bideng bû.Ew di cihê xwe de sekinî bû. Mîr ji bala xwe bire ser Mihamed.Wî ji avirek da Mihamed.Lê ew bêdeng bû. Deng ji wî dernediket. Piştre ne bi gelekî re ku mîr dît ku Mihamed ji û şêx Birehîm ji bi bêdeng in, êdî wî mafê axiftinê hilde û wî kir ku çend gotinan bêje.Wî her weha mafê axiftinê hilda û axift. Deme ku wî xwe ji bo axiftinê xwe di cihê xwe de xwe amede kir, êdî bal çûna ser wî di wê heyeme de. Mîr ji mafê axiftinê hilda û axift û wî ji li ser Cizîre bota axift.Ew bixwe ji çûbû bû Cizîre bota.Mîrê bota ew di deme mîrîtiye wî de ew dewetî qasre xwe kiribû bimêhvandarî. Ew bi mêhvandarî çûbû bû wîr. Ji ber vê yekê ji, ew di derbarê wir de bi zanebûn bû. Mîr Ahmed, bixwe, di deme ciwaniyê xwe de ji çûbû bû Cizîre bota. Bavê wî ew şandibû wir ku wir ji û û mîrê bota ji bibîne û li wir hinekî bixwêne û bizanebûn ji bibe.Bi vê yekê, ew çûbû bû wir û li wir demeke dirêj mabû bû.Deme ku ew çûbû bû Cizire bota, hingî, wî dîtibû ku mîrê bota çend mazin û bitifre ya. Wî mazinbûna wî dîtibû û naskiribû. Herkesekî dixwest ku mîrê bota carekê di jiyana xwe de bibîne û nas bike. Ev yeke weke nirxekê bû.

Mîr Ahmed, deme ku ew axift, wî axiftina xwe hinekî li ser Cizîre bota Dirêj kir. Li ser Cizîre bota û wê deme ku ew li wir mabû, di axiftina xwe de li ser rawastaha. Wî ew anî ser ziman. Deme ku ew diaxift dengji ti kesekî dernediket.Herkesekî bi hey bala xwe dabû bû wî û li wî dihisand.Mihamed ji lê dihisand. Mihamed deme ku lê dihisand ji, di serê xwe de weke ku ketibû hin hizirne de. Wilo ew dihata xuyakirin û berçavan.Mihamed li Cizîre bota demeke dirêj mabû bû. Wî li Cizire bota pir Tişt jîn kiribûn. Deme ku Mîr Ahmed bahsa Cizîre bota û mîrê bota dikir diaxiftina xwe de, ew demên ku wî li wir jîn kiribûn dihatina bîre wî di wê heyeme de. Ew deme ku mîrê bota jê Xazîne xwestibû hatibû bîre wî. Di wê demê de wî çi jîn kiribû, ew hemû li ber çavên wî bû. Di wê heyeme de bi vegotina mîr Ahmed re hê bêhtir hatibû ber çavên wî di wê kêlîkê de.

Mihamed ew dem pir mazin jîn kiribû.Di wê demê de deme ku mîrê bota xazîne jê xwestibû piştre bi demekê re ku wî ji bi lêgerînê xazîne dîtibû, êdî navê wî ji bi wê derketibû. Ji gihîne xazînê ji mîrê bota re zêdetir dîtina Mihamed ye xazîna dihata ser ziman.Ew weke nîşanayaka ku ew alimak bû dihata ser ziman. Ku ew ne alima bana, ma wê karibana ku wê xazîna ku bisalan mîr bi gelek mirovan lê digerahan bidîtina?Her weha dihata ser ziman. Mihamed, di wê heyeme de ku mîr Ahmed axift û bahsa Cizîre bota

û mîrê bota kir, ev dem û rewşên ku wî jîn kiribûn bi careke re hatibûbûna ber çavên wî û ew li ser wan ketibû bû hizran de.Ew di serê xwe de di nav hizran de bû. Mîr Ahmed weke qadarekê diaxivê ji dore xwe re. Mihamed ji di wê demê de di serê xwe de di hizir de bû. Weke ku ew ne li wir bû di serê xwe de di wê heyeme de.Piştre bi qadarekê re ku mîr Ahmed axiftina xwe bidawi kir û ma sekinî ji, Mihamed di serê xwe de bihizir bû bi wan rewş û deman.

Mihamed li ser demên xwe yên berê dihizrî.Ew bi bîr dianîn.Axiftina Mîr Ahmed, di serê wî de pir tişt bi bîr xistibûn.Mihamed di serê xwe de di nav wan bi bîr xistinan de bû.Li wan û li ser wan dihizirî.Piştre ku Mîr Ahmed axiftina xwe bidawi kir û ma sekinî ji Mihamed di serê xwe de ew hizirkirina xwe re berdewam kiribû.Ew hê ji di hizirî. Ew pir kur dihizirî.Her gotina ku dihata ser ziman, ji wate xwe zêdetir cerna hin wateyên din ji bi bîr dike. Di wê heyeme de ji wilo bûbû. Mihamed berî wî li Mirovên li dore wî bû û di hizir de bû.Şêx Birehîm berê wî li wîr bû û bala wî ji li ser wî bû.Lê di wê heyeme de ti gotin ji devê derneketibûn.Mîr Ahmed ji piştî ku wî axiftina xwe bidawî kir, êdî ma sekinî. Piştre êdî ti deng jê derneket.Ew ji bala wî li ser dore wî bû.Lê car bi car ji, weke mirovên li dore wî, bala wî bi hey diçû ser Mihamed.Di wê heyeme de ji bala wî çûbû bû ser Mihamed.Deme ku bala wî çûbû bû ser Mihamed, hingî wî dîtibû ku wa Mihamed pir dihizirekê de ye. Wilo ew dihata ber çavan.Wilo ew dihata dîtin.

Mihamed ji weke ku heya wî ji dore wî nebe lê hatibû. Ew weke ku di serê xwe de di wê heyeme de ji wir çûbû bû.Wilo dihata berçavan.Deme ku mirov lê dimeyîzend, mirov ev yek pêre pir baş û qanc kifş dikir.Mihamed dihizir de bû.Lê li ser çi di hizir de bû?Mirovên li dore wî ji li ser vê yekê ne bizanebûn bûn. Heya wan ji ya serê wî ne bû.Ew di ye di serê xwe de jîn dibû.Ew têde bû.Mirovên li dore wî, ku lê dimeyîzendin, fahm dikirin ku ew dihizir de ye di serê ser xwe de. Ji ber wê heyeme de ji bala wan li ser wî bû.Lê yekî ji ne dixwest ku di wê heyeme de ti tiştekî bêne ser ziman û bêje.Herkesekî ev yek çêtir didît. Herkesekî çêtir didît ku bêdeng bibêne û li wî meyîzenê. Mihamed ji weke ku ne di wê farqê de bû di hizir de bû.Wilo rewşek, piştî axiftina mîr re afirî bû.Mihamed di serê xwe de li Cizîre bota.Di wê dema ku ew li wir bû û tiştên ku wî li wir jîn kiribûn li ber çavên wî bû.Bi w re ji gelek tişt û rewşên din ji hatibûbûna bîre wî di wê heyeme de.Ew li ser wan di hizirî.Wî di axiftina xwe li ser jiyan û hebûna hinek enbiyayan ji axiftibû û anîbû ser ziman. Ew di serê

wî de bû.Li ser wan ji di serê xwe de wî hizir dikir.Ew ji wî di serê xwe de di bir û dianî.

Mihamed her weha di wê rewşê de weke qadarekê dimeêne.Piştre bi qadarekê re weke ku were xwe lê tê û piştre li bala xwe dide ser dore xwe û deme ku bala xwe dide ser dore ji, êdî dibîne ku wa bala herkesekî wa li ser wî ya.Herkesek li wî dimeyîzenê.Mihamed deme ku wilo farq kir, êdî wî xwe di cihê xwe de xwe adiland û kir ku biaxivê.Divîbû ku wî piştî wî hizirkirina xwe re hinekî axiftibana. Hinekî anîbana ser ziman. Ya di serê xwe de ji anîbana ser ziman.Ji xwe balên li ser wî ji weke ku ev yek jê dixwestin. Mihamed ji ji wan balên li ser wî ev yek fahm dikir.Wî xalat ji fahm ne dikir. Wî rast fahm dikir.Piştî ku wî xwe di cihê xwe de xwe adiland, êdî piştre wî li ber mirovên li dore xwe û mîr û şêx Birehîm bidest axiftinê kir.Deme ku wî bidest axiftinê kir, hinekî li ser demên xwe yên berê yên ku buhurandibûn axift.Piştre hinekî li ser demên xwe yên li Cizîre bota axift.Deme ku li ser demên xwe yên li Cizîre bota axift, hinekî dî ji, wê carê ji, di axiftina xwe de bahsa Nebî Nuh kir.Lê wê carê, bi pirranî li ser faqa Qasim rawastaha. Bahsa wî û zanebûna wî kir.Bahsa wan demên ku wan bi hev re buhurandibûn kir.Demeke dirêj her weha axift ji dore xwe re.Piştre Mihamed axiftina xwe, ji dêla ku bêne ser demên piştre û axiftina xwe berdewam bike, di axiftina xwe de gotin bire ser demên berê û bahsa rewşe Dilberê û Dilşad û wan kir.Li ser wan ji demeke dirêj axift. Deme ku wî bahsa wan kir, di axiftina xwe de, jê dihata fahm kirin ku ew hinekê bihest bû.Jê ev yek pir baş dihata fahm kirin. Deme ku bahsa Dilberê û Dilşad kir, weke ku qasîdeyekê bixwêne xweşik û ji dil axift.Ev yek bixwe ji, bû sedeme ku bal hê bêhtir herine ser Mihamed di wê heyeme de.Mihamed, deme axiftina xwe ye ku bahsa wan dikir, pir bi hest bû.Mirovên li dore wî ji ev yek fahm kirin. Mîr ji û şêx Birehîm ji ev yek di wê heyeme de pêre kifş kir. Wan bala xwe pir bi hey bire ser Mihamed. Mihamed, rewşe Dilberê û Dilşad ji serê haya binî wî çawa zanibû û jîn kiribû ji wan re anî ser ziman.Pir xweşik anî ser ziman. Pir bi dil zîz anî anî ser ziman.Pir bi hest anî ser ziman. Ji xwe Mihamed mirovekî zîz bû.Wê gotina wî ye ku wî bixwe ji digot, weke bandûrak li wî bxwe ji dikir.Wilo dihata berçavan.

Mihamed weke qadarekê axift û piştre wî axiftina xwe bidawi kir.Hingî wilo ew xweş axifti bû, mirovên li dore wî, di deme axiftina wî de weke ku nizanibû ku dem çawa buhurtiya. Mihamed weke qadarekê axitibû.Lê Mihamed ji nizanibû ku çiqas demê axifti ya. Wî ji xwe di axiftinê de ji bîr kiribû.Wî ji nizanibû ku ew çendî dirêj axiftiya.Lê ew demeke dirêj axifti

bû.Ew demeke ku pir dirêj axiftibû.Deme ku ew ma sekinî, pişt wî re yê ku mafê axiftinê girt û axift ji şêx Birehîm bixwe bû.Wî ji deme ku axift, weke demekê pir xweşik axift.Ew ji li ser demên berê hinekî axift.Wî ji di axiftina xwe de gotin anî ser Cizîre bota û wê deme ku ew lê mabû de.Wî ji hinekî dirêj li ser wê yekê axift.Lê şêx Birehîm wilo zêde ne axift.Ew kin axift. Wî axiftina xwe kin birrî.

Piştî ku şêx Birehîm ji mafê axiftinê hilda û hinekî her weha axift, piştre êdî ne bi gelekî re wî ji axiftina xwe bidawi kir û ma sekinî di cihê xwe de di wê heyeme de.Ku ew ma sekinî, êdî pişt wî re yên ku mafê axiftinê hildan û axiftin derketin. Hinek mirovên ku zanebûn û navserî xwe bûn û pir pîr bûn, mafê axiftinê hildan û axiftin.Wan ji li gor zanebûna xwe hinekî axiftin kir.Li her yê ku axiftin kir ji, wilo zêde dirêj ne axift. Kin axift.Weke qadarekê her weha mirovên li dore wan axift. Piştre ku qadarekê têve çû, êdî mîr bi xwe ji mafê axiftinê hilda û axift û deme ku ew axift ji, wî li ser hinek zanebûnên ku hatibûbûna wir û li civata wan rûniştibûn û li wan bûbû bûna mêhvan, li ser wan axift.Weke qadarekê wî li ser wan axiftina xwe kir. Piştre mîr axiftina anî ser kalkê xwe mîr Şerefedin. Mîr Şerefedin, mirovekî ku pir bizanebû. Ew bixwe, di deme xwe de wî navê xwe da dore xwe û xwe pir baş û qanc da naskirin. Yên ku ew naskirin ji ew pir baş û qanc naskirin. Rêzeke mazin jê re digirtin. Deme wî, demeke aramiyê bû. Her çend ku êrîşên hovana yên ku komên ku ji derve dihatin ji dibûn ji, lê dise wî bi pergala awlakariyê ye ku avakiribû, parastinaka baş li herêmê dikir. Herêmê bi vê yekê, hinekî gehabû aramiyê.Lê li herêmên hewirdorê ji êrîşên Selçûkiyan û Mogolan hê ji berdewam dikirin. Her dere ku têve diçûn dikirina gole xwûnê.Bi vê yekê, di wê heyeme de li gelek herêman bêaramî afirî bû.Jiyanê xalkê ketibû rewşeke pir xirab de.Lê her herêm ji, divêt ku mirov bêje ku hêzên wê yên bixwe yên ewlakariyê hebûn. Hêzne pir xurt ji bûn. Her mîr, bi berpirsiyar bû ku li herême xwe hêze xwe ye awlakariyê ava bike.Ava dikirin ji.Mîr Ahmed ji hêzeke wî ye pir xurt bû.Mîrê bota ji piştgirtî dida wî di wê heyeme de. Gelek mîrên din ji mîrê bota piştgirî dida wan.Mîrê bota mazin bû.Navê wî bixwe bes bû ji bo ku çavên dijminên wî û yên ku bixwezin ku êrîşî herêman bikin bê tirsandin. Ew pir mazin bû.Hêzeke wî ye pir mazin hebû û heya wê herêmê de di ti şerî de winda ne kiribû.Herkesekî ji ev yek zanibû. Gelek êrşî bûbûn li herêmên wan.Lê he di serî de ew êrîşkarên ku wê êrîş kriban hatibûn kifşkirin û çûbû bûn ser wan û ew bi şûn xistibûn.

Mîr Ahmed deme ku bahsa kalkê xwe kir, pir dirêj bahsa kirinên wî kir. Wî gelekî kiribû. Kirinên wî di devê dengbêjan de bû û di civatan

digotin. Wan dengbêjab bidengên xwe ew dianîn ser ziman.Di wê heyeme de gelek dengbêjên ku dengê wan xweş bû ji, li wir li wan rûniştibûn. Wan ji gelek caran di civatan de anî bû ser ziman.Deme ku mîr anî ser ziman, herkesekî bi hey bala xwe dayê de û lê hisand. Wî pir dirêj bahsa kalkê xwe kir. Ku weke qadarekê wilo ew axift, piştre wî axiftina xwe bidawi kir. Lê berî ku bidawi bike ji, hin gotin li ser bavê xwe ji kirin.Li ser kirinên wî kirin.Piştre wî axiftina xwe bidawi kir. Piştî ku wî axiftina xwe bidawi kir, êdî weke ku hinekî bêdengî çêbû.Weke ku deme rabûnê ji dihat.Êdî divîyabû ku ew rabûban ser xwe û û hinekî li ser xwe li derve gerahaban.Mîr ji û yên ku li dore wî rûniştî bûn ji, ev yek hîs dikirin.Piştî ku mîr axiftina xwe bidawi kir, êdî hinekî axiftin piştî wî re bû.Lê wilo zêde ti axiftin piştî wî re ne bû.Êdî hin bi hin bêdengî serwerî wan dibû. Mihamed ji di cihê xwe de bi bêdeng bû. Wî li dore xwe dimeyîzend. Li yên ku diaxiftin û hin gotin digotin dihisand. Şêx Birehîm ji weke wî li dore xwe dihisand.Piştre ku demek her weha bi axiftinê buhurt, êdî piştre mîr bixwe bahsa rabûnê kir.Wî rabûn bi bîr xist.Deme ku wî rabûn bi bîr xist, êdî hin bi hin mirovên li dore wî ji karê rabûn kirin.Xwe li hevdû dana hevdû û kirin ku rabina ser xwe di wê heyeme de.Mihamed ji xwe di cihê xwe de labitand.Wî ji weke ku xwe di cihê xwe de ji bo rabûnê karkê xwe di cihê xwe de xwe labitand.

Civata wan ye li hevdû rûniştî weke bêhneke din ji ber dewam kir.Piştî ku mîr bahsa rabûnê kiribû, êdî hin bi hin mirovên li dore wî ji xwe ji rabûnê re amede dikirin.Piştre ne bi gelekî re ji xwe êdî kirin ku rabin.Lê berî k rabin, hinkî dî ji li hevdû rûniştî man.Bi hev re axiftin û bi hev re danûstandin.Mîr ji, piştî ku gotibû ku êdî deka emê rabin û herin û hinekî li ser xwe bigerihin, êdî herkesekî xwe lê dabûbû hevdû.Lê herkesek di cihê xwe de bû.Herkesek li bendî mîr, Mihamed û şêx Birehim bûn.Wan kengî daban xwe û rabû ban ser xwe, êdî ew ji wê rabû ban. Her weha li bendî wan bûn.Ew mirovên mazin bûn.Bê wan gav avêtin wê rast ne ne bû bana.Ji xwe bê wan wê gav ne hatibana avêtin.Kengî wan da xwe û rabûna xwe, êdî ew ji wê bi wan re dabû ban xwe û rabûban ser xwe di wê heyeme de.Bal ji ber vê yekê, piştî ku bahsa rabûnê hatibû kirin, êdî çûbûbû ser wan.Bal çûbû bûn ser Mihamed, Mîr û şêx Birehim. Wan Piştre bi qadarekê re êdî yê ku careke dî rabûn bi bîr xist şêx Birehîm bû û piştre rabûna ser xwe di wê heyeme de.

Deme ku rabûna xwe, derketina derve. Li derve ji hewayaka pir xweş û xweşik hebû.Dem hatibû ber êvarî. Êdî hinekî dîn ji ku dem têve çûbana wê bûban êvar. Wê reş ketibana ardê de û êdî wî mirovan ji xwe kiriban

hundur de.Deme ku ew derketin êdî derketina hewşa mizgeftê û hinekî li ser lingên xwe li hewşê li ber hevdû man.Lê wê rewşê wio zêde berdewam ne kir. Piştre di cih de êdî ji hewşe mizgeftê derketina derve û li derve kirin ku hinekî bi hev re li ser bigerihin.Mihamed û şêx Birehim di rex hevdû de bûn. Mîr ji di rex wan de bû.Mihamed di nav wan de yê herê pîr dihata xuyakirin. Zêde wilo nekaribû ku li ser xwe bigerihê.Ew hêdî hêdî dimeşî.Wê yekê bala mirov dikişand.Deme ku mirov lê dimeyîzend, wê yekê pir bala mirov dikişand.Ku derketina derve, li derve hinekî bi ber aliyê çolê ve çûn.Ji xwe deme ku mirov ji kijan alî ve li hevirdorê dimeyîzend, mirov di dît ku weke ku tilman û kaş bûn.Wilo dihatina xuyakirin. Herder ji bidar bû.Herder şîn bû.Pir şîn bû. Deme ku mirov li hevdirdorê dimeyîzend, ji wê şînatiy bêhne mirov xweş dibû.Di miha havînê ye herî germde ji bana, ku mirov li wir jîn diba, mirov ji tavikê an ji ji tiştekî dî yê weha aciz ne dibû.Ji ber ku pir hevirdor şîn bû û xweş bû. Di wê heyeme de dem ber êvarî bû. Hin bi hin deme hatina sawalan ji çolê bû.Hê roj li azmana bû û hê germ bû.Lê têhne wê ji ne weke ye nava rojê an ji demên din bû.Têhne wê şikestibû.Ne wilo zêde germ bû.Roj dihata xwere ku herê ava.Hinekî dî de dem têve çûbana wê roj çûbana ava. Lê ji ber ku hevirdorê wir zêde kaş û tilman bûn, roj zûtir ji herêmên din li wir windadibû ji ber çavan.Reşiyê zûtir xwe dide der.Lê deme ku roj winda dibû ji weke demkê ne dibû reş wilo dem dima û ew dem ji pir xweş bû.

Di bin wê hewaya wê de li ser gerahandin ji dilê mirov xweş dikêt.Bêhne mirov derdixe.Ew deme ku ew ji hundur derketibûn ji, wilo zêde hê roj ji ne çûbû bû berava.Hê hinekî li azmana bû.Ew ji deme ku derketina derve, êdî dîtin ku wa pir mirov wê bi jin û mêran ve li xwe ne û diçin û tên.Wan ji kar û barê xwe yê wê demê dikir.Kar û barê wê demê hinekî zêde hebû. Dem ku dihata asrê, êdî kar û bar destê pê dikir. Jinan di wê demê de, berî hingî hevîrên xwe yên ku hevîrtibûn û ji meyandinê re hiştibûn, êdî dihildan û di birina ber tanûran û dikirin ku nanê xwe bi pahtin. Deme ku jin diçûna ber tanûran, êdî li ber tanûran li hevdû digehana hevdû û alî hevdû dikirin û bihev re diaxiftin. Axlabe ji di wê demê de gelek jin li ber tanûran li hevdû digehana hevdû. Yên ku lê digehana hevdû yên ku karê wan hebûn.Yên pîr ji ku zêde wilo nikarîbûn karekî bikin ji dihatina ber tanûran û li cem wan di sekinîn û bi wan re diaxiftin. Car bi car ku ji wan hatibana ji alikarî ji didana wan. Her weha rewşek di wê demê de hebû.Lê ew dem, bixwe, demeke ku pir bi çûnûhatin bû.Keçik gelek ji wan li cem diya xwe bûn.Gelek ji wan ji, ku di malê de pitik hebin, ew ji bi wan ve eleqeder dibûn.Di rahiştina wan û ew digerandin. Ne dihiştin ku ew

bigirîn.Ew ji bi vê yekê dibûna alikar. Keçikên ku hinekî mazin ji bûn, ew ji weke dayika xwe bi kar û bar dibazîn. Wan ji weke wan kare mazin dikir. Mêr ji axlabe li malê bi amedekirina êmê sawalan ve meşkul dibûn.Ew ji her weha li malê di wê demê de bi kar bûn.Piştî ku wa karê êm amedekirinê bidawi kirin, êdî deme ku wê sawal were ew zanin û wê herine pêşiye sawalan û wê alî şîvanan bikin û bi wan re sawal bênine malê.Ku sawal hata malê ji karê wan bidawi ne dibû. Karê wan wê hê ji biberdewam kiribana.Wê di nav sawalan de çûban û hatiban, haya ku sawal êmê xwe xwar.Ji xwe piştre ne bi gelekî re jinan ji karê çêkirina nan bidawi dikir li ber tanûran û dihatina malê.Deme ku dihatine malê ji, êdî karekî dî li ber wan li pêşiye wan bû. Karê Dohtina Sawalan li pêşiye wan bû.Divîyabû ku wan sawal ji bidohtina.

Deme ku jinan çêkirina nan bidawi kir, êdî wê hatiban malê û wê nanê xwe dênine malê û wê rajina stilên xwe û çina nav sawalan. Deme ku ew diçûna nav sawalan ji, hê mêr li nav sawalan bûn bi şivanan re.Deme ku ew çûn, êdî wê mêr û şivan bi hev re wê alî wan kiriban. Wê yek bi serê sawalan ji jinan re girtiban û jinan ji wê sawal dohtiban.Ku jinan bi wan re her weha sawal dohtin, êdî karê jinan li derve bidawi dibû.Lê karê mêran hinekî dî ji dima. Wê sawal hinekî dî ji li derve mabana û wê piştî dohtinê wê barxik, kahrik û golikên ku sawalên mazin û biçûk wê berdaban ber wan û wê wan hinekî maka xwe mêhtiban. Piştre ku weke bêhneke wan maka xwe mêht, êdî ew ew jev hatiban vaqatandin û piştre wê sawal kiriban kox û govan de û piştre wê ew çûban hundur û wê li hevdû rûniştiban û wê bi hev re xwarina xwe ye şîvê bi hev re xwariban..

Piştî ku Mihamed, mîr û şêx Birehîm û mirovên li dore wan yên bi wan re ku bi hev re derketibûn, êdî hinekî li ser xwe gerahabûn.Hinekî dûr ji çûbû bûn û li ser xwe gerahabûn. Wan ew çûn û hatina mirovan di dît. Di riya xwe de hem diçûn û hem ji li wan çûn û hatina dimeyîzendin.Li wê çûn û hatina asayî dimeyîzend.Herkesek weke ku heya wê ji dinyê nebe di rewşe xwe de bi kar û barê xwe ve diçû û dihat.Dengê gelek mirovan dihat ku ji dûr di bakirina hevdû.Dengê wan dihat ku ji dûr ve ji hevdû re tiştin digotin.Dengê zarokan ji dihat. Ew ji di wê heyeme de li derve bû û axlabe ji bi hev re dileyîstin.Dengê wan ji dihat ku wan ji deng dide hevdû weke mazinên xwe di wê heyeme de.Gelek deng di wê heyeme de her weha di nav hevdû dihatin.Hemû deng ji bi hev re weke ahêngekê bûn. Weke xosletekî jiyana wan mirovan bû ew dengên ku dihatin û di nav hevdû de bûn.

Jiyana di wê demê de her weha pir xweş û xweşika.Hertişt di rewşe xwe de ye.Hertişt û dengên ku dihatin weke ku di ahengekê de hevdû temem dikirin.Deme ku mirov li wê rewşê û demê û jiyana wê demê her weha dihizirî, mirov pir kêfxweş dibû.Her dengê ku dihat û her tiştên ku dihatina dîtin hevdû temem dikirin.Weke ku yek ji wan nebana wê ye dî ji kêm bana dihata berçavan.Her weha hemû tişt di rewşekê de di ahengekê de bû.Ew aheng ji ahenge jiyanê bixwe bû.Ahenge jiyanê ye xweza ku mirov û jiyane wê bi hev re dihata berçavan bû. Ahenge jiyane di jiyankiirnê de bi mirov û jiyane wî re tê berçavan.Ji bo mirov û jiyane wê wilo ye.Lê ne tenê ji bo mirov û jiyane wê ev yek heya.Ji bo jiyanê û hertiştê ku jiyan dibe ev yek wilo ya.Aqil di vir de tenê bitêgihiştinê wê xweşikbûna jiyanê dike bîrê de.Bîr û bîrewerî di vir de heya û jiyanê bi wate dike.Bîr û bîrewerî di vir de jiyanê bitêgihiştin dike.Dîtina biaqil aqilê bidîtin, di vir de hevdû di ahengekê de temem dikin.Mihamed, deme ku ew dimeşî bi mirovên li dore xwe re dihizir de bû.Dihizirî. Weke ku di serê wî de pir tişt hebin û ew li ser bihizirê bû.Ew di rewşeke wilo de dihata berçavan.Wî deme ku li wê çûn û hatinê di meyîzend, weke ku gelek tişt û mişt werine bîre wiî di wê heyeme de di hizir de bû.Ew her weha dihata berçavan.Mîr û şêx Birehîm û mirovên li dore wan bi hev re diaxiftinê de bû. Di axiftinê gih mîr diaxift û gih şêx Birehîm diaxift ji mirovên li dore xwe re.Mihamed weke ku dihisand di rewşe xwe de bû.Lê ew ne tenê dihisandinê de bû.Wî di serê xwe de hizir ji dikir. Wî di serê xwe de ew dîmênin li dore xwe ku didîtin li wan dimeyîzend û dihizirî.Weke ku ew di wê heyeme de di serê xwe de ne li wir bû.Wilo ew dihata berçavan.Ew ji her weha bi axiftinê weke qadarekê ji dûr çûbû bûn.Hinekî ji navende ji dûr ketibûn, bi li ser xwe geranadinê.Bi axiftin axiftin meşî bûn.Bi meşîbûnê ji weke qadarekê ji navendê dûr ketibûn. Roj ji çûbû bû ber ava, ku hinekî dî ji dem têve çûbana, êdî wê roj bitememî çûbana ava.Ew di meşa xwe de rastî gelek mirovên ku bi kar û barê xwe diçûn û dihatin hatibûn.Deme ku gehabûbûna dehma wan pêşî silav dabûbûna wan û piştre ji wan buhurtibû bûn.Her weha meşîbûn û çûbû bûn.Piştre ku hinekî dûr diçin êdî yek ji wan bi bîr dixe ku ew pir ji navende dûr hatina. Piştre êdî ew barê xwe didina bi navende ve û carekê din dikin ku werine malê.

Deme ku ew dikin ku vegerihine malê, hingî, dem li berê ye, ku herê ava. Hinekî dî ji dem bi ser ve çûbana, êdî wê roj bi tememî çûbana ava.Ew ji piştî ku rabûna ser xwe û derketine derve û li derve li ser xwe bidest gerandinê kirin pêde, êdî demeke dirêj bi ser ve buhurtibû.Ew demeke dirêj bû ku ew li derve bi hev re li ser ve digerahan. Bi hev re hem diaxiftin û

hem ji bi hev re li ser xwe digerahan. Her weha ew di rewşekê de bûn. Deme ku dem dibe dereng û hin bi hin roj tê xwere ku herê ava, êdî ew ji berê xwe didine bi malê ve û dikin ku werine malê.Deme ku ew derketibûn, hingî, dem ne wilqasî zêde dereng bû.Hê roj li azmana bû û mirov hê li derve li hevdû rûniştî bûn. De ne, berî ku bibe êvar di demên asran de axlabe mirov derdikevine derve û li derve li ser xwe dimênin. Di wê demê de bi zarokan re ti kesek di hundur de nemêne. Herkesek derdikeve derve û hêdî hêdî bidest kirina kar û barê xwe dikin.Lê belê di wê deme de bi pirranî ji, mirov hinekî li hevdû dirûnihin û bi hev re diaxivin. Ew dem ji bo li hevdû sekinandinê û bi hev re axiftinê pir xweş bû.Dem pir hînik û xweş bû. Bi vê yekê re êdî li hevdû diman û bi hev re didan û distandin.Di malê de dapîr û bapîrên pir pîr ji ku nikariban tiştekî bikin ji, ew ji ne diman di hundur de. Ew ji di wê demê der derdiketine devê derî û li ber derî ji xwe re dirûniştin û li çûn û hatina temaşa dikirin.Car bi car ji derdiketine ser banan ji. Derdiketine ser banan û li ser banan ji xwe re di rûniştin.Car bi car ji, deme ku derdiketine ser banan ji bo ku li hevdû rûnihin, gelek mirovên pîr li hevdû digehana hevdû bi hev re bidest axiftinê dikirin. Di wê heyeme de êdî wan ji xwe re di nav xwe de civatek hema bêja ava dikir.Li hevdû rûniştina wan ji pir xweş bû. Ew mirovên pir pîr bûn û pir dîtibûn. Deme ku bi hev re diketine axiftinê de ji, ji hev re ji demên xwe yên berê û ji hiskirinên xwe ji hev re bahs dikirin.Bi vê yekê, wan demeke pir xweş bi hev re dibuhurand. Deme ku bi hev re diketine axiftinê de ji, axlabe ji, wan xwe di nav axiftinê de ji bîr dikir. Ji hev re dianîn ser ziman û di anîn ser ziman. Hîç ne di sekinîn. Gelek ji wan ji deme ku dihatina cem hevdû, bi hxwe re nevîkên xwe yên biçûk bi xwe re dinaîn. Ew ji car bi car di nav wan de dibîna mijara axiftinan. Bi xweşik axiftina wan û henek kirina wan ye li hevdû re demeke xwe ye xweş di buhurandin.

Di wê deme ku ew li hevdû rûniştin ji, bi hev re li ser gelek mijaran diaxiftin. Di serê wan de pir hebû.Ew di nava salan de bi temenê xwe re çûbû bûn. Pir dîtibûn û zanîbûn.Deme ku diaxiftin ji, di nava axiftina xwe ne dimana sekinî ku ka wê çi bênine ser ziman ji hev re.Wan zanibû ku wê çi ji hev re bênine ser ziman.Ji ber ku ew bizanebûn.Wan dîtibû.Wan pir dîtibû. Ji aliyê zanebûnê ve yek ji wan ji ji yê dî ne kêmtir bû.

Di nava kurdan de weke kevneşopîyekê bû, ku pîr dibûn, piştî temenekî re êdî xwe didana xwandin û fahmkirinê. Ev yek weke kevneşopîyekê bû bi wan re.Kî ji wan pir bi zanebûn bû? Deme ku li civatên hevdû dirûniştin, ev yek di wê heyeme de derdikete hole.Di civatên hev de pir diketine

axiftinê de bihev re. Ji hev re çi zanebûnên wan heban ji hev re dianîn ser ziman. Civat ji wan re pir girîng bûn. Civat ji wan re cihne pir girîng bûn. Her kurd rêzeke wî ji civatan re hebû.Mirovên ku bi rêz û mazin bûn, di civatan de li cihê herî li berçav dirûniştin. Çavên herkesekî diçû ser wan û guhê herkesekî li gotinên ku wê ji devê wan derkevin bû.Ew mirovne ku hertimî li wan dihata hisandin bû. Di vir de deme ku me bahsa civatê kir, divêt ku em çend gotin xusisî li ser civatan bênine ser ziman.Ji ber ku ev yek pir giringê û divêt ku baş were têgihiştin û fahmkirin.Civat, di aslê xwe de cihne di civaka kurd de pir girîng in. Civat deme ku mirov bahsa wan dike, di çend beşan de mirov bahsa wan dike. ´Civatê Xalkê´ û ´civatên qasrê´. Her weha di serî de dibû du beş.Lê di hundurê xwe de dibe hê gelek beş. Lê deme ku em van herdû beşan fahm bikin û têbigihin, hingî, emê beşên din ji baş vacê wan têbigihê.Ev yek pir girînge. Civatên xalkê, civatê ku xalk di nava xwe de dike ne.Ev civat, hertimî û her demê li dar dikevin.Wekî dî ji dikevêt ku mirov bêje ku her mal karê bibe mala civata xalkê.Li her malê karîn bêne li dar xistin.Lê axlabe ji li mala ku hinekî bi nav û deng levgihîne hevdû dibe.Axlabe ji di nav xalkê de kî bi mala xwe mazina û ´malmazin´a, li mala wî civat li dar dikevin.Her êvar civatên xalkê li dar dikevin. Deme ku li dar dikevin ji, li mala ku wê civat lê li darkeve, li wir, wê malên din, gelek caran, bi jin û zaro û mêran ve têne wir û li wir li hevdû dirûnihin û bi hev re dikevine axiftinê. Axlabê ji kî bizane ye û kî dengê wî bi dengbêjiye wî xweşe ew li pêşe, hertimî.Wilo ji hevdû re diaxivin û dibêjin, êdî nizanin ku demên wan çawa dibuhurin.Wilo ji hevdû re xweş dikin, êdî nizanin ku demên wan çawa di buhurin.Wilo ji hevdû re tênin ser ziman, naye gotinan, hingî xweş û baş ji hev re tênin ser ziman.Kî çi zanebûna wî hebe di wê heyeme de bi gotin û vegotine xwe derdikeve pêş. Kî dengê wî xweş, ku jin ji bê û mêr ji bê, derdikeve pêş û ji dore xwe bi dengê xwe yê pir xweş ji wan re dibêje.Her weha rewşek diafirê û ev rewş bi pir bi asayî diafirê.

Ev civatên xalkê ne. Civatên xalkê ne tenê ji bo vê tenê ne. Civatên xalkê ji bo berberî û nexweşiyên di nava xwe de çareserkirinê ji hene. Xalk deme ku di nava du malbatan de an ji di nava du mirovan de pirgêrêkek hebe, hingî, li hevdû di civatê digihine hevdû û li hevdû dirûnihin û bi hev re li ser wê pirsgirêka ku heya, li ser bi hev re diaxivin û dikin ku jê re çareseriyekê di nav xwe bibînin.Ev yek ji di weke kevneşopîyekê pir kevn e.Civatên xalkê her weha cihên çareserkirina pirgirêkên di nava xalkê de ne ji.Lê cerna heya ku pirgirêkên ku hene di civate xalkê de digihine çaraseriyeka mayinda.Wê çaxê ji êdî li civate qasrê di deme ku lev gehana

hevdû de ew pirgirêk tê rojava wan û jê re çareserî tê dîtin. Civata qasrê civata mîr e. Civatê qasrê civateke ku pir girenbûhaya. Hêjatiyaka mazin ye wê heya. Di kesek ji wê wê û ji çareserkirinên wê re nebêje ne.Herkesek dibêje erê û bidil dibêje erê. Civatên xalkê de hertimî mirovên navserî xwe yên mazin û pîr li pêş in.Her weha di civatên qasrê ji wilo ne. Civatên xalkê himê civatên qasrê karin ava kirin. Her weha civatê qasrê ji karin hîmê civatên xalkê ava kin.Li civatên qasrê, hertimî mirovên zane yên ku pir mazin û ji deverên dûr û cûr bi cûr tên hene. Ji ber vê yekê, civatê qasrê hertimî bi nav û deng in. Hertimî navê wan heya. Hertimî bahsa wan tê kirin. Hertimî axiftin û qisakirinê ku di wan de hatina kirin di civatên xalkê de ji têne ser ziman.Bi vê yekê re hevdû temem dikin.

Deme ku mirov bahsa civatê qasrê bike, divêt ku mirov zanibe ku mirov çandekê ji dike. Mirov bahsa çadaka bi hezar salan û pir bi nirx û kevn dike.Çanda civatan çandaka civakî ya. Civatan, di civaka kurd de, hertimî ji hebûna xwe zêdetir weyneke mazin di nav civaka kurdan de leyistiya. Bi vê yekê ji, divêt ku mirov pir li ser hebûna civatan rawastihê û wan bêne ser ziman.D nava kurdan de, ku mirov bêje ku civatan hîmê hebûna civakatiyê mazin bi pêş xistiya di dîrokê de wê ne xalat bê.Ev yek pir rast e. Ji deme Naîrîyan ve civat di nava kurdan pir bi weyn in. Deme naîriyan demeke pêşketina civakatiyê bû.Ji ber vê yekê, mirov karê bêje ku naîriyan di pêşketine xwe de civat pir weke hîmekî mazin bikar anî. Wan civat di asta civakê de binirx û kevneşopî mazin bi pêş xist. Bi vê yekê re, naîriyan rêzeke mazin di dîrokê de maf kiriya.Di vir de divêt ku em wê ji bênine ser ziman, ji bo wan.

Piştî deme Naîriyan ji, ew kevneşopîyên ku bi wan re bi pêşketibûn hebûna xwe di civatan de berdewam kirin.Pişt wan re ji civat, di deme wan de çawa bi weyn bûn û pir bi qadr bûn, pişt wan re ji her weha wê yekê hebûna berdewam kir. Pişt wan re, gelek pêşketinên din ji derketine hole. Di hemû pêşketinên di nava kurdan de, di yên pişt wan re de civat xwedi weyn bûn.Civat pir girîng in. Di pêşketina çanda kurdan de civat xwediyê hebûneke mazin bûn. Civat, ku mirov rastiya wan bêne ser ziman, divêt ku mirov bêje ku weke saziyaka rêzanî ye civakê di nava xalkê de weyne leyist û her weha çandaka mazin di nava xalkê de afirand. Civatan, mirov karê weke hin saziyên civakî yên herîbilind ji bne ser ziman.Di hîmê pêşketinê civakê xwedî weyn in.Bi vê yekê, rasti û hebûna civatan çend were ser ziman ewçend ji di cihê xwe de ye.Civat, her weha pir girîng in.Her weha pir bi weyn in.Her weha pir xwedi cih in dii rêzaniyê kurdan de.Li Xizanê ji her êvar civat li qasrê li dar diket. Deme ku civat li dar

diket ji, her kesek, ji mirovên mazin û navserî xwe li wir lê digehana hevdû. Mirovên civatan, mirovne mazin û navserî bûn.Mirovên navserî xwe, hertimî yên ku li civatan di rûniştin û li wan dihata hisandin bûn.Bi vê yekê re ji wan ji dihata gotin”mirovên civata”.Mirovên civatan, mirovên ku hertimî li civatan dirûniştin û di civatan de bigotin bûn.Bi vê yekê, ev yên ku navê wan derketibûn. Ev yên ku dihatina naskirin bûn.Di wê heyeme de, li dore mîr Ahmed ji pir mirov hebûn. Mirovên ku li dore wî ji bûn, yên ku her weha navê wan hebûn. Di wê heyeme de ew ji di rê de bûn û diçûn qasrê, ku li qasrê civate xwe li darxin û lê rûnihin û ji xwe re bi hev re biaxivin, têde..

Ew di wê heyeme de bi hev re diaxiftin û diçûn. Bi hev re diaxiftin û dimeşîn û diçûn. Mihamed ji car bi car diaxift.Lê ne wilo zêde.Ew wilo zêde ne diaxift.Ew bizêdeyî bi bêdeng bû.Lê mîr Ahmed û şêx Birehîm pir bi gotin bûn.Ew pir diaxiftin.Ew diaxiftinê de germ bû bûn.Bi wan hinek mirovên din ji yên ku navserî xwe bûn, diaxiftin. Wan ji hizre xwe dianî ser ziman. Ew ji mirovne ku li wan û li gotina wan dihata hisandin bûn. Mirovne ku gotina wan pir hêja bû. Mirovan pir hêjatî dide gotina wan. Ji xwe, divêt ku mirov bêje ku ne mirovên hêja û zaneban wê di rex mîr de ne bigotin ban. Wê her weha qadr û qiymet ne standiban. Mirovên ku zanebûn û gotina wan di nav xalkê de pir mazin û bicih bû, di wê heyeme de biaxiftin bû. Ew ji deme ku diçûne nav xalkê û wan di nav xalkê de gotina dianî ser ziman, ti kesekî ji wan û ji gotina wan re ne digot ne. Her weha weke qadarekê mazin ji wan re hebû. Bi vê yekê, ew di wê heyeme de hebûn.Mihamed ji mirovekî ku mazin bû. Ew zanist bû.Lê Mihamed di wê heyeme de li herêmê ji aliyê malbatî ve ji dihata naskirin. Ji ber ku malbata wî malbataka ku malbata mîr bû. Her weha malbata wî ji mazin bû.Lê ew ne bi wê dihata ser ziman. Ew ne bi wê dihata naskirin. Ew bi xwe û zanebûna xwe dihata naskirin.

Mîr Ahmed bavê Mihamed naskiribû. Navê wî bihîstibû.Lê belê wî zêde ew ne dîtibû. Di deme ku biçûk bû de hingî wî ew carekê dîtibû.Lê wekî dî ji wî Ew ne dîtibû.Lê navê malbata Mihamed bihîstibû.Mihamed, li wê herêmê, malbata wî malbataka ku pir navdar bû.

Ew di wê heyeme de ji xwe re dimeşîn û dihatin ku werinê qasrê û li qasrê li hevdû li civata hevdû rûnihin.Mîr Ahmed diaxiftinê de bû.Şêx Birehîm ji her weha diaxiftinê de bû.Mihamed ji car bi car hin gotin digotin.Lê ew zêde ne diaxift. Bala şêx Birehîm ji pir li ser wî bû.Li wî dimeyîzend. Pir lê dimeyîzend.Mihamed, deme ku ew li hevdû rûniştî bûn, hê hingî, şêx Birehîm kifş kiribû ku ew weke ku hinekî nexweş e.Di wê

demê de bala wî çûbû ser wî. Piştre êdî ji wê demê ve, bala şêx Birehîm ji ser Mihamed neçû bûbû. Piştre hertimî li ser wî bû. Mihamed di wê heyemê de di rêze pêş de dimeşî. Wî çi kiribana ji li berçav dima. Bal li ser wî bûn. Ew alimakî mazin bû. Ji ber vê yekê bal pir li ser bûn.Wê heyeme de deme ku ew di axift ji, balaka mazin bi hey diçû ser wî û axiftina wî.Wî çi bigotina, bi hey lê dihata hisandin. Di wê hyeme de rêzeke mazin ji Mihamed re hebû.

Ku weke bêhneke din ji dimeşîn, êdî ne bi gelekî re digihine ber qasrê. Ro ji çûya ava.Êdî hin bi hin reş ji dikeve ardê de. Piştî ku ro çû ava, di cih de nabe reş. Hinek dem têve diçê, haya ku bibe reş di wê heyeme de.Ro çûbû ava û hin bi hin reş dikete ardê de. Ew ji hin bi hin bi ber qasrê ve diçûn. Li qasrê ji nahaka amedekariya wan dihata kirin. Di wê demê de li qasrê ji çûn û hatinaka mazin dibû.Ji ber ku qasrê hertimî mêhvan dibûn, êdî j wan re xwarin çêkirin û anîna ber wan û piştre ku wan xwe dayîn hevdûna sofre, çûn û hatinaka mazin diafirand. Nahaka ji ber wan ji ew çûn û hatin heya. Bi mîr Ahmed re gelek mirov hebûn. Lê mirovên ku hebûn, hemûk ne ji wir bûn. Gelek ji wan ji deverên dûr hatibûn û mêhvanên qasrê bûn.Ew ji di wê heyeme de li xwe digerahan. Ew ji bi mîr re bûn û li ser xwe digerahan.Ku gehabûbûna ber qasrê, êdî hinekî weke ku bêdengbûn di nava wan de afirî bû. Weke berê êdî wilo zêde axiftin di nava wan de ne dibû. Car bi car hin gotin dihatina gotin.Lê ji wê pêde wilo ti wilo zêde êdî axiftin zêde ne dibû.Mihamed dii wê heyeme de bi bêdeng bû.Ew ji di rex şêx Birehîm û mîr Ahmed de dimeşî. Lê di meşa xwe de weke ku hinekî wî zor ji dikişand. Ew êdî pîr bû. Nikarîbû ku wilo zêde herê. Di wê heyeme de, weke demeke dirêj ew li ser geraha bûn.Bi gerandinê re ji weke ku hinekî wastaha bûn. Bi Mihamed re bêhtir wastandinê xwe dide berçavan.Lê wî xwe li ser xwe digirt. Weke ku dixwest ku xwe li xwe bide nîşandin têvdigeraha.Lê ew pir wastahî bû.Piştre ku hinekî dî ji dimeşîn, êdî digihine ber devê deriyê qasrê û deme ku digihine ber devê derêyê qasrê ji êdî di cih de dikevine hundur de û êdî di buhurina hundurê qasrê û dikin ku herine dîwana rûniştinê ye ku wê bihev re lê rûnihin. Dîwana mîr ye rûniştinê ji pir mazin bû.Her cara ku lê dirûniştin, gelek mirovan bi hev re bi carekê re karibû ku lê rûnihin.Her weha mazin û xweşik. Deme ku ew ji hatina hundur, êdî li derve li hewşê ne sekinîn û bi hev re dicih de buhurtine hundur û çûna bi ber dîwanê ve.Deme ku çûn û gehana dîwana rûniştinê, êdî bi hev re ew lê rûniştin.

Deme ku rûniştin ji, herkesekî xwe di cihê xwe de berda. Kifşbû ku herkesek di wê heyeme de wastaha bû. Ji wê rewşe rûniştina wan ye di wê

heyeme de ev yek pir baş dihata têgihiştin. Deme ku rûniştin ji herkesekî li hevdû dimeyîzend û car bi car ji hin gotin ji ji hevdû re di gotin. Di wê heyeme de di deme rûniştinê de cerna çend deng bi hev re dihatin. Ku herkesek di cihê xwe de bicih bû, êdî ew di ber hev de axiftin bi carekê re qut bû.Êdî mîr ji li cihê xwe rûnişt û wî ji bidest axiftinê kiribû.Mihamed ne dûrî wî rûniştibû. Şêx Birehîm ji li nêzîkî mîr rûniştibû. Hersêk ji pir li berçav bûn.Mihamed, deme ku rûniştibû, hinekî zêdetir bêdeng mabû. Li dore xwe dimeyîzend. Li hevberê wî, ku bi hêt ve hatî dalaqandin xalîçeyek hebû û li ser xalîçê ji Şahmaran hebû. Ew bi ber çavên Mihamed ketibû. Deme ku bi ber çavên wî ketibû ji, weke ku wê nerîne wî ye li wir, hinek tiştne din anîbûbûna bîre wî di wê heyeme de bihizir dihata xuyakirin.Mihamed bala xwe dabû bû hevberê xwe û li hevberê xwe di meyîzend.Car bi car hin gotin ji dihatina kirin. Ew gotinên ku dihatina kirin ji, di wê heyeme de her ku li ser çi ew dihizirî, ew hizirkirina wî xira ne dikir.Ew pir bi hizir bû. Di serê xwe de pir bi hizir bû.di serê xwe de, ku li ser çi dihizirî, li ser pir kur dihizirî.

Wê rewşe wan weke qadarekê berdewam kir. Ew ji di wê heyeme de di nav xwe de di axiftin.Lê yên ku herî zêde diaxiftin ji mîr û şêx Birehîm bû. Bi wan re ji, car bi car hinek mirovên din yên ku pir pîr ji bûn, çend gotin digotin.Lê wekî din ji ti gotinên din ne dihatina gotin.Mihamed ji deme ku rûniştî bû ve bêdeng bû. Mirovekî weke ku wî mazin û zane wilqasî di cihê xwe de bi bêdeng bimêne û bisekinê, asayî ne dihata dîtin.Mihamed, yan ew di serê xwe de li ser tiştekî pir mazin û kur dihizirê. Yan ew di serê xwe de ew li derne din e. Her weha mirov karîbû ku bêne ser ziman.Lê deme ku mirov lê dimeyîzend, mirov di dît ku ew bihizirê. Ev yek jê pir baş û qanc dihata têgihiştin.Deme ku mirov lê dimeyîzend, mirov ev yek jê têdigihişt di wê heyeme de. Mihamed berê xwe dabûbû hevberê xwe û rastûrast dimeyîzend. Avirên wî çûbû bûna ser wêneyê Şahmaran û lê dimeyîzend. Bihazn û ji dil lê dimeyîzend. Ma gelo ew çi dihizirî û li ser çi wilqasî kur dihizirê, haya ku wî wilqasî ji dil li wî wêneyê dimeyîzend. Lê deme ku mirov lê dimeyîzend mirov ev yek pêre kifş dikir. Mirov pêre kifş dikir ku ew pir bi hizirê li ser tiştne.Mihamed hertimî dihizirî.Lê wi dê demê û heyemê de ew hizirkirin û ponijbûna wî pir zêdetir bûbû.

Şêx Birehîm ji diaxift. Cerna ew bi mîr re diaxift û cerna ji li dore xwe dimeyîzend û di axift.Lê diaxift. Bi axiftinê, heya wî di wê heyemê de ji ser Mihamed çûbû bû. Ew heya wî li ser axiftina wî ye ku wî ji dore xwe dikir bû.Bi vê yekê weke qadarekê heya wî ne li ser Mihamed bû.Lê di

nava axiftina xwe de, deme ku li dore xwe dimeyîzend, carekê avira wî diçê ser Mihamed. Deme ku avira wî diçê ser Mihamed, êdî weke ku ew di wê heyemê de were bîre wî lê tê û heya wî êdî diçê ser Mihamed. Carekê dî bi hey li wî dimeyîzenê.Deme ku heya wî diçê ser Mihamed, ew dibîne ku wa Mihamed li pêşiye xwe bi hey dimeyîzenê, û heya wî di serê wî de li derne dî ya. Ew, deme ku li Mihamed dimeyîzenê, vê yekê di serê xwe de weke hizirekê kifş dike.Deme ku ew wilo kişf dike, êdî heya wî pir li ser Mihamed dimêne.Piştre ne bi gelekî re ew axiftina xwe ye ku dikir bidawi dike û dimêne sekinî.Deme ku dimêne sekinî, êdî heya xwe dide ser Mihamed.Weke qadarekê her weha ew wilo dimêne û heya wî li ser Mihamed dimêne.Mihamed ji, deme ku piştî axiftina şêx Birehîm re mafê axiftinê dihildê û diaxivê, û di axiftina xwe de bahsa Mihamed dike û navê wî dihildê, êdî Mihamed ji weke ku ji xewekê bihilçenê lê tê û piştre tê xwe di wê heyeme de. Deme ku ew tê xwe ji, bala wî diçê ser mîr.Lê deme ku ew dike ku li mîr meyîzenê, Ew dibîne ku wa avirên şêx Birehîm wê li ser wî ne û li wî dimeyîzenê.Deme ku ew wilo ji wî kifş dike, êdî şêx Birehîm di wê heyemê de dikeve ber heya Mihamed de.Deme ku Mihamed li şêx Birehîm di meyîzenê, hingî, çav bi çav têne ber hevdû.Lê ew ti tiştekî ji hevdû re ne bêjin.Ji xwe di wê heyeme de ji wê yekê re derfet ji nîn e.Ji ber ku mîr hê ew diaxift di wê heyeme de.Piştre ne bi gelekî re mîr axiftina xwe bidawi dike. Piştî ku mîr axiftina xwe bidawi dike, êdî careke din şêx Birehîm mafê axiftinê digirê û li Mihamed dimeyîzenê û dike ku biaxivê.

Şêx Birehîm deme ku li Mihamed dimeyîzenê û dike ku biaxivê, hinegî bal hemû ji diçina ser wî.Ew li Mihamed dimeyîzenê û dike ku biaxivê û gotinên ku wê bêje ji dore xwe re bêje. Piştre ne bi gelekî re ew bidest axiftinê dike û axiftina xwe berdewam dike. Deme ku bidest axiftinê dike, hingî, li Mihamed dimeyîzenê û dibêje,”seydeyê min, ev demeke ku bi bêdengê. Ev demeke ku dohnê min lê ye ku dihizirê ji, Ez dibe qey ku nahaka biaxivê wê ji me re hinek tiştne ji bêne ser ziman”.Şêx Birehîm, ku her weha dibêje û hinekî dî ji bi ser ve diaxivê, piştre axiftina xwe bidawi dike. Wilo zêde dirêj ne axivê.Kin diaxivê. Lê wê heyeme de gotinên ku ji devê şêx derdikevin ji balê dikişênine ser Mihamed. Mihamed ji bi wê axiftine wî bala wî diçê ser wî û dore wî. Deme ku bala wî diçê ser dore wî, êdî hinekî ew li dore xwe dimeyîzenê û piştre ku şêx Birehîm axiftina xwe bidawi dike, êdî ew ji dike ku biaxivê. Ji ber vê yekê, ew di wê heyeme de xwe di cihê xwe de xwe amede dike. Weke qadarekê ew xwe di cihê xwe de xwe amede dike.

Piştre ne bi gelekî re Mihamed bidest axiftinê dike û diaxivê. Deme ku bidest axiftinê dike, bala herkesekî diçê ser wî. Ew deme ku diaxivê, hinekî li ser hizirkirinên di serê xwe de ji dore xwe re têne ser ziman.Ji wan re bahs dike ku ka ew li ser çi hiziriya û di serê xwe de di wê heyeme de dihizirê.Mihamed deme ku diaxivê di wê heyeme de, ji demên xwe yên berê weke demekê di axivê.Lê zêde li ser wan demên xwe ne axivê. Lê Mihamed li ser jiyana alimên ku wî dîtibûn û yên ku di serê wî de pir cih girtibûn ji wan hinekî ji hizre wan anî ser ziman. Bi vê yekê weke demekê axift.Gelek ji wan mirovên ku ew di wê heyeme de wî bahsa wan kir ji zanistên wê demê lê ne diman bûn. Çûbûn ser dilovaniya xwe di wê heyeme de.Lê wan li pey xwe bi hizre xwe re pir tişt hiştibûn.Mihamed di derbarê wan de hinekî axifti. Mihamed di deme ku diaxift de, heya mîr pir li ser wî bû. Heya mirovên li dore wî pir li ser wî bû. Pir lê dimeyîzendin. Heya xwe bi didana ser wî û axiftina wî ye ku wî di wê heyeme de ji wan re dikir.Mihamed weke demekê dipeyivê.Piştre ne bi gelekî re Mihamed axiftina xwe bidawi dike û dimêne sekinî di cihê xwe de. Piştî ku ew dimêne sekinî di cihê xwe de, êdî mirovne din dikin ku biaxivin. Yên ku diaxivin derdikevin. Lê ew zêde ne axivin. Piştre ne bi gelkî re Mîr ji mafê axiftinê digirê û diaxivê. Ew ji hinekî ji hiskirinên xwe di derbarê wan alim û zanistên ku Mihamed di wê heyeme de navê anîbû ser ziman û bahsa wan kiribû anî ser ziman.De ne, di civate wî de hertimî ji zanist û aliman dihata axifitn.

Di civate mîr de hertimî bahsa zanist û zanebûna wan û alim û zanebûna wan dihata kirin. Pişt li ser wan dihata axiftin.Yên ku li civate mîr rûniştiba ji, her weha wê di derbarê wan de bûbana xwedi agahî û zanebûn.Li Kurdistanê li kuderê çi bûbana zû dihata bihîstin. Deme ku dihata bihîstin ji, civate mîr de dihata ser ziman. Deme ku dihata ser ziman ji, êdî yên ku li wir, kî hebana, his dikirin.Her weha rewşek hebû.Mihamed, deme ku ew axiftibû, wî bahsa hinek alim û zanistên deme xwe yên ku navdar kiribû.Yên ku Mihamed bahsa wan kiribû, navê hatibû bihîstin. Navê wan di civate mîr de ji hatibû ser ziman.Lê weke ku Mihamed anîbû ser ziman, heya wê kêlîkê ti kesekî wilo zêde ne anîbû ser ziman. Mihamed di derbarê wan û hizre wan de, pir xwedi zanebûn bû.Ji ber vê yekê ji, deme ku ew axiftibû, pir li ser wan û zanebûna kur sekinî bû.Bi vê yekê re wî wilo anîbû ser ziman. Mîr ji di wê heyemê de deme ku axiftibû, ji wan axiftibû.Lê wî çawa hiskiribû di civate xwe de, wî wilo anîbû ser ziman.Di civate wî de hertimî ji wan dihata ser ziman.

Mîr weke qadarekê diaxivê. Ew ji li ser aliman diaxivê. Mirovên weke meleyê Cizirî ji navê wan di nav axiftina wî de tê ser ziman. Mirovên weke mele Hisêne Bate ji navê wan di nav axiftina wî de tê ser ziman. Her weha hê gelek zanist û alimên din ji hene û navê wan ji tê ser ziman. Deme ku mîr diaxivê, mîr axiftinaka pir bizanebûn dike ku bike.Axiftinaka bizanebûn dike ji.Mîr weke qadarekê ji dore xwe diaxivê.Ku weke qadarekê diaxivê, êdî piştre ew axiftina xwe bi dawi dike û dimêne sekinî di cihê xwe de. Pişt mîr re yê ku mafê axiftinê dihildê û diaxivê ji şêx Birehîm bi xwe ye. Ew mafê axiftinê dihildê û diaxivê. Ew ji çend gotinan bi ser gotinên ku mîr anîna ser ziman ve dike.

Şêx Birehîm, ya rastî, deme ku ew axiftibû, armancaka wî hebû. Armanca wî ew bû ku Mihamed bikişêne axiftinê. Xwestibû ku balan bikişêne ser Mihamed. Ji ber ku ew demek bû ku Mihamed bi bêdeng di cihê xwe de disekinî.Mihamed di serê xwe de di hizirkirinan de bû. Pir dihizirî.Pir di serê xwe de ew diçû û dihat. Ew kalê mazin û zane wilqasî di serê xwe de ketibû hizran de. Muhakkak ku ew di serê xwe de li ser tiştne pir mazin hiziriya. Şêx Birehîm, deme ku wî xwest ku Mihamed bikişêne axiftinê, weke ku ew di serê xwe de vê yekê bi Mihamed re kifş bike û bixweze ye di serê Mihamed de fêr bibe xwestibû ku wî bikişêne axiftinê. Piştre axiftibû û deme ku axiftibû ji kiribû ku baê herine ser Mihamed. Ji xwe pişt wî re Mihamed ji axiftibû. Mihamed, deme ku ew axiftibû, wî axiftinaka pir bizanebûn û hinekî dirêj kiribû.Herkesekê li wir zanibû ku zanebûna Mihamed çend mazina û ew di serê xwe de çend bizanebûna.Her weha di derbarê wî de mirov xwedî zanebûn bûn.

Piştî ku di wê heyeme de mîr ji axiftina xwe kiribû û bidawi kiribû, pişt wî re çend mirovên din ji bi şêx Birehîm re deng dabûbûn û axiftibûn.Ew ji weke demekê axiftibûn. Bi axiftinên xwe re wan ji demeke dirêj axiftina xwe berdewam kiribû.Mihamed di wê heyeme de bi bêdeng bû.Lê du caran tevlî axiftinan bi hin axiftinên kin bûbû.Lê wê pêde wî ti axiftin ne kiribû. Ya rasti ji, ew bêdengbûna Mihamed bal dikişanda ser xwe di wê heyeme de. Mirovên ku li wî dimeyîzendin ji di dîtin û fahm dikirin ku Mihamed weke ku hinekî aciza. Ji rewşe wî ev yek wilo dihata berçavan.Mihamed di cihê xwe de weke ku hinekî ne rehet bû. Deme ku Mihamed lê dimeyîzend, mirov ev pêre kifş dikir. Lê ew ji weke ku nexwezê wê yekê bide der di xwe de, tevdigrehe di wê heyeme de.

Weke qadarekê wê rewş civate wan berdewam kir. Piştre ne bi gelekî re mîr mirovên ku wê sofre ji li ber wan vekiribana li devê derî dîtin. Deme ku mîr ew dîtin hinekî ma sekinî. Ji ber ku hê axiftin dibûn û ne dibû ku

ew di nîvê axiftinan de hatiban hundur û wan bidest vekirina sofrê kiriban.Wê rast ne bûbana.Ji ber vê yekê ji Mir sekinî bû. Ew ji çavên wan li mîr bû. Deme ku mîr gotinek an ji nîşanayak ji bo wan dabana nîşandin, hingî, ew ji wê hatiban hundur û bidest vekirina sofrê kiriban. Her weha ew ji li bendê bûn. Çavên wan ji li ser Mîr bûn.Mirovên li dore mîr ji, ku mîr ji di nav de diaxiftinakê de bûn. Bi hev re diaxiftinê de germ bûbûn. Axiftina di nav wan de pir gurr bû.Deng pir derdiketin. Ji xwe deme ku mîr diaxift, pişt wî re êdî mirovên din ji diketine axiftinê. Bi vê yekê re axiftin pir mazin bû û gurr bû di wê heyeme de.Mihamed, ew di rewşe xwe de bû.Şêx Birehîm bala wî li ser Mihamed ji bû û di nava axiftinan de ji bû. Ew pir tevlî axiftinan dibû. Ew pir diaxift.Deme ku ew diaxift ji, wî axiftina xwe kin ne dikir. Wî axiftina xwe dirêj dikir. Ew her weha pir bi axiftin bû. Mîr, piştî ku mirovên ku wê sofre danîbana, ku wî ew li devê derî dîtibû, êdî bala wî çûbû bû ser wan. Ew ji piştî dîtina wan re, êdî weke ku li demeke li firsandekê digeraha ku bêje wan werine hundur û sofre dênin.Lê di wê heyeme de axiftin pir zêde bû.Dîwana mîr ji pir dirêj bû. Di dîwanaka wilo mazin û dirêj de firsand girtin ji zor bû. Di wê heyeme de pir zor bû. Di wê heyeme de li hevdû pir mirov rûniştî bûn. Mirovên ku rûniştî ji bûn, hemû ji yên ku zanist û pir biaqil bûn.Deme ku diaxiftin ji pir mazin dianîn ser ziman. Mirovên navserî xwe bûn û di nav xalkê de ji gotina wan pir dibuhurt.Vêce di nav mirovên wilo de, ku mîr gotinak gotibana û wê gotina wê xaberdana hinek mirovên wilo qut kiribana, ew ji wê rast ne bûbana. Herkesekî ji zanibû ku wê rast ne bûbana. Ji ber vê yekê ji, ew ji divîyabû ku li bendî demekê ku zêde axiftin têde ne dibûn û deme ku wî gotibana yên ku wê sofre vekiriban werin, hingî, ji axiftina ti kesekî qut ne kiribana.Li demeke wilo disekinî. Mîr ji û mirovên li dore wî ji di wê heyeme de, li ser mijarên pir girîng diaxiftin. Li ser alim û zanistan diaxiftin. Rêzeke mazin ji aliman re hebû û deme ku bahsa wan hatibana kirin ji, axiftina li ser wan biqasî ku baş bana, wilo wilqasî ku bû, çûbana serî ji girîng bû.Ji ber vê yekê, mîr li bendî demekê bû. Wê rewşe wan ye axiftinê weke bêhnekê ber dewam kir. Mirovên ku diaxiftin ji, gelek ji wan bêdeng man. Yên di dawiyê de mafê axiftinê girt û çend gotinên din anîn ser ziman şêx Birehîm bi xwe bû.Lê deme ku şêx Birehîm axiftina kir û anî ber dawiyê ku bidawi bike, hingî, li mîr meyîzend û axiftina xwe bidawi kir. Deme ku lê meyîzend ji, gotiyê de ”mîrê min, ye rastî ji zanebûne hiş e. Divêt ku mirov ji bîr neke” û piştre ma sekinî. Ku ew ji ma sekinî, êdî weke ku ti kesek êdî ne diaxift. Hinekî bêdengbûn çêbû.Bi vê yekê re mîr mafê axiftinê girt û çend gotinên din anîn ser ziman û gotina

xwe bi mirovên ku li devê derî sekinîne ji bo sofre vekin bi wan bidawi kir.Piştre ku mîr axiftina xwe bidaw kir û ma sekinî, êdî piştre carekê dî piştî axiftina xwe re wî dise mafê axiftinê hilde û gote mirovên ku li bendî gotina wî ne, ku werine hundur û sofrê vekirin, gote wan ”deka ne xwe werin keremkine hundur”.Deme ku mîr wilo got, êdî ew ji di cih de bi hev re hatina hundur û di nava wan de bidest vekirina sofre xwarinê ye şîvê kirin.

Di demeke kin de wan sofre vekir li ber wan û xwe dana bi şûn ve.Lê hinek li wir ji man.Ji ber ku suxratiya wan bikin.Deme ku sofre li ber wan amede bû, êdî bi hev re xwe dana dore sofrê bi bidest şîvê kirin.Deme ku sofre amede bû, hingî, mîr got ”kerem kin” û wê xwe da bi pêş ve û piştre bi wê re mirovên din ji xwe dana dore sofrê di wê heyeme de.Mihamed ji deme ku mîr got, wî pêşî li şêx Birehim meyîzend û piştre xwe da dore sofre ji aliyê xwe ve.Şêx birehîm ji weke wî kir. Deme ku ew hatina dore sofre, êdî wilo zêde jev dûr neman. Li nêzîkî hevdû rûniştin.Deme ku wan xwe da dore sofrê hinekî li hevdû ji meyîzendin. Hin avirn dana hevdû.Lê avirên ku dana hevdû ji, weke ku ji dil silavekê bidine hevdû bû.Deme ku hevdû meyîzendin, şêx Birehîm bi rû ken bû. Mihamed ji wilo bû.Lê Mihamed hinekî rû qarmîçonkî ji bû. Ji ber ku di laşê wî de weke ku hinekî weke ku êş hebû. Yên ku lê dimeyîzendin, ev yek kifş dikirin.Lê şêx Birehîm yê ku herî zêde ev yek kifş dikir bû.

Piştî ku xwe li dore sofrê dana hevdû, êdî bi hev re wan bidest xwarina xwe kir. Di wê heyeme xwarinê de wilo deng ji ti kesekî dernediket.Lê ne bêdeng ji bûn.Herkesek yên ku bideng ji bûn hebûn.Minaq mirovên weke mîr. Mirovên weke şêx Birehîm. Ew pir di ser xwarinê de ne bideng bûn.Lê ne bêdeng ji bûn. Deng ji wan derdiket.Mihamed di cihê xwe de bi bêdeng bû.Lê carekê dû caran deme ku şêx Birehîm axiftibû, di axiftina xwe de li Mihamed meyizendibû û axiftibû. Bi vê yekê re êdî Mihamed ji lê meyîzendibû û deme ku wî hizre xwe anîbû ser ziman, wî ji hizre xwe bi çend gotinan anîbû ser ziman.Bi vê yekê re ew axiftibû. Ji wê pêve wî wilo ti axiftinên din ne kiribû.Ew deme ku diaxift ji, di wê heyeme de weke ku di serê wî de hinek hizirnên ku wê didana hazinandin hebûn. Wilo mirov jê fahmdikir. Mihamed mirovekî zanebû. Ew di serê xwe de bi hizir û ramanê xwe re pir mazin bû.Wî pir dîtibû û pir herêm dîtin. Li gelek deveran ew geraha bû. Bi vê yekê ew her devera ku çûbûyê de li wanderan, bi gelek mirovên zanist û mazin re rûniştibû û li ber wan ji wan re hizir û ramana xwe anîbû ser ziman. Bi vê yekê re, bi yên ku ew bi wan re

rûniştibû ji, ji wan hizir û ramanên wan hisandibû.Bi vê yekê re di derbarê wan de bûbû xwedi hizir.

Bi vê yekê ve girêdayî divêt ku mirov hinekî dî bêne ser ziman. Mihamed deme ku ji herême rojhilatê kurdistanê tê bakûrê kurdistanê, hingî, pêşî hinekî li herême serhadê wan deran dimêne. Li Îdirê û Bazîde wan deran ji dibîne. Li wanderan weke çend rojê dimêne. Piştre ew ji wir tê warê bav û kalê xwe û li wir weke demekê dimêne. Lê li wir zêde ne mêne. Piştre ew tê ku were amede. Tê wir ji û li wir weke demekê dimêne. Piştre ew ji wir xwe digihêne Rihayê. Li wir ji li Medrase ji dimêne.Li dergaha ku digotinê de ”mala birehîm xelîl” ji weke demekê ew dimêne.Le li wir zede nemene.Li wir ew demekê zêde li Eyûbiyan dimêne. Eyûbîyan li wir xurtbûn. Serweriyeke wan ya pir mazin di wê demê de hebû.Ew bi serwerî û hebûna xwe re li herêmê dibîna bingihê aramiyaka pir mazin li herêmê. Lê piştî ku li Bedlîsê Îdrîsê bedlîsî derdikeve û ew hinekî serwer dibe, êdî di wê demê de serweriya wan ji kêm dibe.Ya rastî mirov karê serwerîya Ayûbîyan haya deme Îdrîsê bedlîsî mazin bêne ser ziman. Îdrîsê bedlisî, bi xwe re demeke nû dide dest pê kirin.Ew peymana ku ew li Amasya bi Yavuz Selim re mohr dike, dibe destpêka deme nû li kurdistanê ji bo kurdan.Ji xwe piştî wê peymanê re ne bi gelekî re ku Qanûnî siltan sileyman tê dewsa wî û ew peymana ji hole dirakê. Êdî bi vê yekê re demekê nû destpêdike. Qanûnî hizir dike ku wê herême bi hêzê bike bin destê xwe de. Deme ku ew fermanekê di di weşanê û peymanê ji hole dirake û êdî piştre ne bi gelekî re ji xwe êdî seferekê ji li kurdistanê ew dide dest pê kirin. Bi wê seferê re yên ku li hevberê fermana wî di rabin, hemû têne palixandin û kuştin. Herême Xizanê ji ji wê seferê qanûnî peya xwe girtibû. Bavê mîr Ahmed bixwe ji li ber wan rabûbû û li ber wan fermana şerekî dabû bû.Li hin deverne ji şer qawimi bû.Qanûnî siltan suleyman pir girîng dide wê herêmê. Ji ber ku ew herêmeke pir girîng bû. Li wê herêmê ku wî serwerîya xwe avakiribana wê li ber sefeviyan ji serwer bana. Ew herêm ji bo wê ji pir girîng bû.Li herême serhadê bi giştî, ku mirov cihên giringî yên weke Îdir, Bazîd, Sêrt, Bedlîsê, Wan û hin deverên din ji di nav  bihasibêne, divêt ku mirov Xizanê ji di nav de weke herêmeke pir girîng bihasibene. Bi çiyayên li dore xwe re ji hertimî herêmeke ku bi tememî ne osmaniyan û ne ji Sefeviyan karîbûya ku serweriya xwe li wê bikin.di deme şerê Çardiranê de ji ku mîrê Xizanê li ber Yavuz rabûbana û ew herêmê xwe jê re bi navbendîya Îdrîsê Bedlîsî ne vekiribana, wê li wir bi serneketiban.Ji ber vê yekê ku deme ku şer bû

û piştre bi serketine bi dawi bû, piştre ji Xizanê re ”şancaka hukumetê” hata dayîn.Ev ji jê re weke xalatekê bû..

Di deme Mîr Ahmed de her çend ku ew xalata ku Yavuz dabû Qanûnî bi şûn ve hildabû ji, lê dise rewşe wan ya weke xwe berdewam kiribû.Hebûna kurdan ye bi rêzaniyê û mazinbûnê, deme ku mirov bêne ser ziman, mirov nikarê têne bi mîran bêne ser ziman.Lê mirov dema ku anî ser ziman ji, mirov ku mîran weke mijaraka sereke têde neyêne ser ziman ji, wê kêm were ser ziman.Di vir de, deme ku mirov bahsa kurdan û rêzaniyê bike, divêt ku mirov pêre pir kevnşopî û rêzaniyê mîran bi hev re bêne ser ziman.Mîr bixwe ji, mirovekî kevneşopî bû.Bi vê yekê re wê kevneşopîyek ji temsîl dikir. Her weha ew pir mazin bû.Civat ji, deme ku ew têne ser ziman, bi vê ve girêdayî ku mirov bêne ser ziman, mirov wê di rastiyê de rastiyaka wê kevneşopîye bêen ser ziman. Her weha civat di aslê xwe de hebûna çanadaka pir girîng û mazin û pir kevn tênine ser ziman. Di deme Naîriyan de Civat pir derketina pêş. Lê berî wê demê ji civat pir li pêş hebûn. Di nava kurdan de keveşopîyeke pir mazin tê ser ziman. Ku mirov hebûna dest pê kirina pêşketina civataktiyê di nava kurdan de civatê bixe bigihê wê de û bêne ser ziman, ya rasti, hingî divêt ku mirov wê bûna wê civakatiyê ji gelek û û gelekî ji bibe berî demên Naîriyan. Ev yek pir girîng e û dîrokî ya.Her kevneşopî bi serê xwe nîn e. Pêre pir hizir û rewşên ku hatina afirandin hene. Ew hemû bi hev re wê kevneşopîyê diafirênin.Bi vê yekê re, ku mirov di nava kurdan li kevneşopîyan meyîzenê, hingî, mirov dibîne ku ew xwediyê kevneşopîyne pir kevne û pir bi rewş bûna ne. Mirov vê yekê pir baş û qanc dibîne. Mirov dibîne ku pêşketinaka civakî ye pir kevn bi wan re heya.

Pêşketina wan ye civakî di hebûna wan de pir bicih bûya.Ji ber vê yekê, di hizre civakatiyê de pêşketî ne.Deme ku mirov bahsa pêşketina wan bike, mirov divêt ku çanda û kevneşopîyên wan yên ku hene di berçav de bi buhurêne.Divêt ku mirov wan ji di berçav de bibuhurêne û pêre pêketina wan bêne ser ziman.Kevneşopî, cerna bi hizre û pêşketine xwe re ji weke olekê ya.Olek di pêşketine xwe hertimî divêt ku pêşketineke hemdemî çêke.Ku çênekê ji bo civaka ku di nava de derketi de ji di demê de hinek xetarnan têne.Bi vê yekê re ol di pêşketina xwe de pêşketineke ku mecbûrî bibe ya.Kevneşopî ji di vê rewşê de mirov karê bêje ku divêt ku pêşketinên xwe li deman bikin.Ku pêşketinên xwe ne kin, ew kevneşopîyên ku di demekê pir bi pêş dixistin, wê di demekê dî de pir li şûn ji bihêlin.Di vir de hebûna felsefê pir giringe. Felsefe ji bo pêşketine civakê hertimî û demî lazima. Hertimî pêdivî pê heya.Di her demê de wê pêdivî pê hebe.Deme

ku mirov bahsa civata dike, ji ber vê yekê ji pir girîng in ji bo kurdan û pêşketin û civakatiya wan.Di civatan de felsefe hertimî dihata kirin. Nîqaşên felsefe dihatina kirin. Mirov nikarê civatan tenê weke cihne ku têde car bi car hinek mirov li hev dibûna ku kom bi hev re diaxiftin bêne ser ziman.Ji wê zêdetir pir cihne felsefîk in ji.Her zanist û alim ji, di civatan de xwe dide berçavan. Di wanderan hizir û ramana xwe dianî ser ziman.Her hizir û ramana ku di civatan de dihata ser ziman ji, di nav xalkê de di cih de belav dibûn. Nexasim vêce di civatên mîr ku hizir dihatina ser ziman.Di civatên mîr de her hizre ku dihata ser ziman, di cih de dihata hiskirin di nav xalkê de.Deme ku dihata hiskirin ji, êdî li ser dihata axiftin. Xalkê ji di civatên xwe de li ser wan hizran pir danûstandin dikir.Her hizre ku dihata bihîstin wan ji hizre xwe li ser dianî ser ziman.Ev yek weke kevneşopîyekê bû..

Di wê heyeme de li qasrê mîr pir mirov li hevdû bûn. Li dore sofre şîvê bûn û bi hev re şêvî xwe dikirin. Lê hin bi hin ji wan ji şîvê xwe bi dawi kir. Piştî ku şîvê xwe bidawi kirin, êdî wê civata wan mazin dise dest pê kiribana.

Li ser xwarinê hem xwarina xwe dixwarin û hem ji car bi car bi hev re diaxiftin. Her weha deng ji wan dihat. Şêx Birehim û mîr yên ku herî zêde deng ji wan dihat bûn. Ji xaynî wan ji yên ku deng ji wan dihatin hebûn. Lê ne weke wan. Ew di axiftinê de li pêşiye hemûkan bûn. Ew zêde diaxiftin. Deme ku ew diaxiftin ji, herkesekê li dore wan li wan bi hey dibû û li wan dihisand.Mihamed ji, du caran axiftibû û her cara ku axiftibû ji, çend gotin gotibûn.Lê ew weke wan wilo zêde ne ne axiftibû. Ew bala wî li ser dore wî bû.Lê divêt ku mirov bêje ku bala mirovên li dore wî ji li ser wî bû.Her weha rewşek hebû.

Piştre ku demek têve diçê, êdî hin bi hin ew di xwarina xwe de têne ber dawiyê. Yên ku têr dixwûn ji di cihê xwe de dimênin. Yek ji ji wan xwe ji wir nadê bi şûn ve. Hemû ji weke ku li bendî hevdû ne.Lê hemûyan ji ku têr xwaribana wê xwe nedaban bi şûn ve, ta ku mîr xwe ne dabana bi şûn ve. Ev yek weke kevneşopîyekê bû. Weke kevneşopîyeke pir kevn bû. Ya rastiyê, ku mirov bêje, wê nêzîkatiyê di hundurê xwe de rêzek di anî ser ziman. Rêz ji mîr re bû. Lê di şaxsiyeta mîr de ji kevneşopîyê re bû. Her weha ev yek hebû.Mîr, bi vê yekê divêt ku mirov bêje ku ew nimînêrê wê kevneşopîye ku dihata bicih anîn.

Piştre ku demek têve çû, êdî piştre hin bi hin mirovên li dore sofre ji bidest têrxwarinê dikirin. Lê yên ku têr dixwarin ji di cihê xwe de diman. Hin bi hin ku dem têve diçû ji, êdî yên ku têr dixwarin dimana sekinî. Lê

weke ku xwarinê dixwûn ji, hinekan li ser sofrê xwe mijul dikir. Ev yek dihata berçavan. Piştre bi demekê re êdî yên ku têr xwarin, hema bêje bûn hemûk.Lê hê ji yên ku dixwarin hebûn.Mîr ji têr xwaribû.Lê wî ji weke ku dixwar li xwe dianî û li ser sofrê sekinî bû.Piştre ku demek têve çû, êdî ne bi gelekî re hata fahm kirin ku hemûkan tê xwariya.Piştre ne bi gelekî Mihamed ji mabû sekinî. Mihamed deme ku têr xwaribû, weke ku bixwezê xwe di cihê xwe de xweş bike xwe di cihê xwe de labitandibû.Wê labitandina wî bala mirovên li dore wî kişandibû. Piştre ku hata fahm kirin ku herkesekî têr xwariya, êdî mîr kir ku xwe bide bi şûn ve. Deme ku wê xwe da bi şûn ve, di wê heyeme de şêx Birehim mafê axiftinê girt û axift û deme ku axift ji ji mîr ji got ”sofre te her dayîm bê! Mîrê min” û ma sekinî. Deme ku wî wilo got, êdî pişt wî re gelekên din ji mafê axiftin girtin û wilo gotin.Mihamed wilo got. Deme ku MIhamed wilo got, bi axiftina xwe re got ku ”sofreyeke pir xweş bû. Ji dil bû.Sofre ji dil, sofre ku hertimî embiya li ser mêhvan in”.Wî wilo got û ma sekinî.

Piştî ku wan xwe ji ji ser sofrê bi şûn ve dane de, êdî ne bi gelekî re sofre wan hata li dayî hevdû.Deme ku wan xwe bi şûn ve dayê de, ne bi gelekî re mirovên ku sofre ji wan re vekiribûn, di cih de hatina hundur û bidest lidayîhevdûna sofrê kirin.Di deme kin de wan sofre ji ber wan da hevdû. Piştî ku wan sofre da hevdû, êdî ne bi gelekî re weke ku sofreyeke dî ji wan re hata vekirin.Piştî ku sofre ji pêşiye wan hata li dayî hevdû, êdî piştre ne bi gelekî re şîranî û ew hatina ber wan. Bi vê ve ji wan demeke xwe buhurand. Lê di deme ku şîraniyê xwe divexwarin, di ber bi hev re diaxiftin ji. Her weha di rewşekê de bûn. Di rewşeke xweza de bûn. Hin bi hin axiftin di nav wan de gurr dibû.Axiftina ku di nav wan de gurr dibû, hin bi hn zêde dibû.Di wê heyeme de, yên ku diaxiftin, yek ji wan mîr bû.Mîr pir diaxift. Divîyabû ji ku ew axiftibana û ew diaxiftinê çist bana. Divîyabû ku ew diaxiftinê de li ser xwe bana. Ew mîr bû û civat li mala wî li qasrê bû.Ev yek pir girîng bû ji bo wî. Ev yek wê bi mîrîtî û mazinatiya wî û zanebûna wî re bihatibana şîrovekirin û ser ziman.Di civatên mîran de hertimî bi mîr li pêş bûn. Bi wan re mirovên navserî xwe yên ku herî pîr û zane li pêş bûn. Mirovên pîr hertimî, ku li kuderê ji bana, rêzeke mazin bixweza ji wan re hebû.Ti kesekî, ku mîr ji bana nikaribû ku li ber wê rêzê rabûbana.Ev yek weke zagonaka civakî bû.Ew yek weke kevneşopîyekê wê bû.Mirovekî li ber pîran desthildabana an ji ne başiyak kiribana, ew yek ti carî ne dihata ji bîr kirin.Ew yek wê hertimî bi navê wî re hatibana bi bîr anîn. Wê weke navekî jê re mabana. Di civaka kurdan de ku mirov bahsa mirovên pîr bike, divêt ku mirov hinek bi teybet bahsa wan

bike. Ew di civakê de mazin bûn. Di civatan de ji yên ku herî zêde bigotin bûn ew bûn.Weke ku wan civak bi rê ve dibir.

Ev yek ne tenê di wê demê hebû. Ji demên berê ve hebû. Ji demên berê ve ev yek bi hebûn bû. Pîr di nava civakê de yên ku herî zane û biaqil û mazin û birêz dihatina hasibandin bûn.Di deme Naîriyan de pîrîtî weke saziyekê bi civatan de hebû. Wan bi rê ve dibir. Ku biryaraka şer hatibana dayîn an ji wê biryaraka aşitiyê bihatibana girtin, ew li pêş bûn. Wan biryar dide. Ew li hevdû dirûniştin û biryar didan. Ew li hevdû rûniştin ji, divêt ku mirov mazin şîrove bike û bêne ser ziman. Ew li hevdû rûniştin di çeçove hinek kevneşopîyan de bû.Minaq, deme ku wê ji bo aşitiyekê biryar bihatana girtin, hingî, wê yê di nav civakê de herî zêde bi nav kî ye û pîre, wê di pêşengiye wî de li dore tirbên weke tirbên Nebî Nuh li hevdû civin û civatên xwe li darxin û wê bi hev re kevine danûstandinê de û wê biryarên xwe bistênin. Biryarên ku di wan civinan de dihatin girtin dihatina nivîsandin. Li ser kêvalbaran dihatina nivîsandin. Ew biryar ji, bi vê yekê, êdî mayînda dibûn.Piştre ku biryar hata girtin, êdî herkesekî li gor wê biryarê gava xwe diavêt. Kî ji bana, wê dernekatibana dervî wê biryarê. Ev yek weke xalaka destûraka bingihîn bû.

Civat, her weha pir mazin û bi qadr bûn.Qadrê civatan pir mazin bû. Mirovên ku li civatan dirûniştin û diaxiftin ji, di nava xalkê de bahsa wan û axiftina wan ye kirina dihata kirin. Li ser dihata sekinandin. Li ser dihata axiftin. Di nav xalkê de mirovan hizre xwe li ser wê hizre wan dianî ser ziman. Hizre dianîn ser ziman, ku ka ew çend mazin û zana axiftiya û an ji kêm û nezana axiftiya. Her weha dihata vegotin. Deme ku ew pir baş û bizane axiftibana, hingî ji weke mirovekî ku pir bi zane axiftiya dianîn ser ziman. Lê ku kêmesî di axiftina wan de hatibana zantkirin, êdî ew bi wê kêmesîyê dihata ser ziman. Wê gotiban ku ew di axiftina xwe de bikêmesî bû.Divêt ku ew hê hinekî din ji mazin bibe. Deme ku ew gotin jê re hata gotin, êdî jê re dihata gotin ku ew hê hinekî dî ji jê re divêt ku di nav civatan de weha mazin bi axivê.Careka din deme ku civat li darket ji, wê mafê axiftinê ji yên zane re bana. Wê ew mabana li şûn wî.Ev yek ji kevneşopîyeke civatan bû.

Di civatên mîr de, hertimî divîyabû ku mirov bi bal tevgereha bana. Ji ber ku di civatên mîr de hertimî mirovên zane û zanist hebûn. Ew ti tiştek ji çavên wan ne diravî. Çi kêmesî bûbana û an ji hatibana kirin, wan di cih de kifş dikir û dianî ser ziman. Anîna ser ziman, hertimî dibû. Ti tiştek ti kesekî di xwe de ne dihişt.Di civatan de dihata ser ziman. Ku qanc ji bana û xirab ji bana, dihata ser ziman.Deme ku dihata ser ziman, êdî ne dihata

ji bîr kirin. Nexasim vêce ku mirovên dengbêj di wê heyemê de li civatê hebin. Ku ew hebin, êdî ew ji tişte ku kêmesî ji bê û wasf ji bê, ku hata ser ziman, ew ji his dikin û di serê xwe de digirin û haya ku ser wê kêmesiyê an ji wasfdayîna bi wê dengê xwe yê xweş bêjin ji. Ji xwe wan hertiş bi dengbêjî dikir. Wan çi girtibana, di nav dengê xwe de dianîn ser ziman. Ev ji weke xosletek wan dengbêjin civatan bû.

Di wê heyemê de piştî ku sofre xwarinê ji ber civatê rabû bû, piştre şîraniyên wan hatibû bûna wan û wan divexwartin.Di ber re ji ji xwe re bi hev re diaxiftin.Şêx Birehim li ser demên berê û nebîyan pir bi zanebûn bû. Li ser jiyana nebîyan pir zanebûn bû.Car bi car ji ku bi Mihamed re bi tenê mabûn di dergahê de bi hev re li ser jiyana wan û kirinên wan bi hev re ketibû bûn axiftinê de.Wan bi hev re pir axiftin kiribû.Di wê heyeme de ji, şêx Birehim diaxift û ew li ser jiyana wan diaxift.Berî hingî ne bi gelekî re deme ku li mizgeftê bûn, bi hev re li ser jiyana wan danûstandinaka pir baş û mazin kiribûn.Piştre wan axiftinên xwe yên di nav xwe de berdewam kiribûn.Di civatê de ji berdewam kiribûn.Di w heyeme de ji berdewam di kirin.Şêx Birehim, deme ku ew diaxifti, wî li Mihamed dimeyîzend û diaxift.Mihamed mirovekî ku pir zanebû.Weke ku bi avirên xwe jê ji bo axiftina xwe baweriyê bistêne lê dihat. Di wê heyeme de ew weke qadarekê axift.Piştî ku ew weke qadarekê axift, piştre êdî ew ma sekinî. Deme ku ew ma sekinî êdî mîr mafê axiftinê girt û hinekî axift.Mîr, di wê heyeme de deme ku ew axift, ew wilo zêde dirêj ne axift.Ew kin axift.Pişt wî re mirovên li dore wî hineke din mafê axiftinê girtin û axiftin. Hin bi hin her weha êdî civata wan gurr dibû bi axiftinê.Mirovên ku ji zanebûna xwe bi bawer bûn, êdî derdiketine pêş û diaxiftin.

Li civatê di wê heyemê de ne tenê hin bi hin mirovên zane hebûn.Gelek mirovên ku dengê wan xweş bû û bi xweşbûna dengê xwe re navê wan derketibû ji hebûn. Ew ji li wir bûn. Ew di hişkirine xwe de xwediyê bîreke pir xurt bûn. Wan destanên xalkê yên weke Rûstemê Zal karibû ku ji serî haya binî jiber vebêjin.Ew her weha xwediyê hişmedî û bîreke mazin mazin bûn. Dengbêjî deme ku dihata ser ziman, pir xoslet jê dihata xwestin. Lê dihata meyîzendin ku ka çend karê di hişê xwe de bigirê. Ev yek weke xosleteke wan ye sereke bû, ku ji wan dihata xwestin.Dengbêj ku jin ji bana û an ji mêr ji bana, her weha ev xwestek ji wan dihata xwestin.Mihamed bi dengê wî xweş bû.Lê ew ne dengbêj bû.Deme ku ew diaxift, wî bi axiftina xwe dilê mirovên ku lê dihisandin zîz dikir.Ji aliyê bîrkirinê ve ji pir xurt bû. Ew çi li kuderê, ku careke hiskiribana, cara dî

wî karibû ku jiber vebêjê.Ew her weha xwediyê bîreke pir xurt ji bû.Ew xwediyê hişekî pir mazin bû.

Di wê heyeme de piştî ku wan xwarina xwe xwar û piştre ku şîraniyên wan ji hatin û wan şîraniyên xwe ji vexwartin, êdî piştre hin bi hin ketibûbûna axiftinê de.Mihamed ji car bi car diaxift. Lê di wê deme piştî xwarinê de, hê di serî de, mîr pir bi gotin bû. Ew diaxift. Wî gelek caran mafê axiftinê hildabû û axiftibû.Deme ku ew diaxift ji, herkesekî pir bala xwe didayê de.Herkesekî lê dimeyîzend. Mîr ji mirovekî ku zanebû. Wî ji xwandibû. Wî ji zaroktiya xwe û ciwantiya xwe bi xwadinê re buhurandibû.Wî ji bi aliman re xwandibû.Ji ber vê yekê deme ku mirov bahsa zanebûna wî bike, divêt ku mirov hinekî bi zanebûn û mazin bahsa wî bike. Ew ji mazin bû di zanebûne xwe de.

Deme ku bahsa mîr û zanebûne bi hev re dihata kirin, di serî de weke dagerîye vê yekê mîrê bota di cih de dihata bîr û hişê mirov.Ew bi vê yekê pir bi nav û deng bû.Navê wî pir hebû. Mihamed li cizîre bota mabû bû. Di wê heyeme de di axiftinan de car bi car ji navê cizire bota û navê mîrê bota di buhurt.Deme ku bahsa wî dihata kirin, Mihamed pêre gelek tişt di serê xwe de bi bîr dikirin.Gelek tişt dihatina bîre wî di wê heyeme de.Mihamed li wir gelek tişt jîn kiribûn.Hertişte ku wî li wir jîn kiribû ji, wî bi zanebûn jîn kiribû.Hertişte wî jîn kiribû, di serê wî de bû wê heyeme de. Mihamed çend ku pîr bû bû, di bîr kirina xwe de weke ku hinekî dî xurtttir bûbû. Wilo rewşe wî dihata ber çavan. Deme ku diaxift mirov ji axiftina wî ev yek di wê heyeme de pir baş û qanc fahm dikir û têdigihişt.Mihamed mirovekî zanebû. Ew mirovekî ku alim bû. Li ser riya rastteqiniyê dimeşî.Riya wî û ye hizre wî rastteqîni bû.Ew çend ku di wê de kur dibû, ew di hizre xwe de kur dibû.Çend ku di hizre xwe de kur ji dibû, di derbarê jiyanê de bêhtir bi zanebûn û biaqil dibû.

Di wê heyeme de deme ku axiftinê di nava wan de bidest pê kiribû, êdî piştre, ku şîraniyên xwe ji wan vexwartibûn, êdî piştre bi hev re ketibûbûna danûstandinaka pir mazin de. Herkesek di axiftinê de germbû bû.Deme ku mirov di axiftinê de germ dibe, hingî, gelek hizir ji têne bîre mirov.Deme ku hizir hatina bîre mirov, êdî mirov ji bo axiftinê hinekî bêsabr dibe. Di wê heyeme de ji, wilo li wan dihat. Mirovên ku rûniştî bûn, yên ku navserî xwe bûn. Ew di serê xwe de mazin bûn û bihizir bûn.Deme ku diaxiftin ji pir bihizir diaxiftin.Bizane diaxiftin. Mihamed, di wê heyeme de, ew demek bû ku axiftina wan gurr bû bû, lê ew ne wilo zêde bigotin bû.Şêx Birehim û mîr pir bigotin bûn.Ew pir diaxiftin.Ew deme ku diaxiftin, ji pir bizane û dirêj diaxiftin. Şêx Birehim di wê heyeme de diaxift.Lê ji aliyekî

ve ji bala wî weke ku li ser Mihamed bû. Wilo dihata xuyakirin. Di wê heyeme de, cara dawiyê ku ew axift, êdî wî diaxiftina xwe kir ku balê hê zêdetir bêne ser Mihamed.Wê cara ku axift û kir ku balê ser Mihamed, hingî, deme ku ew axift û wî kir ku wilo bike, Mihamed ev yek di wê heyeme de di cih de farq kir.Deme ku wî farq kir, êdî bala wî çû ser şêx Birehim û lê meyîzend.Deme ku wî lê meyîzend, dît ku wa şêx Birehim diaxivê û car bi car bavirên xwe têne ser Mihamed. Mihamed ev yek di wê heyeme de farq kir. Deme ku wî ev yek farq kir, êdî wî ji xwe di cihê xwe de xwe adiland ji bo axiftinê. Deme ku Mihamed wilo xwe di cihê xwe de xwe adiland, û ew xwe di cihê xwe de xwe adilandina wî ji aliyê mirovên li dore wî ve hata dîtin, êdî balaka mazin di wê heyeme de çû ser wî.

Deme ku wî xwe di cihê xwe de diadiland, hingî, şêx Birehim diaxift.Piştre ne bi gelekî re wî axiftina xwe bidawi kir û ma sekinî.Piştî ku ew ma sekinî, di wê heyeme de weke ku bal çûne ser Mîr.Lê mîr ji dîtibû ku Mihamed xwe di cihê xwe de xwe adilandiya. Ji ber vê yekê, wî bidest axiftinê ne kir û li Mihamed meyîzend.Deme ku wî li Mihamed meyîzend, êdî mirovên ku li wî dimeyîzendin û bala wan ji li ser wî bû, di wê heyeme de bala wan di cih de çû ser Mihamed.Li Mihamed meyîzendin.Weke ku li bendî wî û axiftina wî bin lê meyîzendin.Mihamed ji ev yek di wê heyeme de farq kir. Deme ku wî farqkir, êdî wî berê da bi civatê ve û wî di cihê xwe de ji wan re bidest axiftinê kir.Deme ku Mihamed bidest axiftinê kir, hingî, wî li ser ”baxt”, ”zanebûn” û ”mirov” bi hev re sekinî. Wî li ser wan axiftin kir. Wî hizir dikir ku baxtê mirov, her çend ku divêt ku mriov bawer bike ku hatiya kifşkirin ji, divêt ku mirov zanibe ku hinekî di destê mirov de ya. Deme ku wî bidest axiftina xwe kir û li ser baxt axift, hingî, wî li ser navê xwûdê gotinak her weha anî ser ziman.”Xwûde gotiya berpirsiyaraka jiyanê ji ewê ku ye ku bikeve ser milê mirov de mirov bike.Mirov bêxiratî divêt ku erê neke. Bêxiratî, xwûde erê neke û ji mirov nexwezê. Ev yek weke zagotinekê ya. Divêt ku mirov zanibe”.Mihamed di serê axiftina xwe ye li ser baxtbûnê de pirzanebûne kir. Deme ku wî pir zanebûnê kir, di berdewama wê de her weha anî ser ziman. Zanebûn, riya mirov şanî mirov dide.Lê zanebûn, divêt ku ne bêtêgihiştin bêt.Zanebûn divêt ku bitêgihiştin bêt. Piştî wî her weha got, zanebûna bitêgihiştin, rastiyê di xwe de dihawêne.Zanebûna ku rastiyê dixwe de dihawêne ji, zanebûna raste.Rastî ji rasteqîniyê ne dûr e Divêt ku mirov dûr neyêne ser ziman.Piştre wî bi zanebûnê re her weha anî ser ziman.”Divêt ku mirov di zanebûnê de rastiyê bi mirov re têbigihê”.Mihamed ku wilo got, êdî piştre di axiftina xwe de ne sekinî û

berdewam kir. Wî piştre hinekî li ser hizre baxt rawastaha. Li ser anî ser ziman. Li ser hizre baxt, deme ku anî ser ziman, weke ku kevneşopîyekê bêne ser ziman, anî ser ziman. Wî pir dirêj û bizanebûn anîya ser ziman.Mihamed di hizre xwe ye li ser baxt de di vê bawwriyê de bû, ku mirov baxtê wî hinekî di destê wî de ye. Ji ber vê yekê deme ku ew axiftibû ji, her weha anîbû ser ziman. Wî gotibû ku ”mirov li jiyanê jîn dibe.Divêt ku mirov vê yekê fahm bike û têbigihê. Deme ku mirov têgihişt, hingî, mirov wê fahmbike ku ka çawa baxtê mirov hinekî di destê mirov de ye. Baxtê mirov, xwûdê bi du aliyan anîyan ser ziman ji me re. Aliyê li vê dinyê ye û aliyê din ji li dinye din e. Dinye din di destê xwûde de ye. Deme ku mirov çû wê dinyê hingî, mirov wê li dinyê çi kiriya û ne kiriya wê ew ji mirov bê pirsîn. Li dinyê, xwûde baxtê me çikiriya ku em riya xwe bibînin. Divêt ku mirov dinye xwe fahm bike û baş bi rê ve bibe.Divêt ku birast bi rê ve bibe. Bi vê ve girêdayê divêt ku rastiyê ti carî ji aqilê xwe dernexe.Li dinyê, mirov çi bixwezê karê bike.Ev ji xwûde daya me. Tenê rê şanî me daya. Di wê riyê de emê bi meşîn an ji ne mşeîn. Ew ji bo me ji azmûneke li dinyê ye.Lê dinyê mirov jiyanê xwe bi kuderê ve dibe, karê bibe.Ev yek di destê wî de ye. Ev ji baxtê mirov yê dinyê ye.Aliyê baxtê mirov yê di destê mirov de ye.Mirov divêt ku wê ji bîr neke. Mirov divêt ku deme ku mirov li dinyê ye, mirov ji rastiyê û rastteqîniyê dûr nekeve.Ev yek ji bo mirov û dinye mirov ye din pir girînge. Win ji zanin ku gelek nebî hatina û çûne, Dinye ji yekî ji ji wan re nema ya.Wê dinye ji me re ji nemêne.Divêt ku em vê yekê têbigihin. Ev yek ji bo me pir girînge.Ev yek divêt ku hertimî diaqilê me de bêt.Lê di vir de ez ji wa re tiştekî dî ji bêjim. Em iro li dinyê ne. Lê emê sibe ne li dinyê bin. Emê herinê dinye din. Wê caxê, ma emê dinye baş nebînin û jîn nekin?Ne, emê jîn bikin. Emê baş ji jîn bikin. Ev azmûna me ye vê dinyê ye. Mirov ku dinye qizinc neke wê axirete xwe ji qizinc neke.Xwûde dinye me kiriye destê me de û aqil kiriye serê me de û rê ji şanî med da ya.Aqil ji ber çi bûya?Ji ber ku mirov fahm bike û têbigihê.Aqil, ji bo ku dinye xwe û hewirdore xwe nas bike û fahm bike ya.Aqil, riya jiyanê ya bizanebûna.Divêt ku em ji êqil û zanebûnê wê dûr nekevin.Tembiheke xwûde ji me re ev e.Ma ne ji ber vê ye ku ewqas embiya, alim û zanist derketina? Vê yekê divêt ku em zanibin.Ji ber vê yekê divêt ku em biqasî ku li dinyê jîn dibin, wilqasî ji dinye xwe divêt ku em baş bikin.Ev yek ji bo me mirovan pir girînge”.Mihamed her weha axift û piştre wî axiftina xwe hinekî din ji berdewam kir û piştre wî axiftina kir ku bidawi bike.Piştre ne bi gelekî wî axiftina xwe bidawi kir. Mihamed deme ku axiftina xwe bidawi kir, weke ku kiribû ku zingênî ji guhê

mirovan were. Piştî ku wî axiftina xwe bidawi kir û ma sekinî bi hinekî re ji, hê bala miorvên li dore wî li ser wî bû.Piştre yê ku piştî axiftinê wî bi bêhnekê re mafê axiftinê hilda û axift şêx Birehim bû. Şêx Birehim piştî ku axift, di serê de ji Mihamed re got ”stere xwûde li ser te bê” û piştre wî axiftina xwe berdewam kir.

Deme ku ew axift, wî li ser hizre baxtewariyê hinekî sekinî. Wî ji hinekî kir ku weke Mihamed bêne ser ziman. Wî ji hewlda ku weke wî bizane bêne ser ziman. Deme ku ew ji axift, bala herkesekî li ser wî ji bû. Şêx Birehim deme ku axift, wî hinekî bahsa Nebî Nuh û Birehim Xelîl kir. Piştre li ser jiyana nebî Salih ji hinekî sekinî. Wî, deme ku axiftina xwe kir, li ser ”qanciyê” û ”Daxwaz”a mirov sekinî. Li ser wê pir demeke dirêj sekinî û axift. Li ser ”qanciyê mirov” û ”mirovên qanc” axift.Li ser vê yekê weke demekê axift.Wî weke ku diaxift ku diaxiftinê de Mihamed temem bike diaxift.Lê Mihamed pir zanebûn û zanebûna şêx Birehim bixwe ji ne weke ye Mihamed bû. Mihamed pir zanebû û dîtibû û xwandibû.Bi hizirkirinê re ji pir hizirî bû. Hertimî weke ku ew di zirektan de bê, ew dihizir de bû. Ew di serê xwe de dihizir de bû. Weke zarokekî ku tiştekî xwe winda kiribe û piştî ku winda kir ji, herê û li kurçika xwe rûnihê û bihanz bihizirê.Ew her weha wilo bû.Wilo dihizir de bû. Di wê heyeme de ji, piştî ku wî axiftina xwe bidawi kiribû, piştre ew mabû sekinî û di serê xwe de ketibû hizir de.Ew her weha bû.

Şêx Birehim deme ku bidest axiftine xwe kir, weke qaadarekê li ser qancî û neqanciyê û daxwazê mirov sekinî û axift. Li ser anî ser ziman. Ji demên berê û ji aliman ji pir minaq anîn ser ziman. Wî ji bi axiftina xwe, xwe da nîşandin ku ew çend bi zanebûna. Di wê heyeme de li wir li dore wan pir mirov hebûn.Lê deng ji yekî ji ji wan dernediket. Herkesek bi bêdeng bû û li wî di hisandi. Mîr ji bi her bala wî li ser wî bû û lê dihisand. Mihamed pir bi hey bû lê di wê heyeme de. Şêx Birehim, deme ku axift, hinekî ji dore xwe ji axift. De ne, divêt ku mirov mirov bêne ku li Xizanê ji û li dore wê mirovên zane û yên bi qadr û qiymet hebûn. Li herême Sêrtê bixwe ji mirovên zane hebûn.Hemû mirovên ku bisadan mirov li dore wan dibûna kom bûn. Yên ku bi zanebûna xwe bê û an ji bi hebûna xwe bê, yên ku weke pêşengan bûn. De ne, di nav kurdan de ji heyemên berê ve dergah hebûn. Di deme musulmanatiyê de ji dergah bi watetir bû bûn.Dergah, deme ku mirov li wan dimeyîzend, weke sazîne olî bûn. Lê di rastiyê de ji wê zêdetir sazîne serokatî ji bûn.Serokatî bi wan sazîyan di wê heyeme de pir xurt di nava civakê de dihata meşandin.Şêx Birehim bixwe ji xwedi dergah bû. Weke mîrîtiyê, çawa ku hîyayarşîyek di mîrîtiyê de hebû, her

weha di dergahan de ji hebû.Ew hiyayerşi ji, xwediyê pir kevneşopîyên pir kevn bû. Ji demên berê ve hebûna xwe berdewam dikir.

Deme ku şêx Birehîm diaxift, di wê heyeme de, weke ku ew di çerçove wê vace hiyayerşiyê de biaxivê diaxift.Wî diaxiftina xwe pir tişt dianîna ser ziman. Her tişte ku wî dianî ser ziman ji, wî di çerçove wê vace de dianî ser ziman.Herkesekê li wir ev yek di wê heyeme de fahm dikir.Ji ber ku ti kesek ne beyenî ji ji wê hiyayerşiyê re.Di civakê de têkiliyên di nava qasrê û dergahê de ji divêt ku mirov hinekî li ser bisekinê. Ji ber ku ev yek pir girînge. Weke ku di wê heyeme de şêx Birehim diaxift, herkesekî bala xwe dideyê de ti kesekî bala xwe ne dide dereke din. Herkesekî bala xwe dide wî di wê heyeme de. Şêx birehim weke qadarekê diaxivê. Piştre ew axiftina xwe bidawi dike û mêne sekinî. Piştî ku ew dimêne sekinî, êdî mîr xwe di cihê xwe de xwe diadilêne ku biaxivê.Wî ji weke ku di wê heyeme de dixwest ku biaxivê. Wilo ji wî di dihata dihata xuyakirin û fahm kirin..

De ne, di vir de divêt ku mirov hinekî li ser hiyayerşiya di nav civakê de ji mirov hinekî bi çend gotinan bê ji bêne ser ziman. Ji ber ku ev yek di vir de pir giringe. Berî ku mirov bahsa hiyayerşiya di nava civakê de bike, divêt ku mirov di wê çerçove de çend gotinan li ser hiyayerşiya qasrê û dergahan ji bêne ser ziman. Ji ber ku ew bi xwe ji, weke ku bi serê xwe xwediyê pergalakê bûn. Lê ew pergal ji, bi qasrê û dergahan hevdû temem dikir.Dergah, deme ku mirov li wan dimeyîzend, weke hin sazîyên olî dihatina berçavan. Di rastiyê de ji wilo bûn. Pîrozî hemû di wanderan de li hew bû.Li hevdû digaha hevdû. Di wir de, yên ku ew pîrozî nimînêr dikirin ji hebûn. Ew ji şêx bûn. Bi vê yekê, şêx dibû serekek di nav xalkê de. Ew ji xwe di anv xalkê de bi dergahê wilo bû.Wî hin kevneşopîyên xalkê yên ku bi salan hatibûn berdewam kirin di parastin û didana berdewam kirin.Bi vê yekê, şêx dibû mirovekî mazin di nav xalkê de.Dibû mirovekî sereke di nav xalkê de.

Dergah ne li ser qasrê re bû.Lê qasrê hertimî jê re rêz digirt. Qasr bi kevneşopiye xwe kevneşopîtir bû.Ji ber vê yekê ji, hertimî ew li pêş bû û biryarê şer ji bana û yên wekî dî ji bana qasrê dide. Qasr, her weha mazin bû.Biryarên ku ji qasrê derdiketin ji, ti kesekî ji wan re ne digot ne. Mirov wê ji bo wan biryaran çûba mirinê.Her weha ev yek pir girîng bû. Ya rastî di vir de deme ku mirov bahsa mîr bike, û girêdayina bi wî ve bike, divêt ku mirov zanibe ku hin kevneşopîyên ku ew girêdan bi wî û qasrê ve didana çêkirin hebûn. Ew kevneşopî ji li ser hin xalan ava bû. Mîr çend ku li nirx û kevneşopîye xalkê xwedi derketibana û ew parastibana, wê ji bo wî çûban mirinê. Ev yek bêgotin û nîqaş wê bihatana kirin.Lê deme ku di

nêzîkayên wî de hin nêzîkatiyên ne baş, yên weke ku ew li ber nirxên xalkê ye û wan na pareze ji, êdî piştgiriya li wî ji dihata qut kirin. Ev ev ji weke kevneşopîyekê bû.

Mîr û şêx, bi hev re du mirovên ku pir rêz ji wan re dihata girtin bûn. Wan pergalaka civakê li ser lingan dihişt bi hebûna xwe re. Lê mîr di vê yekê de bi mirovên li dore xwe re pir li pêş bû. Ew zanistê deme xwe ji bû. Û ew rêvebirê deme xwe ji bû. Ew ji van zêdetir bû. Ew hê hebû. Ew pir hebû.Deme ku bahsa mîr bê kirin, divêt ku bê zanîn ku mîr pir mazina. Wî nirxên xalkê di parast û pêşengi ji xalkê re dikir.Di vê yekê de, mîrê herî mazin mîrê bota bû. Ji ber vê yekê jê re dihata gotin ”mîrê mîran”.Ew mîrê mîran bû.

Di nav xalkê de pir kevneşopî di vê xalê de afirîne.Divêt ku mirov vê yekê zanibe.Deme ku li mîr dihata meyîzendin, dihata gotin ku ”ew çend mirovekî ku bi şopa”.Ev gotin deme ku dihata gotin, ne bi wateyekê dihata gotin.Bi çend wateyan dihata gotin.Deme ku dihata gotin, dihata gotin ku ”mîr mirovekî ku li kevneşopîyên xwe xwedi derdikeve û wan di pareze”. Wekî dî ji, ku dihata gotin, dihata ser ziman ku ”mîr xwediyê dîrokeke wê kevneşopîye ku lê xwedi derdikeve ya”. Pêre ji, deme ku dihata ser ziman, bi wateyeka dî ji, dihata ser ziman ku ”mîr bizanebûna xwe û bi wekheviyê bi rê ve dibe”.Wekhevî, ji mîr weke xalaka sereke dihata xwestin. Divîyabû ku wî newekhevî ne kiribana, li ber ti keseki.Wekhevî, xalaka sereke bû ku lê bi hatiba meyîzendin.Mîr ji, ji vê yekê re bi berpirsîyar bû.Mîr, deme ku ev yek ne kiribana, wê berpirsîyara xwe bicih ne anîbana. Wê çaxê ji, wê rexne lê hatibana girtin. Deme ku rexne lê hatina girtin, êdî wê navê wî di nav xalkê de kêm hatibana ser ziman û bi rexneyan re hatibana ser ziman. Ev yek her weha wilo bû.

Di wê heyeme de mîr bi bêdeng bû. Lê piştî ku şêx Birehim axiftina xwe bidawi kiribû, êdî wî kara xwe kir ku mafê axiftinê hildê û biaxivê.Piştî axiftina şêx Birehim re, ne bi gelekî re wî ji mafê axiftinê hilda û bidest axiftinê kir. Deme ku wî bidest axiftinê kir, Mihamed û şêx Birehim di çi çerçove de axiftibûn, wî ji xwestibû ku di wê çerçove de biaxivê.Ji xwe, deme ku wî bidest axiftinê kir ji, wî weke wan ji zanebûna û weyne zanebûna axift.Mîr mirovekî ku zanebû.Heya wî ji gelek tiştan hebû.Ew hertimî bihey bû.Ji ber ku hertimî di civata wî dihata axiftin. Deme ku di civate wî dihata axiftin, hingî, di deme axiftinê de kê çi ji kuderê hiskiri bana, di wê heyeme de ji mirovên li dore xwe re dianî ser ziman.Deme ku dianî ser ziman, êdî herkesek, pê bi agahdar dibû.Mîr ji pê bi agadar dibû. Êdî wî zanibû ku ka çi bûya. Êdî heya wî ji tiştên ku dibûn

dibû.Mîr bi vê yekê, pir li pêş bû. Li civatên mîr, ne tenê mirovên ku li wir diman di rûniştin. Hertimî mirovên ku ji deverên dûr dihatin hebûn û wan ji civate mîr re li herêmên xwe çi bûya dianî ser ziman. Di civate wî de dianî ser ziman. Bahsa herêmên xwe û xosletên herêmên xwe ji serî heya binî dikirin. Bi vê yekê mîr ji bi agahdar dibû. Di wê heyeme de deme ku mîr bidest axiftinê kiribû, her weha wî çi his kiribû, ji wan re dianî ser ziman.Herkesekî lê pir bi bal dihisandin. Mîr weke demekê li ser aliman û hizre wan anîbû ser ziman.Ya rastî wî pir xweş ji anîbû ser ziman.Mîr ji ji zanebûna xwe axiftibû.Wî ji zanebûna xwe anîbû ser ziman.Mîr, ku weke qadarekê axiftibû û bahsa hin zanist û aliman kiribû, piştre wî axiftina xwe bi dawi kiribû.Piştî ku wî axiftina xwe bidawi kir, êdî ew ma sekinî. Deme ku ew ma sekinî, êdî piştre weke bêhneke bêdengî di nava wan de çêbû. Mirovên ku li wir rûnişti bûn û dengê wan ji pir xweş bû, ew bêdengî ji xwe re weke firsandekê dîtin û êdî ew ketine devrê de û bidest gotinê kirin.

Deme ku ew ketine devrê de û bidest gotinê kirin, êdî bala herkesekî çû ser wan. Dengê wan pir xweş bû. Wan bi wan dengê xwe yên xweş û zîz re bidest gotinê kirin û kirin ku herkesek li wan bihisêne. Ew ji bi bîr û hişê xwe û anî xwe ye ser ziman, ji wan mirovên navserî xwe, yên li wir rûniştî ne, ne kêmtir bûn. Ew ji pir bi zanebûn. Deme ku bidest gotinê kirin, êdî dem bû deme wan û herkesekî bala xwe da ser wan di wê heyeme de.Mîr di cihê xwe de pir bi bêdeng ma û bala xwe da wan û li wan hisand. Şêx Birehim û Mihamed ji her weha weke wî bûn. Ew ji di cihê xwe de bi bêdeng bûn û pir bi hey li wan dihisandin. Ew mirovên dengbêj ji divêt ku mirov çend gotinan li ser wan bêne ser ziman. Berî nahaka ji me hinekî li ser wan û dengê wan yê xweş anîbû ser ziman. Lê çend ku li ser wê dengê wan yê xweş were ser ziman di cihê xwe de ya. Ya rasti, di vir de divêt ku mirov ji dengê wan zêdetir li ser bîr û hişê wan bisekinê. Ji ber ku ev yek pir girîng e. Ew mirovne wilo bûn ku bi wê bîr hişê xwe çandak li ser lindan dihiştin. Wan, ku mirov bêje dîrok di parast in, wê ne xelat bêt. Wan di bîre xwe de hertimî dîrokeke jîn û zîn di parast.Destanên xalkê yên weke Rûstemê Zal û Şahmaran, wan ji dev ji sêrî haya binî karîbûn ku jiber bênine ser ziman. Ew her weha bi bîr bûn. Wan ji vê yekê re pir xurtbûn.

Deme ku ew di wê heyeme de ketibûbûna devrê de, êdî wan bal hemû kişandibûbûna ser xwe di wê heyeme de.Wan gelek gotinên ku di wê heyeme de di civate mîr dihatina ser ziman ji, bi helbestî dianîn ser ziman.Pir dirêj digotin. Deme ku wan digot ji, pir bi hest digotin. Hestne pir mazin û xurt di dilên mirovên li dore xwe de çêdikirin.Wan bi dengê

xwe re mirov ji dinyeyekê dibirine dinyeyeke din.Her weha pir xweş û zîz digotin.

Di wê heyeme de deme ku wan bidest gotinê kiribû, Mihamed di cihê xwe de ketibû hizran de. Weke ku di serê xwe de ji wir herê derne din lê hatibû. Wilo ew di wê heyeme de dihata ber çavan.Ew, pir bi hizir dihata ber çavan.Mihamed, di wê heyeme de di serê de li derne din bû. Heya mirovên li wir yên din ji li ser dengbêjan bû. Herkesekî bala xwe dabû bû ser wan û li wan dihisand. De ne, weke çandaka civatan bû ku yên ku li civatan rûniştî bûn, deme ku hizrek hata ser ziman û an ji her weha bi dengbêjî ji bê, ku hizrek an ji hestek hata ser ziman, divêt ku heya wan li ser wê bana û lê baş hisandibana. Piştre deme ku ketina axiftinê de, divêt ku wan ne karibana ku li ser axiftibana û an ji hizre xwe bianîyana ser ziman. Ev yek ji pir girîng bû. Dengbêjek ji wan dengbêjan, deme ku yekî li ser wî bi dengbêjî tişte anî ser ziman û an ji helbestek anî ser ziman, divîya bû ku wî karibana ku pişt wî yê ku anî ser ziman re weke wî bi anîyana ser ziman.Ev yek ji hertimî ji wan dengbêjan dihata xwestin. Ji ber vê yekê, ji herêmekê çûna dengbêjekî li herêmeke din û piştre vegerahana wî, pir bi meraq li dore wî pir mirov dida hevdû.De ne, dihata hasibandin ku ew çûya herêmeke din û nahaka ew ji li civatan maya û civatan de nahaka pir hizir û her weha helbest hatina gotin. Yên ku diçûna cem wî, piştî ku ew dihat, dihasibandin ku ew, tiştên ku wî hiskirina wê ji wan re bêne ser ziman û bêje. Bi vê yekê re, di hata hatibandin ku nahaka bi wî mirovî re pir tişt û mişt hene. Lê kombûn, her weha êdî pir mazin dibû.

Di çerçove ve rewşê de mirov karê rewşeke dî ye ku pir di nav xalkê de dihata zanîn bêne ser ziman. Ew ji her weha ew bû, ku deme ku mîr diçû mêhvandariyekê an ji diçû mêhvandariye mîrekî dî weke xwe, êdî pêre gelek mirovên dengbêj diçûn. Ew ji deme ku mîr li civata hevdû dirûniştin, êdî ew diketine ber gotinê de û digotin. Deme ku digotin ji, gelekan ji wan ji dide ber hevdû. Deme ku didana ber hevdû, hingî, êdî pir xweş dikirin ji civatê re. Di deme dayîna ber hevdû de ti kesekî ne dixwest ku di bin ti kesekî de bi mêne.Her dengbêjî dixwest ku ye li ser ziman bêt, an ji ew li pêş bêt. Di civatan de li pêşbûna wan û derketina navên wan ji pir mazin bû.Vêce nexasim, ku di civatên mîran de bin.Deme ku li civatên mîran rûniştin û gotin, êdî pir bahsa wan dihata kirin.Di wê heyeme de ji pir mirov hebûn, yên ku dengbêj bûn.Yên ku ji herêmên din ji hatibûn wir hebûn.Ew ji pir bigotin bûn. Di deme gotinê de mafê pêşî yê wan bû.

Di wê heyeme de mirovên ku dengbêj ketibûbûna devrê de û digotin.Pir xweş ji digotin.Êdî ew di nav gotinê de çûbûn û xwe windakiribûn.Tenê di

serê wan de gotin hebûn.Her weha rewşeke bi gotinê di wê heyeme de gurr bûbû. Herkesekî ji li wan dihisand. Yên ku ji aliyê dengê xwe ve ne baş bûn, tenê bala xwe didana wan û li wan dihisandin.Tenê li wan dihisandin.Mihamed ji dihisand. Mihamed di rewşe xwe de bû. Deng û sahl jê dernediket. Ew pir bi hiizir bû. Ew ji, bi gotinên wan mirovên deng xweş re di wê heyeme de ketibû hizran de. Di serê xwe de demên wî yên berê di serê wî de bûn. Demên wî yên li Cizire Bota di serê wî de bûn. Ew li ser wan dihiziri. Li ser faqa Qasim û mele Silêman pir dihiizir. Ew di hişê wî de bûn. Mihamed ew ti carî ji bîr ne kirin. Hertimî ew di bîre wî de bû. Hertimî ew di hişê wî de bûn. Deme ku di kete hizran de ew dihatina bîre wî.

Weke bêhnekê têve diçê.Herkesek bala wan li ser dengbêjan ne.Şêx Birehim ji û mîr ji bala wan bi hey li ser dengbêjan ne.Ew li wan dihisênin. Yên dibêjin ji pir xweş dibêjin. Deme ku dibêjin, pir xweş di ber hevdû de diaxivin û dibêjin. Wilo di rewşekê de li hevdû tênin. Wilo ji hevdû re xweş dikin. Weke ku di wê deme gotinê de herkesek di dinyeyeke cîrokan de bê li wan dihat. Herkesek wilo bû. Herkesek her weha bi hestên xwe di serê xwe de di xwe de difirî. Herkesek di wê heyeme de, bi hestan re weke ku ne li ardê bû.Wilo dihata xuyakirin.

Wê rewşê weke qadarekê berdewam kir. Piştre ku hinekî dem têve çû, êdî hin bi hin weke ku hinekî bêdeng di wê heyeme de bû. Mirovên ku digotin ji gelek ji wan bêdeng man. Piştre bi bêhnekê re hema bêja yên ku diaxiftin û digotin hemû ji bêdeng man. Piştre ne bi gelekî re fêkî û tiştên wilo hatina ber wan.Deme ku fêkî hatina ber wan, êdî wan ji dawi li gotina anî. Deme ku wan dawi li gotina xwe anî, êdî bêdengî çêbû û êdî hin bi hin axiftin bû.Mîr di wê heyeme de yê ku piştî gotina dengbêjan re axift, ew bû.Deme ku mîr axift, mîr, pêşî sipasiyak ji wan re kir.Piştre ma skeinî. Yê wî ji heya wî li ser wê çûn û hatina ku di nav wan de dest pê kir bû. Li wan mirovên ku di nava wan de diçûn û dihatin dimeyîzend. Weke qadarekê wê rewşê hebûna xwe berdewam kir. Piştre ne bi gelekî re ku wan mirovên ku suxratî ji wan re dikir ku suxratiya xwe di wê heyeme de bi dawi kirin, êdî xwe ji navê dana alîkî û piştî ku wan xwe da alîkî, êdî mirovên ku li wir rûniştîbûn. Bi keremkirina mîr re li dore sofrên li nava wa hatina danîn bûna kom.Ku her weha li dore sofran bûna kom, êdî bidest xwarina fêkîyên xwe kirin. Deme ku bidest xwarina fêkîyên xwe kirin, êdî wilo zêde di wê heyeme de deng ji wan derneket. Lê weke bênekê bêdengî çêbû.Lê wê bêdengiyê wilo zêde berdewam ne kir. Piştre yê ku axift û bi axiftina xwe re bal kişanda ser xwe re mîr bi xwe bû.Deme ku mîr axift, êdî hinek

mirovên din ji yên weke şêx Birehim ji pêre ketine axiftinê de û di ser sofre fêkî de her weha di nava wan de danûstandinak dest pê kir.

Wê danûstandinê weke qadarekê berdewam kir.Mihamed di wê heyeme de li nêzîkî şêx Birehim bû. Ew ji, deme ku wî xwe dabû ber sofrê li nêzîkî şêx Birehim mabû.Deme ku danûstandinê di nava wan de dest pê kiribû, êdî ew ji tevlî bûbû û wî ji çend gotin di wê heyeme de gotibûn.Lê wî ji çend gotinan pêve ti gotinên din ne gotibûn.Ew wilo zêde ne axiftibû.Lê şêx Birehim pir diaxift.Ew xweşgotin bû.Deme ku diaxift ji, dengê wî li mirov xweş dihat.Ji ber vê yekê ji, deme ku diaxift, di deme axiftina wî de bal bi carekê re diçûna ser axiftina wî ye ku wî dikir.Di wê heyeme de ji wan pêve wilo zêde deng ji ti kesekî din dernediket. Herkesek bi bêdeng bû.Yên ku bêdeng bûn, li yên ku diaxiftin dihisandin. Her weha di wê heyeme de rewşek afirî bû.Mihamed di serî de, deme ku di nava wan de axiftinê dest pê kiribû, axiftibû û çend gotin wî gotibû.Lê piştre ku hinekî dem têve çûbû bû, êdî ew bi bêdeng mabû.Ew ji ketibû rewşe hisandinê de.Lê Şêx Birehim derfet ne dida wî ku ew bêdeng bi mêne. Deme ku ew bideng dima, li wî dimeyîzend û diaxift. Bi vê yekê re ji, êdî bal wî ji diçû ser axiftinê û deme ku bala wî diçû ser axiftinê, êdî wî ji di wê heyeme de çend gotin di gotin.Bi vê yekê ew di serî de çend caran axiftibû û çend gotin wî gotibûn.Piştre ku dem têve çûbû bû ew mabû bêdeng.Ew bêdengiyê ku pêre çêbû bû ji bala şêx Birehim kişandi bû. Deme ku bala wî çûbû ser wî, êdî Mihamed ji ew yek di wê heyeme de farq kiribû.Bi farqkirinê re Mihamed di wê heyeme de weke ku were xwe lê hatibû.Deme ku wilo lê tê, êdî ew di cihê xwe de xwe di diadilêne û weke ku wê ew biaxivê li dore xwe dimeyîzenê di wê heyeme de.

Hin bi hin ji xwarina wan ye fêkî ji dihata ber dawiyê.Lê wan xwarina xwe ye fêkî bi axiftina xwe ye di nav hevde de dikir, dirêj dikir.Her weha bi hev re diaxiftin û dixwarin ji. Wê rewşê weke qadarekê berdewam kir.Piştî qadarekê, piştre êdî bi hev re dev ji xwarina xwe ye fêkî kirin û bi hev re axiftina xwe berdewam kirin.Deme ku wan dev ji xwarina xwe qaraha, êdî di cih de hinek mirovên ku suxratiya wan dikirin, di cih de hatina hundur û di cih de bidest rakirina sofrê ji ber wan kirin. Deme ku wan dest pê kir, êdî di cih de wê rakirina wan sofre ji ber wan rakir. Piştre ku sofrê ji ber wan rabûn, êdî bi hev re careke dî ketine axiftinê de.Bi hev re bidest axiftinê kirin.

Deme ku wê carê, piştî fêkî bidst axiftinê kirin, hingî, wilo zêde axiftin êdî di cih de ne bûn. Hinekî bêdengbûn bû.Lê wê bêdengbûnê wilo zêde berdewam ne kir.Di cih de mîr kete devrê de û axiftin wî da dest pê

kirin.Deme ku mîr kete devrê de û bidest axiftinê kir, hingî, di cih de yê ku pêre bidest axiftinê kir û pêre bidest axiftinê kir û danûstandin pêre da dest pê kirin, şêx Birehim bixwe bû.Wî, deme ku bi mîr re bidest axiftinê kir, hingî, gelek mirovên din ji tevlî wan bûn û axiftin. Êdî di wê heyeme de axiftina wan dest pê kir. Êdî di cih de dan û standina wan di nava wan de dest pê kir.Êdî axiftin di nava wan de bû. Mihamed ji piştre ne bi gelekî re tevlî axiftina wan bû. Ew ji kete nava axiftinê de. Deme ku her weha danûstandinê di nava wan de dest pê kir, êdî hin bi hin axiftina di nava wan de gurr bû. Bi gurrbûnê re nîqaş û danûstandin zêdebûn.

Deme ku nîşqaşên wan zêde bûn, êdî bi hev re ketineê axiftinê de. Ku di wê heyeme de weke qadarekê bi hev re diaxivin, êdî piştre ne bi gelekî re dise dengbêjên civatê dikevine devrê de û ew bidest gotinê dikin. Deme ku ew dikevine devrê de û bidest gotinê dikin, êdî di civatê de bêdengbûn çêdibe. Herkesek li dengêbêjên ku dibêjin dihisêne. Herkesek heya xwe dide ser wan di wê hyeeme de. Mihamed, berî ku dengbêj bikevine devrê de, deme ku mîr bi nêhte ku axiftinê bide dest pê kirin axiftibû û şêx Birehim ji tevlî wî bûbû, hingî, ew axiftibû û çend gotin anîbû ser ziman.Di wê heyeme de deme ku Mihamed axiftibû, bala çûbû bûna ser Mihamed. Mihamed, lê ew zêde dirêj ne axiftibû.Ew kin axiftibû.Ew deme ku axiftibû, di serî de, weke ku çawa ku deme ku şêx Birehim axiftibû û şikre xwe ji bo xwarinê anîbû ser ziman ji wî re, wî ji deme ku bidest axiftinê kir, di serî de wilo kir û piştre bidest axiftinê kir.Piştre hinekî axift.Lê Mihamed zêde ne axift. Piştre axiftina kin birrî û ma sekinî di cihê xwe de di wê heyeme de.

Mihamed di wê heyeme de di cihê xwe de ne rehet di sekinî. Weke ku hinekî nerehetiye wî hebû. Ew wilo dihata berçavan. Deme ku mirov lê dimeyîzend, mirov ev yek pêre pir baş û qanc kifş dikir. Mihamed ne rehet bû. Şêx Birehim ji berê ve ev yek pêre kifş kiribû û bala wî çûbû bû ser wî. Di wê heyeme de ji ev yek pêre kifş kiribû.Lê di wê heyeme de, deme ku hinek axiftin bû û piştre axiftin sekinî û mirovên ku dengê wan xweş bû ketine devrê de û gotin û pêre herkesek ma sekinî û heya xwe da ser mirovên ku di gotin, hingî, Mihamed weke ku di cihê xwe de xwe di wî alî û dianî vî alî.Wilo ew dihata berçavan. Her ku kudere wî diêşaha, di wê heyeme de pir bidest êşendinê kiribû.Ev yek di wê heyemê de pir baş û qanc di hata berçavan. Lê Mihamed ti tiştek di wê heyemê de ne digot. Dima sekinî di cihê xwe de. Ne diaxift.Ku yek di wê heyeme de pêre axiftibana ji, hebû ku ew ne axiftibana. Wilo weke ku bi êşe di xwe de ji xwe çûbû bû. Wilo dihata xuyakirin.Deme ku Dengêbêj ketine devrê de û

bidest gotinê kirin, êdî piştre ne bi gelekî re bala şêx Birehim bitahahî çû ser Mihamed. Ji ber ku Mihamed li berçav pir ne rehet bû. Wilo dihata berçavan.Piştî ku bala wî çû ser wî, êdî weke qadarekê bala wî li ser wî ma. Lê şêx Birehim ti tiştek negot.Mihamed weke ku dixwest ku xwe bigirê û nehêle ku ti kesek bibîne ku ew ne rehete.Wî ji ji ber vê yekê li ber xwe dide. Şêx Birehim ev yek pêre kifş dikir. Wî ji, ji ber ku bala herkesekî li ser dengbêjan bû, nikaribû ku biaxiftina û ji Mihamed bi pirsiyana ku ka çi wî heya.Kengî dengbêjan gotina xwe sekinandin, hingî, êdî wê karibû ku bi pirsiyana.Lê hê wan digot û heya herkesekî li ser wan bû. Wan bi gotina xwe dilê herkesekî zîz dikir. Herkesek weke ku bi dengê wan ji xwe herê li wan hatibû.Mîr ji di wê heyeme de weke ku di serê xwe de ji xwe herê lê hatibû. Ew ji dihizir de bû. Ew ji bi dengê wan dengbêjên ku dengê wan pir xweşe, weke ku ji xwe çûbû û ketibû hizran de bihazn.Her weha rewşe wî ji dihata berçavan. Mihamed ji dikir ku bala xwe bide ser wan.Dikir ku bide nîşandin ku bala wî bihey li ser gotina wan dengbêjan na.Wî wilo hewldide di wê heyeme de..

Wê rewşê weke qadarekê berdewam kir. Dem ji bi gotina wan dengbêjan re çawa çûbû, ti kesekê li wir weke ku ne difarqê de bû. Dem hinekî dereng ji bûbû. Dem pir buhurtibû bi ser gotina wan dengbêjan re. Civat bi wan re pir xweş bûbû. Pir ketibû rewşeke pir xweş de. Ji ber vê yekê ji, êdî farq ne kiribûn ku ka dem çawa buhurtiya.Lê dem hinekî buhurtibû. Hatibû ber derengbûnê. Hinekî dî ji dem buhurtibana, wê dem hatibana ber danarazana. Wî dem hatibana ber deme razana.

Piştre ku dem her weha hinekî têve çû, êdî piştre ne bi gelekî re mirovên dengbêj di cihê xwe de mana sekinî û piştre civatê di nava xwe de hêdî hêdî bidest axiftinê kir. Piştî gotina wan dengbêjan, çend ku dem hatibû ber derengbûnê ji, nîqaşaka pir gurr di nava wan de dest pê kir. Nîqaşaka pir mazin di nava wan de dest pê kir. Mîr û şêx Birehim ji wê nîqaşa ku bû re bi axiftin û danûstandinên xwe re pêşengî kirin.Mihamed ji car bi car tevlî wan bû.Lê Mihamed nikaribû ku wilo zêde tevlî bibe. Deme ku ew axift di wê heyemê de, hingî, mîr ji pir baş kifş kir ku Mihamed ne rehete. Lê wê carê deme ku mîr her weha kifş kir ku bi Mihamed re ne rehetbûn heya, êdî wî weke şêx Birehim ne kir û ne sekinî û wî di nav civatê de ji Mihamed pirsî ku ka çi wî heya. Deme ku mîr pirsî, hingî, mîr herweha pirsî.”seydeyê min, ez dibe qey ti hinekî ne rehetî. Min ev yek bi te re kifş kir. Seydeyê min çi wî heya.Bila ji me re bêje da qana em ji zanibin”.Mîr weha axift û piştre ma sekinî. Lê deme ku mîr weha axift û ma sekinî, piştre di cih de bal bi carekê re çûna ser Mihamed. Şêx

Birehim ji, bala wî bi axiftina mîr re çû ser Mihamed û lê meyîzend.Deme ku şêx lê meyîzend, hingî ji, hê ku nerîne xwe jê ne birrî, bidest axiftinê kir û her weha ji Mihamed weke ku bi pirsê axift.”Raste, mîrê min rast kifş kir. Min ji kifş kir ku seydeyê min hinekî ti ne rehetî. Bala min ji berê li ser te ye”.Şêx Birehim weha got û ma sekinî. Balên mirovên li dorê ji li ser Mihamed hatibûbûna miftekirin.Herkesekî avirên xwe dabûbûna ser wî û lê dimeyîzendin. Lê ti gotin ji di wê heyeme de ji devê ti kesekî dernediket. Çavên herkesekî li deve Mihamed bû ku gotinek jê derkeve.Mihamed haya wê bêhnê ne axift.Piştre bi bêhnekê re Mihamed mafê axiftinê girt û bidest axiftinê kir û deme ku bidest axiftinê kir ji, her weha axift.”Ez ji nizanim, lê ber dilê min cerna tê guvaştin. Nizanim ji ber çiya. Dibêt ku ji ber dil bêt.Dibêt ku ji ber tiştne din ji bêt.Pîr bûn ji di nav de heya”.Mihamed deme ku wilo got, piştre ma sekinî.Lê deme ku ew ma sekinî, di cih de mîr mafê axiftinê girt û her weha axift. ” ne seydeyê min, bahsa pîrîtiyê neke. Ti hê ne zêde pîr î. Te hê gelekî di nav me de weke mazinê me bimêne”.Mîr wilo got û ma sekinî.Deme ku mîr ma sekinî, êdî Mihamed mafê axiftinê girt û weha bersive wî da.”ew xwûde zane. Ew ji rastiya xwûde ya.Lê em hertimî ji rastiya xwûdeya xwe razî ne.Ew ya rast zane.Ku ti tiştek bibe ji ne belesebep e. Hertişt sebebekê wê heya. Divêt ku mirov vê yekê zanibe.Hertişte bi sebebe wê re xwûde dîrokeke wê ji afirandiya. Hertişt dîroke wê ji heya. Em ji di nav wê de ne.Rast ji wilo ya.Rasti ji bi sebep û dîroka.Lê ew sebep û dîrok ji li gor rastteqîniyê ya. Divêt ku mirov hewl bide ku bigihê rastteqîniye wê. Kengî, ku çi ji bê, ku mirov xwe gehanda rastteqîniye wê, hingî ji, mirov sebep û dîroke wê bibîne û têbigihê û fahm bike. Ev hemû bi hev ve girêdayîna. Rastiye me ji wilo ya ..”.Mihamed wilo axift û got û ma sekinî di cihê xwe de di wê heyeme de.Piştî wî re Mîr mafê axiftinê girt û her weha got,”ti rasti dibêje seydeyê min, ti ji min û me bizanetirî.Lê ti ne rehetî, ka ti tiştekî ku em bikin çiya?”. Mîr wilo got û ma sekinî di cihê xwe de. Weke ku li bendî bersive Mihamed bisekinî ma sekinî.Şêx Birehim ji li ser wan gotinên ku Mihamed kiribûn di serê xwe de dihizirî. Ew ji weke bêhnekê di hizirê. Piştre bi bêhnekê re, ku Mihamed dike ku biaxivê, di wê heyeme de, hê ku Mihamed gotina xwe ye pêşî ne gotî Şêx Birehim mafê axiftinê berî wî dihildê û dike ku biaxivê û hinekî li ser wî biaxivê û hinekî li ser wan gotinên wî yên bi zane ji hizre xwe ye di serê xwe de bêne ser ziman.

Şêx Birehim ku her weha xwe ji ber axiftinê amede kir, êdî piştre ne bi gelekî re bidest axiftinê kir û axift.Ku axift ji, bi zêdeyî li ser axiftinên Mihamed yên ku wî anîbûn ser ziman axift.Li ser wan gotinan, wî gotinên

xwe anîn ser ziman. Ew di aslê xwe de pir bi aşq bû ku li ser gotinên ku bihizir biaxivê.Pir kêfe şêx Birehim dihat ku li ser zanebûnê biaxivê.Ew zanebûna wî hebû. Hertimî ji, deme ku diaxift, ku li ser çi axiftibana ji, wî hizre xwe li ser zanebûnê ji, ku bigotinekê ji bana dianî ser ziman.Ew mirovekî weha bû.Şêx birehim, di rastiyê de xwediyê hizreke ku pir mazin bû. Ew di hizre xwe de pir mazin bû.Wî pir li ser hizir dixwand.Li ser hizre zanistên deme xwe û yên berî deme xwe pir dihizirî. Hizre wan pir caran ku diaxift, diaxiftina xwe de dianî ser ziman. Wî pir girîngî dide zanebûnê.Ew bixwe ji divêt ku mirov bêne ser ziman, zanistekî ku pir mazin bû.Li ber destên wî pir faqih û sofîyên ku di sekinîn hebûn.Hemû ji ji ilm û zanebûna wî fêr digirtin.Ew her roj li nav wan dirûnişt û weke ku fêran bide wan ji wan re diaxift.Ew mirovekî ku wilo bû.

Di wê heyemê de deme ku ew axift, ew hinekî li ser zanebûnê axift.Mihamed diaxiftina xwe de gotibû ku "rastî bi sebep û dîroka.Lê ew sebep û dîrok ji li gor rastteqîniyê ya".Şêx Birehim hinekî li ser van gotinên wî rawastaha bû. Pir dirêj ji li ser wan hizre xwe anîbû ser ziman.Şêx Birehim, deme ku ji hizre Mihamed axift û bahsa rastiyê û dîrokê kir, hingî, êdî ew ne sekinî û wî hinekî dî ji anî ser ziman.Berî wê kêlîkê, deme ku Mihamed axiftibû ji, Mihamed diaxiftina xwe de hinekî bahsa dîrokê kiribû. Deme ku Mihamed bahsa dîrokê kiribû, êdî wî diaxiftina xwe bahsa zanist û aliman û dîroka wan kiribû. Di wê heyemê de deme ku Mihamed axift, hingî, wî diaxiftina xwe gotinak gotibû û ew gotin ji pir li serê şêx Birehim aliqî bû.Ew ji her weha "hizre dirokê ji ne bê dîroka û dîrok ji ne bê rastiya. Û pêre divêt ku mirov bêje ku rasti ji ne bê dîroka".Ev gotin li ser wî aliqî bû.Ev gotin pir di serê wî de mabû bû.Deme ku ew axiftibû ji, hinekî wî hizre xwe li ser vê yekê ji anîbû ser ziman. Mihamed deme ku axiftibû, wî di nava axiftina xwe gotibû "..nahaka rastî çiya? Divêt ku mirov vê yekê zane bêt û li ser bizane bêt.Zanebûn divêt ku bizane û bi zanebûna xwe were ser ziman". Zanebûn çawa bi zanebûna xwe were ser ziman.Ev pirsek bû.Ev pirs ji li ser şêx Birehim aliqî bû. Ew di serê xwe de pir li ser dihizirî.Mihamed li ser zanebûnê û hizre zanebûn ji axiftibû. Li ser wê ji ne bê zanebûn bû.Wî bi zimanekî xweş anî bû ser ziman.Bi wî zimanê ku wî pê anîbû ser ziman, her gotina ku ji devê wî derketibû di serê mirovên li dore wî de mabû. Mihamed di deme ku axiftibû de gelek gotin anîbûn ser ziman, û her gotina ku wî anîbû ser ziman, wî dilxavî ne kiribû ku wan ji bêne ser ziman. Di derbarê wan de ji çend gotinan bêne ser ziman.Wî pir anîbû ser ziman. Bi vê yekê, êdî ew hinekî dirêj axiftibû.

Şêx Birehim, gotinên ku Mihamed diaxiftina xwe anîbûbûna ser ziman yên weke"zanebûn", "aqil","rastî" û"rastteqîni",wî hizre xwe li ser van bêjeyan anîbû ser ziman.Bêja "rastteqîniyê" di civatan de pir dihata ser ziman. Weke ku gotinaka kevneşopî dihata ser ziman.Di nava zanistên kurd yên demê de pir li ser dihata axiftin. Her zanistên kurd ku li ser vê bêje hizre wan ne bana weke ku ne dibû.Her weha pir bêjeyeke ku dihata ser ziman.Deme ku dihata ser ziman ji, weke ku bi hatina xwe ye ser ziman re, awayekê jiyanê ji ku mirov wê çawa jîn bibe ji dianî ser ziman. Deme ku ew bêja dihata ser ziman, hingî, ew awa di serê mirov de bi xweza awa dibû.Bi vê yekê, divêt ku mirov bêja rastteqîniyê pir baş û mazin bêne ser ziman.

Şêx Birehim, di wê heyeme de diaxivê û weke qadarekê diaxivê û her weha li ser zanebûnê û pir mijarên din yên ku di nav wan de hatina ser ziman hizre xwe têne ser ziman. Demeke dirêj ew di wê heyemê diaxivê. Piştî ku ew demekê her weha diaxivê, êdî piştre ne bi gelekî re ew axiftina xwe bidawî dike û di sekinê.Deme ku disekinê, piştî sekinandina xwe re ew avirên xwe dibe ser Mihamed.Li Mihamed dimeyîzenê. Deme ku ew avirên dibe ser Mihamed û li Mihamed dimeyîzenê, hingî, ew dibîne ku wa Mihamed ji wê li wî dimeyîzenê. Ew ji wê yekê di wê heyemê de farq dike..

Deme ku ew li Mihamed dimeyîzenê, weke bêhnekê li Mihamed dimeyîzenê.Bidil di meyîzenê li Mihamed.Mihamed di wê heyemê de li dimeyîzenê.Her weha weke bêhnekê ew li hevdû dimeyîzênin.Lê di wê heyeme ku ew li hevdû dimeyîzênin de, ne Mihamed ji wî re ti tiştekî dibêje û ne ji Mihamed re ti tiştekî dibêje. Her weha tenê ew li hevdû dimeyîzênin.Piştî ku şêx Birehim axiftina xwe bidawi kir û ma sekinî, êdî pişt wî re yê axift ji, mîr bi xwe bû. Mîr hinekî ji ne rehetiye Mihamed anî ser ziman û jê re şifabûn xwest û piştre wî ji hinekî hizre xwe li ser wan mijarên ku ew di wê heyeme de li ser diaxiftin, yên zanebûnî, wî ji hizre xwe anîbû ser ziman. Wî ji hizreke xwe anî ser ziman. Weke bêhnekê ew ji axift. Mîr di wê heyeme de axiftina xwe zêde ne kir.Wî axiftina xwe kin birrî.Piştî ku wî axiftina kir û ma sekinî, piştre hinekî mirovên din ji, ku li wir li wan rûniştî bûn, mafê axiftinê hildan û axiftin. Wan ji hizre xwe anî ser ziman.Bi vê yekê, êdî di demeke ku mirov jê re nikarê bêje kin, wê axiftina di nav wan de ye bi zanebûnî berdewam kir.Mihamed piştî ku mîr axiftibû û ma sekinî û piştre hinek mirovne din pişt wî re axiftibûn, di wê heyemê de ew ji tevlê axiftinê bûbû bû. Wî hinek gotinên din ji anîbûbûna ser ziman. Deme ku şêx Birehim dibîne ku Mihamed diaxivê, êdî ew ji

diaxivê.Şêx Birehim, rêz û hûrmeteke wî ye mazin ji Mihamed re heya.Her deme ku Mihamed diaxivê, ew ji dixwezê ku biaxivê û diaxivê. Bi vê yekê di wê heyeme de demeke axiftinê ye pir dirêj di nava wan de afirî bû.Mihamed weke ku dixwest ku biaxivê.Ew pir hizir di serê wî de hebûn.Her cara ku mirovên li dore wî diaxiftin, wî di dilê xwe de dixwest ku biaxivê.Deme ku dixwest bi axivê ji diaxift.Lê nikarîbû ku wilo zêde biaxivê. Di wê heyeme de wê ne rehetiye pêre derfet jê re ne dihişt ku ew di wê hyeeme de bi rehetî biaxivê.Mihamed li dore wî ji ev yek jê farq dikirin. Mihamed di ser xwe de pir mazin bû.Di serê wî de pir hizir hebûn.Her hizre dihata ser ziman, wî ji di serê xwe de ew hizir dikir û li ser di serê xwe de hinek hizrên din ji diafirandin. Vêce deme ku wî hizir di serê xwe de diafirand, piştre di cih de dilê wî dixwest ku bêne ser ziman.Jê vê yekê re ji weke ku hinekî kelegermî ji dibû.Lê deme ku mafê axiftinê dihilda û diaxift, êdî êşe laşê wî, jê re dibû astang. Bi vê yekê, êdî ew wilo zêde dirêj nikaribû ku biaxivê.

Mihamed, di serê xwe de pir bi hizir bû.Her Mijara ku ew di wê heyemê de li ser diaxift, ew di serê xwe de li ser bihizir bû.Li ser waqif bû.Ji ber vê yekê ji xwestina axiftinê pêre çêdibû. Mihamed li dore wî ji bala wan pir li ser wî bû.Herkesekê li wir ji, zanî bûn ku Mihamed çend bi zanebûna.Li ser wê yekê pir bi zanebûn bûn. Gelek caran, deme ku ew diaxiftin û hizre dihata hole û herkesekî li ser hizre dianî ser ziman ji, piştre bal diçûna ser Mihamed ku ka ew çi dihizirê û hizrê wî çiya.Her weha meraqak ji bi mirovan re çêdibû.Ku ji wî hizre wî his dikirin, êdî piştre hinekî weke ku rehetbûn çêdibû bi mirovan re.

Di wê heyeme de axiftina di nava wan de weke qadarekê berdewam dike.Dem ji hin bi hin bi ber derengbûnê ve diçê. Mirovên li wir ji wê yekê hîs dikin.Deme ku mirov li wan di meyîzenê, mirov wê yekê fahm dike.Lê ti kesek di wê heyeme de weke ku nexwezê ku li ser wê yekê bihizirê.Ji ber ku herkesek di wê heyeme de di axiftinê de û nîqaşê de germ bûya.Her kesek bi wê yekê weke ku ji xwe çûya. Wilo rewşe wan tê berçavan.Mirovên ku berî hingî bi bêhnekê ji wan re di stirandin, di wê heyeme de gelek ji wan ji diaxiftinê de bûn.Deng ji wan ji dihat.Lê wê naqlê dengê ku ji wan dihat ne dengê stirandina wan bû. Dengê axiftina wan ye ku wan dikir bû.Dengê wan ji axiftinê re ji pir xweş bû.Deme ku diaxiftin, weke ku bistirênin diaxiftin di wê heyeme de.Dengê wan wilo li mirov dihat. Weke ku helbestekê bixwênin di axiftin di wê hyeeme de.Lê ew zêde ne diaxiftin.Di wê heyeme de yên ku herî zêde diaxiftin, mîr, Mihamed, şêx Birehim û çend mirovên din yên pir pîr bûn. Deme ku ew

diaxiftin ji, her kesekê li wir ji, bi hey bala xwe dide wan û li wan dihisand.Axlabê ji herkesekê li wir dixwest ku dengê Mihamed his bikin. Mihamed zanistekî pir mazin bû.Ew alimakî pir mazin û bi rêz bû.Ku navê wî ji dihata ser ziman, bi rêz û hûrmet bahsa wî dihata kirin. Di wê heyeme de, vêce ew li wir li civatê bû û li ber çavên herkesekî bû. Deme ku di wê heyeme de diaxift ji wilo zêde dirêj ne diaxift.Kin diaxift.Ji ber ku di wê heyeme de ne rehet.Herkesekê li wir ew yek pêre kifş kiribûn..

Dem, ku hinekî dî ji têve diçê, êdî hin bi hin hizre rabûnê dikeve serê mirovan de ji.Bi vê yekê re, êdî hin bi hin axiftin ji kêm dibûn.Mîr ji ev yek di wê heyeme de kifş dikir.Lê mîr hê diaxiftinê de bû.Hê ew diaxift bi mirovên li dore xwe re û mirovên li dore wî ji lê dihisandin. Heya mîr ji demê weke ku hebû.Lê weke ku wî di xwe de ne dianî ser ku heya wî jê heya, ji ber ku pir diaxiftinê de bû.Şêx Birehim weke bêhnekê axiftibû û mabû bû sekinî.Ew êdî hinekî bêdeng mabû bû. Mihamed ji di wê heyeme de bi bêdeng bû.Ew di rewşe xwe de weke ku hê bêhtir di ne rehetiyê de bû.Rewşe wî wilo dihata berçavan.Ev yek ji pêre pir baş dihata berçavan.Şêx Birehim, deme ku ew bi bêdeng mabû, di wê heyeme de wî bi hey bala xwe dabû bû ser Mihamed.Lê dimeyîzend. Di civatê de di wê heyeme de hê gelek mirovên din ji bala wan li ser Mihamed bû. Li Mihamed dimeyîzendin.Di civatê de pir mirov hebûn.Dîwana mîr pir mazin û dirêj bû.Ew dîwana mazin û dirêj, tişî zilemên pîr û zane û navserî xwe bû. Hemû ji deme ku diaxiftin, bi bal li wan dihata hisandin.Her weha mirov karê vê bêje.

Di civate xwe de mîr, çend ku pîr ji bana û ciwan ji bana, divîyabû ku yê herî navserîtirî xwe bana.Yê ku herî zêde li ber çavan bihatana girtin bû.Divirde divêt ku mirov gotinekê li ser vê xalê bêne ser ziman.Ji ber ku pir girînge. Berî nahaka me bi hinek xalên din ve girêdayî hinekî anî ser ziman.Lê divir de divêt ku mirov bi serê xwe bêne ser ziman.Ji ber ku ev yek pir girînge.Mîr, ji bo ku bibe mîr, jê re pir zanebûn û “girenbûn” lezim e.Girenbûn, bi zanebûn û axiftina xwe re di cihê xwe de mazinbûn tê hasibandin. Her weha tê ser ziman.Mîr ji divêt ku wilo bana.Deme ku dihata meyîzendin, divîyabû ku mirovekê ku biasl û zanebûn hatibana dîtin.Bi vê girêdayî mirov karê bêne ser ziman, ku mîr divîyabû ku di şaxsiyeta xwe de ev yek dabana nîşandin. Mîr, berî ku bûbana mîr, deme ku wê bibe mîr, hingî, mirovên li dore wî wê hemû lê bibine kom û wê mîr ji wan bi peyive bizanebûna xwe ye ku di serê wî de heya. Deme ku axift ji, hingî, mirovên ku lê dihisênin, di axiftina wî de li çend xalên girîng digerihin.Ew xal ji her weha girêdanbûna wî ye bi nirxên wî ve, zanebûna

wî, naskirina mirovan û hwd jê dihata xwestin.Mîr divîyabû ji şexsiyeta mirovan fahmkiribana.Divîyabû ku wî mirov bi xosletên xwe ve naskiriban. Ev yek pir girîng bû.Ji bo mîrbûnê û mîrîtiyê ev yek pir girîng bû. Kijen şex û şexsiyet başa an ji ne başa, divîyabû ku wî tê derxistibana.Ev yek ji mîr dihata xwestin.Civat ji bo vê yekê pir cihne girîng bûn.Di nava xalkê gotinak hebû. Ew gotin ji her weha bû. Ji bo mirovan û naskirina wan dihata gotin. Dihata gotin ku “mirov çawa ya, başa an ji ne başa, di axiftin xwe de û di gavaêtina xwe de kifşa”.Ji ber vê yekê ji, pir li axiftin û gavavêtina mirov dihata meyîzendin. Mirov deme ku diaxift, ku li ber mîr bana an ji li civateka wilo girîng bana, li axiftin û li gavavêtina xwe pir bi hey dima.Pir li ser kirinên xwe yên ku dikirin û yên ku wê kiribana di sekinî. Ku diaxift, pir dihizirî û diaxift. Gotina xwe pêşî di serê xwe de amede dikir û piştre digot.Deme ku diaxift ji dixwest ku gotina wî bizanebûn bêt û di cihê xwe de bêt.Ev yek pir girîng bû. Ji xwe deme ku mirov li ber mirovên zane yên weke Mihamed û şêx Birehim ji bana, ew ji hê bêhtir balbûnaka maztir ji mirov dixwest.Ew mirovên zane bûn. Hê ku mirov gotinak gotibana, wan wê fahm kiribana ku ka mirov çend bi zanebûna.Ew têgihiştina wan mazin bû.Ew bi zanebûna xwe li ser herkesekî re bûn.

Di wê heyemê de ji wilo bû.Mîr diaxift û herkesekî lê dihisand.Hisandin ji bi serê xwe di vir de divêt ku bi bal mirov li ser rawastihê.Ji ber ku pir girîng bû.Mirovên zane di hisandina xwe de ji kifşa. Her weha ev yek ji weke baweriyakê di nava xalkê de ji hebû.Deme ku bahsa zanistan dihata kirin, ev gotin dihata ser ziman. Deme ku bahsa zanistan dihata kirin, dihata gotin ku “dihisandin û zanebûna xwe de pir mazin bû”.Her weha bahsa wan dihata kirin.  Bi vê yekê li ser wan dihata sekinandin. Biqasî ku ji zanebûnê re qadrek û qiymetek hebû, wilqasî ji ji hisandinê re heman qadr û qiymet hebû.Zanebûn bi felsefe dihata ser ziman. Hisandin ji weke nêzîkatiyaka felsefîk dihata ser ziman û lê dihata nerîntin.Di wê demê de her weha ev yek li pêş bû.Mirovên zane, nêzîkatiya wan ye hisandinê bizanebûn bû.Nêzîkatiya wan ye hisandinê bifelsefe bû.Ev bawerî hebû.Deme ku mirov li civatên hevdû dirûniştin, ev yek ji nêzîkatiyên hevdû dixwestin.”Mirovekî zane di zanebûna xwe de kifşa.Mirovekî dihisandina xwe de başa ji kifşa”.Mirovê ku zanibe bihisêne, ew mirov mirovê ku dizanebûna xwe de kur e. Deme ku ji herêmekê ji mirov diçûna herêmeke din mêhvandariya hevdû, deme ku li civatên hevdû dirûniştin, di vê xalê de pir li gavavêtinên hevdû dimeyîzendin. Pir li hevdû bi bal dibûn. Bala wan li ser hevdû bû. Di wê

rewşê de ji ti kesekî ne dixwest ku xwe ne baş bide nîşandin. Ji ber vê yekê, herkesek bi bal li ber hevdû tevdigerehe.Kî ji bana, deme ku çûna cem hevdû, zanîbûn ku wê bi nêzîkatî wê çi ji hevdû bixwezin.Di wê farqe hevdû de bûn.Di wê zanebûna hevdû de bûn.Ji ber vê yekê ji zanibûn ku wê li ber hevdû tevbigerihin. Deme ku diçûna ber mîr û an jî ber zanistekî jî, herkesekî li gor xwe di têgihiştinekê de bû ku ka w çawa tevbigerihê. Di wê heyeme de li dîwana mîr pir mirov hebûn. Deme ku mîr diaxift, çawa wê tevgerehaban, wan di wê heyeme de zanibû. Deme ku mirovekî zane weke şêx Birehim an ji Mihamed axiftibana ji wê çawa tevgereheban, di wê heyeme de wan zanibû û li gor wê zanebûna xwe tevdigerehan..

Di wê heyeme de civate wan weke bêhnekê dî bi axiftinê berdewam dike.Di wê heyeme axiftinê de ji mîr bi zêdeyî diaxivê.Wekî dî ji yên ku zêde diaxivin ji nemênin.Herkesek weke ku bi hisandina xwe ji mîr re´bêjin dem hinekî bûya dereng´dihisênin.Mîr ji ev yek fahm dikir.Mîr deme ku diaxift, pêre hinek mirovên pir diaxiftin. Ew ji mirovne zane û pir pîr bûn. Rêzeke mazin ji wan re ji hebû.Ku wan mirovên pîr tiştek bigotina, mîr ji di nav de wê ti kesekî ne gotibana na. Ya rastî, ku mîr ji di nav de ti kesekî nikarîbû ku bêje ne.Ji ber ku di nav xalkê de kevneşopîyek û çandak bi pîran hebû. Herkesek ji ji wê bi agahdar bû û herkesekî pêdivîyên wê hertimî ji aliyê xwe ve bicih dianînin. Hinek mirovên wilo di wê heyeme de diaxiftin. Di nav xalkê de weke çandakê ku mirov bêne ser ziman, rêze li ber dê û bav û pîran pir mazin bû.Ev hersê komên civakê rêze li ber wan ne dihata nîqaşkirin. Tenê bicih dihata anîn. Ku hinekan hewldabana û kiribana ku nîqaş kiribana, wê wan mirovan di nav xalkê de wê rêze xwe winda kriiban, ku kî ji bana.

Di wê demê de mîr û ew mirovên pîr ji hinekî ku axiftin, ew ji êdî mana sekinî û êdî bêaxiftin man.Deng ji ti kesekî êdî derneket.Mihamed ew demek bû ku bi bêdeng bû. Ew her ku dem têve diçû û bi ber derengbûnê ve diçû, êdî weke êşe wî ji zêdetir dibû.Wilo dihata xuyakirin.Di deme axiftinê de şêx Birehim car bi car tevlî axiftinên ku dibûn dibû.Wî ji ku axiftin dibûn, çend gotin digotin.Lê ew ji êdî ne weke berê bigotin bû. Ew êdî bêdeng bû. Deng êdî jê dernediket.Lê bala wî li ser Mihamed bû.Weke bêhneke dî dem têve çû, êdî careka din şêx Birehim mafê axiftinê hilda û wê carê hinekî axift û piştre diaxiftina xwe de weke gotinaka dawiyê got “dem hatiya ber derengiyê ji”.Wî wilo ji got û piştre ma sekinî. Deme ku wî wilo got, êdî mirovne din ji mafê axiftin girtin û wan ji weke şêx Birehim got di dawiya axiftina xwe de.Mihamed, bal li ser wî bûn. Mirovên ku balên wan li ser wî bûn, bi avirên xwe weke ku jê

dixwestin ku ew ji çend gotinan bêjê.Lê ew bi bêdeng bû. Ji rewşe wî dihata têgihiştin ku ew ne rehete û her ku dem têve diçê ji ew ne rehetiye wî bêhtir zêdetir dibe.Wilo dihata berçavan di wê heyeme de.Piştî ku di wê heyeme de hinekî dî dem têve çû, êdî bi tememî mirovan kara xwe ye rabûnê kirin.Lê li bendî mîr bûn. Divîyabû ku mîr ji wan pêşengi kiribana.Ku mîr ne dabana xwe, wê civatê ji ne dabana xwe di wê heyeme de.Ev nêzîkatî weke zagona destûraka bingihîn zagonaka civatê bû.

Di wê heyeme de mirivên li civatê hin dikirin ku rabina xwe û herina malên xwe. Her weha li ser xwe bûn. Lê çavên wa li mîr bû. Mîr ji di wê farqê de bû.Ji ber vê yekê ji, wî ji xwe amede dikir ku rabê ser xwe di wê heyeme de.Mîr deme ku kir ku bide xwe û rabê ser xwe, çavên wî I şêx Birehim û Mihamed bû. Deme ku mîr kir ku bide xwe û rabe xwe şêx Birehim ji kir ku pêre bide xwe û rabê ser xwe. Lê Mihamed di wê heyeme de ew hewldan jê derneket. Ya rastî wî dabû û kiribû ku rabê ser xwe bi wan re, lê wî nikarîbû ku bide xwe û rabê ser xwe di wê heyeme de.Yê ku ew pêşî farq kir şêx Birehim bixwe bû. Deme ku wilo di Mihamed kifş kir, êdî wî di cih de bi ser Mihamed de xwe tawand û kir ku alî wî bike. Deme ku wî xwe tawand bi ser wî de, êdî hinek mirovên din ji weke wî kirin û bi ser Mihamed de xwe tawandin. Mîr ji deme ku mirovan xwe bi ser Mihamed de tawand, êdî di cih de ji cihê xwe bi ber wan ve çû û çû û li ber Mihamed sekinî û gotina ku di wê heyemê de pêşî ji devê wî derket ji her weha “seydeyê min ez dibe qey di ne rehetî” û ma sekinî. Mihamed, di wê heyeme de nikarîbû ji cihê xwe de rabe ser xwe.Êdî hatibû fahm kirin ku rewşa wî bi rastî ji êdî ne başa..

Deme ku rewş wilo hata xuyakirin, êdî herkesekê li wir yên ku rabûbûn ser xwe ku bi ber devê dêrî ve herin û herine malê, ji dêla wê, berê dana ber Mihamed û çûne bi ber wî de.Deme ku çûne ber wî, êdî hinek ji wan li ber wî li ser çokên xwe biçokanê bûn. Şêx Birehim li ber wî li ser çokên rûnişt.Ji aliyê herkesekê li wir ve hatibû fahm kirin ku Mihamed pir diêşehê.Ji ber vê yekê ji, êdî ji dêla ku Mihamed ji cihê wî bi labitênin, li cihê wî jê re cihek hata hata amede kirin û ew li ser hata danîn. Li wir Mihamed di nava cihan de ma. Mirovên ku rabûbûna ser xwe ku herine malê ji, êdî çûna xwe ye malê ji bîr kiribûn.Herkesek li wir li cem Mihamed mabûbû haya ku dem hatibû nîvê şevê. Mîr ji di wê heyemê de vala ne sekinî bû.Wî ji di cihê çend mirov dabûbûn rex hevdû û şandibûn ku herin û xwe bigihênin hekîman û werênine wir.

Deme ku hata nîvê şevê, êdî rewşe Mihamed weke ku hinekî xirabtir bûbû.Şêx Birehim ew di wê rewşê de didît. Wî di dît ku ew çend êşê

dikişêne.Deme ku wî ew di wê rewşê de di dît ji, bêhtir ew pir pê diêşehe.Dilê wî pir bi Mihamed ve bû.Mihamed, mirovekî ku mazina bû û li welatê kurdan li Kurdistanê bigiştî ji ew bi nav û deng bû.Jê wir de ji, ew li herêmê bigiştî bû bû xwedî nav û deng. Mirovên ku ew li herêmê bigiştî ji nasnedikirin hema bêja nebûn.Herkesekî ew nasdikir.Mirovekî wilo nahaka vêce ketibû ber nexweşiyekê de.Dem hin bi hin di buhurt.Hin bi hin dem ji nîvê şevê ji dibuhurt.Hin bi hin dem dihata ber sibehê.Ji xwe gelek êdî têve ne çûbû, êdî bangdana sibehê dengê wê hatibû. Deme ku dengê bangdana sibehê hatibû, êdî Mihamed bi xwe ji deng hiskiribû û ji Şêx Birehim re gotibû ku herê mizgeftê û li pêşiye cimaatê mêj ke.Deme ku Mihamed wilo got, êdî Şêx Birehim ji ji Mihamed re ne got ne û wî kara xwe kir ku herê.Mîr nêhte wî ne bû ku herê.Mihamed lê meyîzend. Deme ku Mihamed lê meyîzend, hingî, Mihamed fahmkir ku ew nêht nakê ku herê mizgeftê.Mihamed, deme ku wî ev yek bi wî re kifş kir, êdî berê xwe da mîr û gotiyê de "divêt ku ti ji herê, bila ti kesek ji mêje xwe nemêne". Deme ku Mihamed wilo got, êdî mîr hinekî bi hizir û hazn li Mihamed meyîzend û gotiyê de "seydeyê min, ma ez te nahaka li wir bitenê bihêlim ..". Mîr ev gotin tenê got û ma sekinî. Lê deme ku wî wilo ev gotin got, mirov ji dengê wî fahm dikir ku dengê wî bi rahronek dihata mirov.Mihamed ew rahroneka di dengê wî de kifşkiribû.Kifşbû ku mîr ji pir bi êşbû ku Mihamed biêş bûya. Dilê herkesekî bi Mihamed ve bû û dilê herkesekî ji li ser wî bû.Dilê mîr ji li ser wî bû.Mihamed ev yek di wê heyeme de pir baş û qanc hîs dikir. Deme ku mîr axiftibû, ji wê rahroneka di dengê wî de, Mihamed ji mîr ev yek pir baş û qanc fahm kiribû.Deme ku Mihamed gotiyê de divêt ku ti ji herê mêje, divêt ku ti ji mêje xwe nemêne", êdî mîr ji Mihamed re ne got ne.Lê di dilê wî de weke ne xwestekek hebû.Ev yek li berçavan bû. Deme ku li mîr dihata meyîzendin, ev yek pêre di wê heyeme de dihata dîtin û fahm kirin. Piştre ne bi gelekî re şêx Birehim ji kara xwe kir û kir ku herê mizgeftê. Mîr ji êdî kara xwe û kir ku bi şêx Birehim re herê Mizgeftê.Lê berî ku mîr herê, mîr hingî, tembih li hinek mirovan ku Mihamed di mezelê de bi tenê ne hêlin. Deme ku mîr wilo got ji hinek mirovan re û wan mirovan ji got "bile mîrê min", êdî mîr ji da rex şêx Birehim bi hev re ketine rê de û çûne mizgeftê.Mihamed ji di cihê xwe de ma. Di nav cihê xwe de bû.Ku mîr û şêx Birehim ji mezelê derketin, bihizir û hazn bûn.Ji rewşe wan ev yek pir baş û qanc dihata berçavan. Ew herdu ku ji malê bi hev re derketin û hatina devê derî û hinekî ji ji malê bi meşê dûr ketin, êdî di rê de rastî hinek mirovên din ji hatin ku ew ji diçûna mizgeftê.Hê dinye ji bi tememî ne

bûbû rohnî. Hê hinekî dinye reş bû.Lê rewşeke ku hin bi hin dibû rohnî ji hebû.Ku gehana hevdû, êdî yên ku gehana mîr û şêx Birehim, pêşî ji wan re rojbaşî kişandin û ku mîr û şêx Birehim ji bi heman nêzîkatiyê bersive wan da, êdî bi hev re dana rex hevdû û berê xwe dana mzgeftê. Deme ku berê xwe dana mizgeftê, êdî weke qadarekê ku meşîn, êdî ew bi hev re gehana mizgeftê. Deme ku ew gehana mizgeftê, êdî wan dît ku wan gelek mirov wê li mizgeftê ne. Hinek ji wan ji wê kara xwe dikin. Ku mîr û şêx Birehim ketine hewşa mizgeftê de, êdî mirovan ew dîtin û ku mirovan ew dîtin, êdî bi berê xwe dana wan û silav dana wan û roj başî ji wan re kişandin.Piştre ku her weha herkesekî ji hev re rojbaşî kişand, êdî tevlî hev bûn û bi hev re ketine hundurê mizgeftê de. Lê bala gelek mirovan li ser wan bû.Weke ku çavên hinek ji wan mirovên ku silav dana wan û ji wan re gotin rojbaş li Mihamed ji digeraha.Lê wan ti tiştek ne digotin. Lê wan ji ruyê mîr ji û yê şêx Birehim ji fahm dikirin ku ew hinek weke ku xamgîn têne xuyakirin.Ew xamgîniye li ser wan, ji aliyê mirovên li dore wan ve pir baş dihata kifşkirin.

Piştî ku hatibûbûna hundur û li hundur li hevdû rûniştibûn, êdî piştre, ku ne bi gelekî re ku herkesekî kara xwe ji bo mêjê, êdî li bendê bûn, rabin û bi hev re bidest mêjê bikin.Lê weke ku kêmesîyek di wê heyeme de hebû. Herkesekî ev yek di wê heyeme de kifş dikir. Hertimî, deme ku herkesekî ji bo mêjê kara xwe dikir û amede dibûn, Mihamed herkesek dirakira mêjê û bi hev re bidest mêjê dikirin.Lê ew nebû. Ew ne li wir bû.Ev yek di wê heyeme de pir li ber çavan bû.Demek têve çû.Mihamed ne li wir bû. Êdî divîyabû ku şêx Birehim ji dêla wî ew berpirsiyar kiribana.Lê wî ji weke ku ji xamgîniye di dilê xwe de ew yek di xwe re ne di dît. Ew bi hazn bû.Piştî ku hinekî dî ji dem têve çû, êdî mîr li şêx Meyîzend û gotiyê de “şêxê min, ez dibe qey herkesek amede ye ji bo mêjê ji bo ku bike”. Mîr wilo got û ma sekinî di cihê xwe de.Ji wê pêve ti gotinên din jii devê wî derneket. Piştre ma sekinî.Lê wî dewam kir û li şêx Birehim meyîzend.Şêx Birehim ji, deme ku mîr wilo got, êdî ti tiştek ne got û ji xwe re kir ku rabê ser xwe di wê heyeme de. Deme ku kir ku rabê ser xwe lê hê ku ne rabûyî ser xwe, mirovekî ji tihêla wî ye çapê deng da û gote “ma gelo seyde Mihamed iro çima ne hat. Ew ku tiştne mazin ne bin, ew xwe ji mêjê nehêle”.Deme ku wî wilo got, êdî bala mîr ji û şêx Birehim ji bi carekê re çû ser wî. Deme ku bala wan çû ser wî, di wê heyeme de mîr û şêx Birehim çav bi çav ji hatina ber hevdû.Lê deng ji wan derneket.Weke bêhnekê bêdeng ma. Piştre şêx Birehim berê xwe da zilêm û axift, û bi dengekî ku bixamgîne her weha gotiyê de “rastê, seyde ti carî xwe ji mêje xwe ne

hêlê.Lê seyde nahaka pir nexweşa.Li qasrê di nav cihan de ya. Mêj nêht kir ku em newin, lê seyde gote me illeh winê herin.Got ku bila ti kesek ji mêje xwe nêmêne.Duhû, deme ku em li hevdû li civatê rûniştî bûn, nexweş bû û piştre nexweşiye wî zêde bû.Lê em hemû ji ji xwûdeyê xwe dxwezin ku seyde di cih de were ser xwe û rabe ser xwe.Ya rastî xwûde zane. Ya rastî ew kifş dike.Ya rastî ji wî tê pirsîn".Ku şêx Birehim her weha axift, piştre êdî ma sekinî.Deme ku ew ma sekinî, êdî piştî wî re deng ji nav cimaatê hatin.Weke ku xamginiyekê dilê herkesekî girt di wê heyeme de.Her weha hata berçavan.

Piştre ku hinekî dî ji dem têve çû, bi dilekî ku xamgîn, şêx Birehim derkete pêş û qamat kir û êdî herkesek rabû ser xwe û ketine rêzê de û bi hev re êdî bidest mêje xwe kirin.Ku cimaatê bidest mêjê kir, êdî piştre ne bi gelekî re mêje xwe xilas ji kir. Deme ku mêje xwe xilaskirin, êdî piştre hinekî li hevdû mana sekinî û bi hev re axiftin.Şêx Birehim, wê rojê Mihamed nebû, ji ber wê yekê ji, yê ku wê rojê ji wan re wahz kir ji ew bû.Wî ji cimaatê re weke qadarekê axiftin kir. Deme ku wî axiftin dikir, deng ji ti kesekî dernediket. Herkesek bi hey bala wan li ser şêx Birehim bû û lê dihisandin.Şêx Birehim ku weke qadarekê axift, êdî wî axiftina xwe bidawî kir.Piştî ku wî axiftina xwe xilas kir, piştre wî destê xwe rakir û bides berg(dua) kirinê kir. Deme u wî destê xwe rakir, êdî herkesekî pêre destê xwe rakir û berg kir.Wî di bergkirina xwe de pêşî şifa ji Mihamed re xwest û piştre berge xwe bidawi kir.Wî çi kir, cimaatê ji weke wî kir.Piştre wî berge xwe bidawi kir. Ku wî berge xwe bidawi kir, êdî piştre hinekî li wir li ser çokên xwe bi cimaatê re ma sekinî. Lê di wê heyeme de deng ji ti kesekî derneket. Herkesek bi bêdeng bû.Piştre wê bêdengiyê wilo zêde berdewam ne kir. Yê ku ew bêdengî xirakir ji mîr bi xwe bû. Wî piştre got, " de nexwe em rabin û herine malê, da qana em seyde ji bitenê ne hêlin".Ku mîr wilo got, êdî piştre di cih de herkesekî bi gotina mîr re xwe lê da hevdû ku rabina ser xwe di wê heyeme de.Piştre mîr û şêx Birehim bi hev re dana xwe û rabûna ser xwe. Deme ku wan da xwe û rabûna ser xwe, êdî bi wan re cimaatê ji bi carekê re bi hev re da xwe û rabû ser xwe. Deme ku rabûna ser xwe, êdî zêde li hundur ne man û bi hev re bi zû kirin ku derkevine derve. Mîr û şêx Birehim dixwestin ku zû derkevin û herine malê û li cem Mihamed bi mênin.Deme ku wan wilo dabû xwe êdî cimaatê li wan ji bi wan re dabû xwe û bi wan re derketibû derve û êdî cimaat ji wan ne vaqataha bû. Herkesek li hevdû bi mîr û şêx Birehim re mabû bûn.

Piştî ku di hundurû de mêj hatakirin û bidawi bû, êdî bi hev re herkesek derketibû derve û li derve li hewşê li hevdû hinekî li ser lingan

mabû bûn sekinî di wê heyeme de.Lê wê rewşê wilo zêde berdewam ne kiribû. Mîr pir zû dixwest ku herê malê. Şêx Birehim ji, pir zûd dixwest ku herê cem Mihamed. Deme ku ew li wir bûn, wan ne xwestibûn ku ji cem wî vaqatihin.Lê Mihamed andibûn. Mihamed ne hiştibûn ku ew ji mêje xwe bi mênin.Ew ji hatibûn û mêj kiribûn û êdî nahaka dikirin ku herine malê. Deme ku ji hundur derketibûn ji, bi hev re, ku mîr û şêx Birehim di pêşiye wan de derketibûn. PIştî ku derketibûn, êdî li derve li hewşê hinekî mabûbûn sekinî. Ew sekne wan ji, weke sekneke ku li bendî mirovên ku li wir in, ta ku xwe amede bikin û derkevine derve ji hundur û şakal û pêlavên xwe bikine lingên xwe de. Her weha weke seknekê bû. Weke qadarekê ku herkesek li dore mîr û şêx Birehim geha hevdû, êdî mîr ji û şêx Birehim fahm kirin ku herkesek amede bûya. Piştre ku mîr hizir ku herkesekî xwe amede kiriya, êdî wî ji dore xwe got ”de êdî nexwe ka em herim” û deme ku wilo wî got, êdî wî bi gotina xwe gava xwe avêt û kete rê de ku herê. Deme ku herkesekê li dore wî wilo dît, êdî herkesekî ji weke wî kir û da dore wî û ketine rê de û çûn. Kî wê sibehê hatibû mizgeftê, piştre ji mizgeftê ne vaqataha bû. Herkesekî deme ku ji şêx Birehim hiskiribûn ku Mihamed nexweşa, êdî herkesek mabû sekinî. Mihamed ne tenê weke zanistekî bû ji bo wan. Ew weke alimakî ji bû.Her weha rêz jê re dihata girtin.

Piştî ku mîr kete rê de, êdî şêx Birehim ji da rex wî û ketine rê de û çûn. Kî li wir bû di wê heyeme de, wan ji di wê kêlîkê de dana dore wan û bi wan re çûn. Bi hev re hem diaxiftin û hem ji dimeşîn.Lê wilo weke ku axiftin ji dilê ti kesekî ne dihat. Herkesek weke bi dil xamgîn bû. Wilo ji wan dihata xuyakirin. Deme ku li mirovan di wê heyeme de dihata meyîzendin, ev yek di wê kêlîkê de pir baş û qanc dihata berçavan.Herkesek bi mîr û şêx Birehim reketibûbûna rê de û dihatina qasrê. Wê MIhamed dîtibana. Herkesek dilê wan bi Mihamed ve bû.Di wê heyeme de ew ji bo wê dihatin.

Di vir de hêjaya ku mirov hinekî ji aliyê kevneşopîyê ji bêne ser ziman.Ji ber ku hinekî kevneşopîyên xalkê hebûn ku ew bitemem dikirin.Di malakê de ku yek nexweş ketibana, yên hevirdorê ku hisdikirin, êdî di cih de çûna cem yê nexweş malê û jê digotin ”derbasî bê!”. Ev yek kevneşopîyek bû.Deme ku yek nexweş ketibana û her weha çûyîn çênebûbana, êdî rast û di cih de ne dihata dîtin. Di wê heyemê de di nav xalkê de êdî mirovan rexne li hevdû digirtin. Di rastiyê de rexne li yên ku divîyabû ku biçûyana û neçûne li wan dihata girtin.Mirovên wêderê

herkesekî hevdû nas dikir.Ji ber vê yekê, herkesek divîyabû ku bi ser hevdû di demên nexweşiyê de biçûyana..

Di wê heyemê de herkesek di çû ku serekî li Mihamed bide.Lê di wê demê de yên ku diçûn ji, bi rasti ji, ne tenê, ku ji bo ku pêdivîya vê kevneşopîyê tenê bi cih bênin diçûn. Ji xaynî wê ji, Mihamed mirovekî ku pir mazin bû.Mihamed bixwe ji, dii nava xalkê de ji xalkê re bûbû weke nirxekî.Herkesek mazin bûbû.Herkesek dihata naskirin.Mihamed, zanistekî wan yê alim bû. Ew ji welîyekî kêmtir ne dihata dîtin.Her weha lê dihata meyîzendin. Her weha rêzeke mazin jê re di nav xalkê de hebû.Deme ku şêx Birehim di mizgeftê de ji wan gotibû ku Mihamed ne başa û nahaka li qasrê di nava cihan de ya, dilê herkesekî xamgîn bûbû.Piştre ku mêj ji bidawi bûbû, êdî herkesekî ji dil xwestibû ku herine cem wî û serekî lêxin. Êdî ketibû bûna rê de û diçûna qasrê di wê heyeme de.Di deme meşê de hinek deng dihatin, ku hinek ji wan bi hev re diaxiftin.Lê wilo zêde ti deng dernediketin. Herkesek bala wan li ser mîr û şêx Birehim bû.Ew ji di rewşe bêhis bûn.Deng ji wan dernediket.Êdî ti kesekî ne dixwest ku biaxivê û ti tiştekî di wê heyeme de bêjê.Wê rewşê weke qadarekê di wê heyemê de bi wan re berdewam kir.Piştre ne bi gelekî re weke ku deng ji şêx Birehim derket. Deme ku deng ji şêx Birehim derket, êdî bi carekê re weke ku bal çûna ser wî.Şêx Birehim ji deme ku weke ku bi carekê re bal çûna ser wî, ew yek di wê heyemê de kifş kir.Piştre wî bidest axiftinê kir û çend gotin wî gotin.Lê wilo zêde ne ji ne axift.Lê li dore wî hinekî mirovên ku pir pîr bûn, wan piştî axiftina şêx Birehim re mafê axiftinê girtin û axiftin. Piştre ku wan ji bi dest axiftinê kir, êdî weke ku danûstandinaka kin di nav wan de dest pê kir..

Bi vê yekê di wê heyeme de di nav şêx Birehim û wan mirovên pir de axiftin hinekî bû.Lê wilo zêde ji berdewam ne kir. Mîr di rewşe xwe de dihisand. Deng ji wî dernediket. Ew pir bi bêdeng bû. Weke ku ew di wê heyemê de di serê xwe de ne li wir bû. Li derne din bû.Lê li kuderê ji bû, di wê heyemê de ji aliyê ti kesekî ve ev yek ne dihata têgihiştin.Şêx Birehim heya wî li ser wan mirovên ku bi wan re diaxift bû. Di wê heyeme de ew heya wî ji Mîr ne bû. Ew di nava axiftinê de di wê heyemê de hinekî çûbû bû.Di wê rewşê de dimeşîn û tên ku werine qasrê. Bi wê rewşê weke qadarekê di meşîn. Ku weke qadarekê dimeşîn, êdî bi hev re digihine nêzîkî qasrê. Qasr ji aliyê wan ve tê dîtin. Deme ku qasr ji aliyê wan ve hata dîtin, êdî weke ku bêdengiyek ji di nava wan de di wê heyeme de çêbû. Yên ku diaxiftin ji, weke ku bi carekê re bi bêdeng bûn.Êdî deng û his ji wan derneket.

Ku gehana ber qasrê, êdî ku ew hinekî dî ji bi hev re meşîn, êdî gihiştine ber devê dêrî û ku gehana ber devê dêrî, êdî li ber devê dêrî ne sekinîn û di cih de ketine hundur de.Di kevneşopîye kurdan, deme ku xwediyê malê bi hinekan re ku geha ber devê derîyê xwe, li devê derîyê xwe di sekinê û rê dide yên bi xwe re ku li pêşiye wî di devê dêrî de bibuhurin û herine hundur. Ev yek weke kevneşopîyekê ya û ti kesek ji wê kevneşopîyê binpê nake.Her kesek bidil wê kevneşoîyê bicih têne.Ji ber wê yekê, deme ku ew gehabûbûna ber devê derî, hingî, mîr li pêş bû.Lê deme ku gehana devê dêrî, êdî mîr li devê sekinî û gote şêx Birehim ti li pêşîye min herê hundur. Şêx birehim û yên din ji gotina mîr ne tê pêşî herê. Wilo di wê rewşê de weke bêhnekê li ber hevdû dan.Lê piştre şêx Birehim kete pêş de û di pêş de di devê dêrî de buhurta hundur.Piştre mîr buhurt. Piştre herkesekê li dore wan, bi hev re buhurtina hundur.Ku herkesek buhurta hundur, êdî bi hev re li hewşa qasrê li hevdû mana sekinî. Yên ku buhurtina hundur, di hewşa qasrê de mana sekinî, haya ku yên din bi buhurina hundur û bigihine wan.Piştre ku herkesek buhurta hundur, êdî piştre ji hewşê, herkesek bi hev re ku mîr û şêx Birehim li pêşiye wan na, buhurrtina diwana rûniştinê. Deme ku buhrtina wir, êdî dîtin ku wan Mihamed wê di nav cihan de ya û wê li dore wî ji hinek mirov wê hene. Deme ku ew ketine hundur de, êd yên li dore MIhamed bi carekê re ji ber wan rabûna ser xwe û silav dana wan û piştre bi hev re êdî rûniştin. Mihamed nikaribû ku rabe ser xwe.Ji ber wê yekê ji, wî ji xwe di cihê xwe labitand, weke ku ji ber wan rabê û rêzê bide nîşandin kir.Ev yek kevneşopîyek bû. Piştre, yên ku dîtin ku Mihamed xwe di cihê xwe de xwe labitand, êdî gotina Mihamed ”xwe aciz neke seydeyê min” û piştre bi ber wî ve çûn û li dore wî bidest rûniştinê kirin.Di demeke kin de herkesekî cih ji xwe re dît û lê rûnişt.

Ku herkesek li cihê xwe rûnişt, êdî di serî de weke ku bêdengiyek çêbû.Lê wê bêdengiyê wilo zêde berdewam ne kir. Yê ku ew bêdengi xira kir Şêx Birehim bû. Wî berê xwe da Mihamed û gotiyê de ”seydeyê min, ma ka nahaka ti çawa yî, rewşe te nahaka çawa ya”. Deme ku wî wilo got, Mihamed ji got ”hinek baştirim, xwûde ji wê hemûyan razî bêt”. Mihamed, deme ku wilo got, êdî weke ku dixwest ku hinekî dî ji biaxivê.Lê weke ku bêhne wî ew derfet ne da wî di wê heyeme de.Mihamed, deme ku jê hatibû pirsîn ku ka çawa ya, wî gotibû ku ez başim.Lê ya rastî ew ne baş bû. Pir nexweş û ne li serxwe ji dihata xuyakirin. Yên ku hatina wir ji ew yek di wê heyeme de farq kirin.Piştî ku ew mîr, şêx Birehim û yên ku bi wan re hatina ku rûniştin, êdî ne bi gelekî re hekîmên ku mîr xaber li pey wan şandibû ku werine wir ji hatin û bi silav dayînê re ketine hundur de.Deme

ku hekîm ketine hundur de, di cih de êdî mîr bixwe ji ber wan rabû ser xwe. Deme ku mîr rabû ser xwe, êdî yên ku li wir ku kî hebûn, bi carekê re dana xwe û rabûna ser xwe di wê heyemê de.Ku ew ji rabûna ser xwe, êdî bi hev re bi rêzê destê wan girtin û piştre ew ji rûniştin. Ku ew mirovên ku hekm rûniştin, ew li nêzîkî Mihamed rûniştin.Deme ku ew rûniştin, wan di wê heyeme de dem winda ne kir û berê xwe dana Mihamed û bidest lê meyîzendinê kirin.Weke qadarekê lê meyîzendin.Piştre, ku lê meyîzendin, êdî bidest başkirina wî kirin.Lê dem ku têve diçû ji, hin bi hin rewş Mihamed ji weke ku hinekî xirabtir ji dibû.Mirov ev yek di wê heyemê de jê fahm dikir.

Di wê heyemê de ku dem hinekî dî ji têve çû, êdî rewşe Mihamed weke ku hinekî dî ji xirabtir bû.Lê wan hekîman çi kir û ne kir, kurnekirin ku wî hinekî baş bikin.Çend ku dem têve diçû, êdî rewş wî hê bêhtir bi ber xirabûnê ve diçû.Bi hekîman re şêx Birehim ji li ber serê Mihamed bû.Şêx Birehim hertimî dikir ku ew li ber çavên Mihamed bêt.Wî xwe di rewşeke wilo de dihişt.Ku hinekî dî ji têve çû, êdî hinek mirovên din ji hatina wir. Di wê heyeme de, li wir li herêmê çend mirov hebûn, hema bêja hemû hatina wir. Hundurû tişî mirov bû.Mihamed ew di dîtin.Li wan dimeyîzend.Wan ji li wî dimeyîzend.

Mîr li cihê xwe bû. Lê wê naqlê ne li dûr î wî li cihekî rûniştibû.Li cihekî ku nêzîkî wî rûniştibû.Mihamed, mîr di cihê xwe de di dît. Deme ku bi aliyê wî ve karibana meyîzenê, wê wî ew dîtibana.Lê Mihamed weke ku ji kal ketibû.Nexweşiye wî zêdetir bûbû û laşê wî ji qaram kiribû.Ew pir diêşeha.

Hekîmên ku bi Mihamed ve mijûl bûn, ku weke qadarekê mana bi mijûl, êdî piştre ew ji hinekî di cihê xwe de mana sekinî.Lê li ber serê Mihamed mana sekinî. Piştî ku mana sekinî, carekê yek ji wan bi şêx Birehim re çav bi çav hat.Lê meyîzend. Lê ti tiştek ne got.Bêdeng ma sekinî û meyîzend. Şêx Birehim ji her weha bêndeg ma sekinî û lê meyîzend.Şêx Birehim, piştî wê rewşê re kir ku bi Mihamed bi peyivê.Wî qana xwestibû ku dengê Mihamed his bike.Deme ku pêre bidest axiftinê kir, Dengekî an ji dû dengan deng da Mihamed û kir ku pêre bi axivê.Mihamed weke ku dengê pêşî his ne kir. Weke ku hisnekirî dengê wî bêdeng hişt.Lê dengê duyemîn yê ku şêx Birehim kir, hingî, weke ku wî hiskir û çawa ku weke ku hiskir ji, êdî wî kir ku berê ruyê xwe bide şêx Birehim û bersive wî bidiyê de.Deme ku Mihamed her weha hewlda, hingî, şêx Birehim ji ew hewldana wî kifş kir û deme ku kifş kir ji, wî ji di cih de hewlda ku xwe hinekî dî bi pêş de bidiyê de, da qana seyde wilo zêde ne

wastihê.Şêx Birehim, hingî, wî xwe anî ber nerîne wî di wê heyeme de. Deme ku şêx Birehim xwe anî ber nerîne wî, êdî Mihamed weke ku çavên bi wî ket û deme ku weke ku çavên wî bi wî ket, êdî kir ku pêre bi peyivê.Deme ku Mihamed wilo hewlda, êdî bala şêx Birehim bi carekê re çû ser wî. Lê bi bala şêx Birehim re bala herkesekê li wir li ser wî bû. Mihamed, deme ku her weha berê xwe da wî êdî wî bidest axiftinê kir ji şêx Birehim re û deme ku bidest axiftinê kir ji, ew her weha axift di wê heyemê de:

”Rasti hemû rastiya xwûdê ya. Rastiya ku xwûde kifşkiriya.Hemû tişte ku dibe û wê bibe ji ji wê dibe. Ew yê mazin û kifşkara. Vê yekê em zanîn. Li dinyê jiyanê me heya, ye ku xwûde kifşkiriya û bi baxt li ser me farz kiriya.Deme ku mirov dinye xwe baş bi buhurêne miov wê axîrete xwe ji baş bibuhurêne.vê yekê divêt ku mirov zanîbe.Xwûde ji qancên xwûde razî bê. Ew di nava wan de jîn dibin. Deme ku ez ji li Cizire bota bûn, min xwe pir nêzîkî Nebî Nuh hîs dikir. Ew weke ku hertimî li cem min bû. Min wilo hîs dikir.Piştre ku ez ji wir vaqataha û bi rê ketin ji, min ew bi xwe re hîs kir. Ew nebîyekî xwûde bû û xwûde jiyanaka pir dirêj dayê de.Piştî wî yê ku hat Nebî Salih bû. Xwûde piştre wahî ji wî re ji şand. Ew jii bi jiyanaka demdirêj bi xalat kir.Piştî Nebî Salih re Nebî Lut hat. Lê win hemû ji zanin ku çi hata serê mirovên wî. Ew ji bo me fêr in. Lê win zanin ku ku Birehim Xelîl ji hat.Ew ji demeke dirêj jîn bû. Haya ku bû kalak ew jîn bû. Wî gelek dever û der dîtin. Li gelek deveran geraha. Ew ji Rihayê bû.Lê ew demeke dirêj li Cizîre bota ji mabû.Li cem Nebî Nuh mabû. Deme ku ew li mabû, hingî, xwûde wilo farz kiribû ku ew Nebî Nuh ji bi bîne. Wî ji ew dîtibû.Piştre ew çû nav qawmên din ji û li wan geraha. Lê di dawiyê de haya Rihayê û di nav qawmê xwe de bicih bû.Jiyana wan nebîyan û yên weke wan, ne tenê mirov zanin. Çi tişte ku giyan(ruh) tê de heya, jiyan bûna zanîn. Giyan di hertimî de heya. Divêt ku mirov vê yekê zanibe. Li jiyanê tiştên ku hene, ne bê giyan in. Deme ku mirov li jiyanê dimeyîzenê, mirov hemû tiştî di bêne. Hemû tişt ji axê çêdibe û caraka din diçê axê û piştre caraka din ji axê çêdibe. Her weha devrûdayîmaka jiyanê heya.Her Nebîyên ku hatin, xwestin ku mirov û deme xwe ji nezaniyê û bêzaniyê derxin û xilas kin. Her weha armancaka wan hebû. Ew armanc xwûde dabû pêşiye wan. Em mirov ji divêt ku vê yekê zanibin.Divêt ku ew ji dinye bixaber bin.

Tişte ku ez di dewama axiftina xwe ji were vebêjim, ji weha ya. Mirovê qanc yê ku bi zanebûna xwe ji mazin a.Zanebûn mirov ji bêzan û bêkariyên mirov, mirov xilas dike.Bi hev re divêt ku mirov qanc bê. ..”.

Mihamed, hê weke ku tiştên ku bêje hebûn. Lê weke ku êdî ne li ser xwe bû.Bêhne wî kêm diçû û dihat. Ji ber vê yekê weke ku axiftina xwe di nêvî de birrî.Her weha herkesekê li dore wî fahm kir.Ji ber vê yekê, piştî ku ew ma sekinî ji, deng ji ti kesekî di wê heyeme de derneket. Herkesek bêdeng ma sekinî di cihê xwe de di wê heyeme de.Mihamed piştre careka din hewlda ku biaxivê.Lê çend ku hewlda ji bêhne wî ew derfet ne da wî di wê heyeme de. Ji ber vê yekê, êdî di cihê xwe de ma sekinî. Gotina ku di dawiyê de ji devê wî derketibû bû ji ”divêt ku mirov bi hev re qanc bê” bû. Piştî wî gotina wî re hê gotinên wî yên ku wê gotibana hebûn.Lê bêhne wî derfet ne dabû bû wî ku bêne ser ziman.

Piştî ku Mihamed ma sekinî, êdî weke demekê deng ji ti kesekî derneket. Ti kesekî ji xwe ji cihê xwe ne labitand. Lê piştre weke bêhne bi piştre, yê ku xwe ji cihê xwe labitand mîr bû. Mîr xwe ji cihê xwe labitand û hinekî dî bi ber Mihamed ve çû. Wî ji fahm kiribû ku rewşe Mihamed ne başa.Mirovên li dore wan ji bi bêdeng bûn. Deng ji wan dernediket. Herkesek bi bêdeng bû.Herkesek bi çavên raq bala wan li ser Mihamed bû.Lê dimeyîzendin.Lê deynedikirin. Deng ne didan.Mîr, dene ku wî xwe hinekî bi ber Mihamed ve dayê de kir ku pêre bi peyivê.Wî xwe bi ser Mihamed de hinekî tawand.Li nava çavên wî meyîzend.Lê jê ne hat ku biaxivê. Wî di wê heyeme de deme ku li nava çavên Mihamed meyîzend, êdî di xwe de ne dît ku tiştekî bibêje.Ma gelo ku axiftina wê çi bigotina? Ew ne kifş bû.Lê weke ku hinek hizir di serê wî de hebûn. An ji hin gotin li ser zimanê wî bûn ku ew bibêje.Ku axiftibana, wê hinek tişt anîba ser ziman, an ji wê rewşê wî jê pirsî bana ku ka nahaka çawa ya?Wê çi kiribana? Ne kifş bû.Pirs hemû bêbersiv bûn.Bersiv nebûn.

Mîr, di wê heyeme de wî tenê li Mihamed meyîzendibû.Ji wê pêve ti itştekî dî ne kiribû.Wê rewşê weke qadarekê berdewam kiribû.Deme ku mîr xwe bi ser Mihamed de tawandibû û ti tiştek ne gotibû, êdî herkesekî ew ne deynkirin weke rewşe ne başbûnê di serê xwe de şîrove kiribû.Herkesekî wilo di xwe de hizir kiribû.Wê rewşe mîr ji bala herkesekî di wê heyeme de kişandibû.Herkesek di wê heyeme de li wê rewşê bi bal mabû bû.Şêx Birehim ji li ber serê Mihamed bû. Hê hinek mirovên din ji ku pîr bûn, li nêzîkî wî rûniştibûn. Mirovên ku li nêzîkî mîr bi xwe ji rûniştibûn, mirovên ku pîr bûn.Hemû ji mirovên ku pîr û navserî xwe bûn.

Wê rewşê weke qadarekê berdewam kir. Deng ji ti kesekî dernediket. Weke ku herkesekî mafê axiftinê ji yê dî di hişt. Her weha rewşek di wê heyeme de hebû.Ti kesekî nizanibû ku axiftibana wê çi axiftibana. Ku

axiftiban wê çi gotin anîban ser ziman.Herkesekî tenê dixwest ku temaşa bikin. Herkesekî dixwest ku li rewşê meyîzênin ku ka wê çi bibe.Çavên herkesekî li ser Mihamed bû.Şêx Birehim û hinek hekîm û mîr ji li nêzîkî wî li ber serê wî bûn.Şêx Birehim pir li nêzîkî wî bû.Ew pir bi xamgîn bû.Ew her weha dihata xuyakirin li berçavan.Ku hinekî dî ji têve çû, êdî weke ku rewşe Mihamed hinekî dî ji xirabtir bû. Deme ku hekîmên li ber serê wî û şêx Birehim wilo kifş kir, êdî bala xwe dana ser wî û lê meyîzendin. Wan dixwest ku tiştekî bikin.Lê weke ku di wê heyeme de çi dikirin ji, ti bersiveke erênî bidest ne dixistin ji rewşe wî.Wê yekê ji ew xamgin dikirin.Bêhtir dilê wan diêşand.Bêhtir êş dikira dilê wan de.Mihamed, ku hinekî dî ji dem têve çû, êdî weke ku bi tememî kete rewşeke ne baş de. Di bêhn kişandinê de weke ku pir zor dikişand. Herkesekê li wir ew yek di wê heyeme de fahm kir. Deme ku rewşe Mihamed wilo lê hat û hekîman çi kirin û ne kirin, û kurnekirin ku wî baş bikin, êdî fahm kirin ku Mihamed li ber zirata ya.Deme ku wilo hata fahm kirin, êdî di cih de ji xwe re rewşeke awarta afirî di nava wan de. Mîr ji ji cihê xwe rabû ser xwe û hata ber wî û li ber wî li ser çokên xwe rûnişt û ma sekinî. Şêx Birehim ji li ber wî bû. Wî ji ji bo dua ji xwûde re diikirin ku ew baş bibe.Lê rewş Mihamed ne baş bû. Hin bi hin weke ku riha wî ji laşê wî derdiket. Piştre ku demek têve diçê, êdî Mihamed bi carekê re bêhne wî di çikehê û êdî ew bêhnê ne stêne.Êdî Mihamed di cihê xwe de di rewşe xwe de dimêne.Piştre bi bêhneke bi bêgavbûna wî re, êdî tê fahm kirin ku Mihamed geha rehmata xwûde. Êdî êşe wî dikeve dilê herkesekî de. Êdî ser ruyê wî digirin û êdî gelek mirov, ku şêx Birehim ji di nav wa de kur´an´a xwe tênin û li dore wî digihine hevdû û li ser bidest xwandinê dikin. Çil û yek(41) mirov bi kur´an´ a xwe li dore wî digihine hevdû bidest xwandinê li ser dikin. Haya ku her çil û yekî kur´an´ in di destên xwe de li ser wî xitim ne kiriban, wê ji ser wî ne rabûban.Di wê navberê de, mîr ji ji her deverê re bi mirovên ku li hespan da sûwarkirin, kir ku xaberê bişêne. Mîr, sê sûwar bi hev re şandina Cizîre bota ji ku herine wir û xaberê bidina mîrê bota û mirov û zanist û alimên li wir ji, ku Mihamed çûya ser dilovaniya.Li Cizîre bota di wê demê de pir alim û mirovên zanist hebûn.

Mihamed, êdî ew gehabû rehama xwûde. Êdî ew ne dima. Êşe wî ketibû dilê herkesekî de. Şêx Birehim, piştî ku Mihamed çûbû ser diovaniya xwe ji ji ber serê wî ne vaqataha bû. Li ser serê wî mabû bû. Piştre ku faqa, sofî û hinek alimên din kur´anên xwe hildabûn û hatibûn û li dore Mihamed bûbû bûn kom û li ser dixwandin, şêx Birehim ji, li cihê xwe mabû bû wî kur´an´ak ji xwe re peyde kiribû û wî ji di nav wan

mirovan de li ser Mihamed bi wan re bidest xwandinê kiribû.Dilê wî pir bi çûna Mihamed ye li ser dilovaniya êşehe bû. Dilê wî pir bi wî ve mabû bû.Piştî ku Mihamed hatibû wir, êdî ew bi hev re pir mabû bûn.Pir demên xwe, wan bi hev re buhurandibûn.

Piştî ku Mihamed geha rehmata xwûde, êdî mîr, pişt wî re pir mirov bi riyan xistibûn ku herine herêmên din û xabara Mihamed ye bi êş bidina wan herêman. Mîr, mirovên ku wî bi rê xistibûn, di cih de ketibûbûna riyan de. Deme ku ketibûbûna riyan de li ti deran ji ne sekinî bûn, haya cihê ku wê herinê de. Piştre ku dem têve diçû, êdî hin bi hin ji herêmên hevirdorê, mirovan bidest hatina Xizanê kir ji.Di demeke kin de gelek mirov hatibûbûn. Mirovên ku ketibûbûna ser rê de û çûbû bûna Cizire bota ji, li ti derî ne sekinî bûn. Ew ji bi wê lez û baza xwe di demeke ku ne zêde dirêj de digihijine Cizire bota. Deme ku digihijine Cizire bota ji, êdî di cih de na sekinîn û xaberê didine herkesekê li wir. Li wir ji, çawa ku xabere Mihamed Tê bihistin û hiskirin, êdî di cih de bi mîr re gelek mirov bi ser rê dikevin û têne Xizanê. Mirovên ku bi rê dikevin ji, hemû ji, yên ku sofî, seyde, zanist û her weha alim bûn. Ew ji deme ku xaberê dihildin di cih de dikevine rê de..

Li Xizanê ji, piştî ku Mihamed çûbû ser dilovaniya xwe êdî bi hijmar çil û yek mirov li dore wî lev gehabûbûn hevdû û li ser dixwandin. Piştî ku wan her çil mirovî kur´anên xwe li ser Mihamed xitim kirin, êdî wê bidest bicih kirina wî hatibana kirin.Haya ku wan mirovan kur´anên xwe li ser wî xitim kiriban, êdî wê mîrê bota ji bi mirovên pêre ketine rê de wê gehaban wir. Ji ber ku piştî ku ew ketibûbûna rê de, êdî pir lez dikirin. Mîrê bota, deme ku ew ji Cizîre bota bi rê dikeve, êdî li pêşiye wî, pir sûwar bilezeke mazin dikevine rê de û tên ku werine Xizanê û xaberê bidina wan ku wa mîrê bota wê di rê de ya..

Mirovên ku li ser bidest xwandinê kirina, haya ku ew xwandina xwe tênine ber dawiyê, gelek mirovên ku hevîrdorê ketine rê de û hatina wir ji, digihine wir. Piştre li ber xilasbûna xwandina wan mirovan, mîrê bota ji digihê wir. Çawa ku mîrê bota geha wir, êdî li wir gelek mirov bûn. Ji ber ku bi mîrê bota re gelek mirov hebûn. Mirovên ku hatibûn ji, hemû ji divêt ku mirov bêje ku mirovên ku zane û alim bûn. Yên ku mazin bûn. Piştî ku mîr digihê wir, êdî bidest karê amedekirina bicihkirina wan dikin..

Piştî ku mîrê bota geha wir, êdî ew ji bi mirovên li dore xwe re çû û di nav mirovên ku li ser Mihamed dixwandin de rûnişt. Ew, piştî ku di nav mirovên ku li dore Mihamed lev gehabûn hevdû de rûnişt, êdî ew ji ma di cihê xwe de haya ku yekî dixwand ma. Ku yê ku dixwandin ku hemûkan

xwandina xwe bidawi kir, êdî hemûkanbi hev re xwe da bi şûn ve.Lê ti kesek ji wan mirovan ji, ji wir ne vaqataha.Herkesek li wir ma. Ew mirovên ku dixwandin ji, hemû, şêx û seyde bûn.Hemû ji mirovên ku zane û alim bûn. Hemû ji mirovên ku di nav xalkê rêzeke mazin ji wan re hebû bûn.Piştî ku wan xwe da bi şûn ve, êdî piştre ne bi gelekî re hinek mirovên din ji yên ku ji herêmên hevirdorê ketibûbûna riyan de gehabû bûn wir di wê heyeme de. Ew ji deme ku digihine wir, êdî ew ji tên û tevlî wan mirovên li dore Mihamed lev gehana hevdû, dibin.Ew ji tevlî wan dibin.Her mirovên ku digihine wir ji li ser Mihamed ”yasînekê” dixwênin û piştre di nav wan mirovan de dirûnihin.

Di wê heyemê re di demeke kin de gelek mirov lev digihine hevdû.Hemû mirovên ku li wir levdigihine hevdû ji, mirovên ku gotina wan mazin a. Piştî ku bi ser xwandina li ser Mihamed ve demek di buhurê, êdî piştre bahsa bicih kirina wî tê kirin. Piştî k bahsa bicih kirina wî tê kirin, êdî di demeke kin de li ser wî, di wê heyeme de, nîqaşaka mazin dest pê dike. Nîqaş ji, niqaşa wê Mihamed li kuderê bicih bikin a. Li ser vê yekê nîqaş derdikeve. Di wê heyeme de li wir li dore Mihamed pir alim hene û di nava wan alima de nîqaş dest pê dike. Demeke dirêj nîqaş di nava wan de dest pê dike.Lê biryarê nadin ku ka wê wî li kuderê bicih bikin. Seyde û alimên ku ji Cizîre bota bota hatina dixwezin ku wî hildin û bibina Cizîre bota û li cihekî li nêzîkî cihê Nebî Nuh wî bicih bikin.Seyde û alimên li Xizanê ji, ji vê yekê re dibêjin ne û ew ji dixwezin ku Mihamed li wir bicih bibe.Lê komaka din ji seyde û alim ku pêk tê, dibêjin ku Mihamed bibine cihê ku wî di zaroktiya xwe lê xwandî li ”Medresa Werezûzê” û li wir bicih bikin.Alimên ku ji herêmê hatina, hema bêja hemû ji vê hizrê di pejirênin û erê dikin.Lê gelek alima ji ev yek erê ne kiriya. Li ber vê yekê di rabin û li ser vê yekê dikevine nîqaşaka mazin de.Di wê heyemê de ne mîrê bota û ne ji Mîr Ahmed hê hizre xwe ji ne gotiya.Lê çavne ku li ser Mîrê bota ji hene.Hinek alim hizre wî ji meraq dikin. Car bi car ji yên ku hizre wî meraq dikin, çavên xwe dibine ser wî û li wî dimeyîzênin.Mîrê bota û û mîr Ahmed ji vê yek kifş dikin.Lê ew li nîqaşa aliman û seydaya guhdar dikin. Piştre bi qadarekê re êdî ew ji tevlî axiftin û nîqaşan dibin û ew ji hizre tênine ser ziman. Yê ku pêşî hizre xwe têne ser ziman mîrê bota ya. Mîrê bota deme ku hizre têne ser ziman, dibêje ku ” Mihamed demeke dirêj li Cizîre bota maya. Hema bêja biqasî deme ku li mala bavê xwe maya li wir ji maya. Ew ji mala wî ya. Win nahaka mirovên li wir, alimên mazin û gotina we pir mazina ji bo me.Win bêjin çi wê weke bêt.Ji ber yekê û ji ber rêz û hûrmete me ye li ber we em mana sekinî, me hizre xwe ne anî ser

ziman.Lê ev vê yekê bêjin, weke ku wê ji anî ser ziman, Mihamed weke alimekî û jê wirde ji weke nebîyekê jîn bû û ew di jiyana xwe geha wê astê ji. Li cem Nebîyekî me, bê bicihkirin mafê wî ya.Lê ku win di nav xwe de biryarê bidin ku wî neyênin Cizîre bota ji, weke ku we ji got, ew êdî nebîyekî me ye û weke nebîyekî bila were bicih kirin.Ew nebîyeke.”.Mîrê bota weha hizre anî ser ziman û ma sekinî di cihê xwe de.Pişt wî re mîr Ahmed ji mafê axiftinê hilda û wî ji weha got; ”mîrê min rast û di cihê xwe de got. Weke ku we anî ser ziman di gotinên xwe de, wî ji anî ser ziman. Ew ji weke zanist û alimekî axift. Tişte ku ez ji bênine ser ziman, wê ji ya mîrê min ne çudatir bêt.Ji ber vê yekê tişte ku ez bêjin ji we re, ez ji weke mîrê xwe dihizir im”.Mîr Ahmed ji weha got û piştre ma sekinî. Piştî axiftina mîran re ji, hinekî dî axiftin bûbû bû.Di dawiyê de di hizir derketibûbûna hole. Hizre ku bizêdeyî seyde û alim tevlî dibûn û digotin ku ”em wî li Medresa Werezûzê wi bicih bikin mabû û hizre ku hinek seyde û alimên ku ji Xizanê bûn, digotin ku em wî li Xizanê bicih bikin mabû”Ev herdû hizir li hole mabûn û seyde û aliman li ser nîqaş dikir.Hinekî weke ku zor ji dibû ku di nava van herdû hizran de li hevdû bikin. Seyde û alimên Xizanê û yên herêmê yên ku digotin em wî li Medresa Werezûzê bicih bikin, weke demekê li ber hevdû didin. Piştre, ku weke demeke din li ber hevdû didin, êdî di nava xwe didigihine biryaraka ku herkesekê li wir li ser lev bike.Ew biryar ji her weha ya, ku wê di nava herdû cihan de piş bikin.Piştre bi pêşengiye mîrê bota û mîr Ahmed pişkirinê ji dikin û piştre derdikeve ku Mihamed li medresa Werezûzê wî bicih bikin.Deme ku her weha biryar tê dayîn, êdî piştre ji Xizanê Mihamed amede dikin di kevine rê de ku herine werezûzê û wî li wir bicih bikin.Lê berî bi rê bikevin, di nava wan mijaraka din ji ku bicihkirina Mihamed ve girêdayî li ser nîqaş dikin. Ew ji niqaş ji li ser awayê bicih kirina wî dibe.Piştre ku hinekî nîqaş her weha ji di nava wan de dibêt, êdî berê ku bi rê bikevine û herine Werezûzê, çend seyde û alim bi hev re di kevine rê de û diçina Cizîre bota.Ew ji wê bi lezekê çûban Cizîre bota wê li wir Tirba Nebî Nuh wê mazin bûn û dirêj bûna wê wê pîvandiban û wê piştre ji wir, wê rastûrast wê hatiban werezûzê.Tirba Nebî Nuh, ji ber ku ew nebîyek bû, ji qama du mirovan dirêjtir hatibû çêkirin. Seyde û alimên ku diçina Cizîre bota, ew li wir Tirba Nebî Nuh ji di pîvin û piştre ji wir careka din bi hev re dikevine rê de û tên ku werine Werezûzê.

Piştî ku ew dikevine rê de û tên ku werine werezûzê, êdî yên ku wê Mihamed bianîyan wir û wê pêre bihatan ji ketibûn rê de û hatibûbûn wir.Ew ji piştî ku bi rê dikevin, êdî di demeke kin de digihijine wir. Piştî

ku ew digihijine wir, êdî piştre ne bi gelekî re, ew seyde û alimên ku çûbû bûna Cizîre bota ji divegerihin û têne wir. Li wir, piştî ku ew tên û digihijine wir, êdî bidest kolana tirba Mihamed dikin. Tirba Mihamed weke ya Nebî Nuh mazin û dirêj tê vekirin û ew têde tê bicihkirin...

Mihamed piştî ku tê bicihkirin, êdî haya çil rojî şênîya wî berdewam dike. Mirovên ku ji bo wî hatina wir, ji li wir dimênin haya ku çilê wî derdikeve. Piştre ku çilê wî derdikeve, êdî jev belav bûn dibe. Faqihên wî ji, yên ku li Xizanê ji li ber destê wî dixwandin, êdî hemû li medresa Werezûzê bicih dibin û piştre êdî medresa werezûzê dibe cihekî xwandinê ê mazin di herêmê de. Ji wir piştre ji, gelek alim dimênin û piştre ji ji wê medresê gelek alim û zanist derdikevin.

Mihamed ne tenê zanistek bû. Ew mamosteyek ji bû ji bo xalkê. Hertimî ew bifêr dibû û wî fêr dikir. Ew bi vê yekê mazin bû û bi vê yekê wî jiyana xwe berdewam kir.Wî hertimî rastiyên jiyanê û civakê anîn ser ziman.Ew ne tenê qancakî xwûde bû, ew qancakî herkesekî bû.Ji her kesekî re qanc bû û hertimî qancî û rastî dianî ser ziman û dixwest.Herkesekî wî wilo nas kiribû.Deme zihabûna wî ji, herkesekî zanibû û fahmdikir ku nirxekî wan yê çawa mazin û dîrokî winda kirina.Ew hertimî bi rastiyan re jîn bû.Wî rastî û rastteqîniya mirov û jiyanê pir baş û qanc fahm kiribû û têgihiştibû.Wê ew hertimî bi wê mazinatiya wî re di aqilan de mabana.Weke ku wî digot di civatan de, ”qancîya qancan bi wan re û bi navê wan re hertimî mayinda ya”.Wê ew ji bi qancî û hizre xwe ya mirovahî re wê wilo bana.Ew wê bi hijkirina xwe ya li jiyanê û li xwezê wê di aqilan de mabana.Ew wê bi navê FEQIYÊ TEYRAN wê hertimî li jiyanê bana û wê qancî bi navê xwe re bi bîre mirovan xistibana.Ji ber ku ew qancê qancan bû. Ew zanistê zanistan bû.Ew rast bû.. ….

.

Dawîya berga pirtûka Feqiyê Teyran a pêncemîn,

.

Cizîra bota, Kurdistan, Abdusamet Yigit.

**GOTINEK JI DAWIYA PIRTÛKA PÊNCEMÎN YE FEQIYÊ TEYRAN RE**

Li ser jiyana feqiyê teyran, deme ku me lêkolîn kirin û em bi mirovên ku di derbarên wî de xwedî zanebûn bûn re axiftin, me dît ku di derbarê hinek beşên jiyana feqiyê teyran de ne tenê bi awayekî bi çend awayan vegotin têne ve gotin. Aliyê ku em di vir de, di vê dawigotinê de li ser bisekin in, me girîng dît û me xwest ku werênine ser ziman. Di derbarê jiyana Feqiyê teyran, beşa ciwaniya wî de, deme ku ew rasti Dilberê tê, di derbarê wê beşa jiyana wî de, awayekî din ji tê vegotinê heya. Bêguman, deme ku em li ser hizir in, me wilo fahm kir ku ew beş ji, bi serê xwe, hêjaya ku mirov pirtûkekê bi serê xwe li ser bi nivîsêne. Emê, nahaka di vir de, tenê, bi sereke li ser bisekin in. Deme ku pirtûka jiyana feqiyê teyran, were nivîssandin û ev beş ji newê ser ziman, wê li gor me kêmesiyak bûbana. Ji ber vê yekê, me hewce dît ku divir de, bi sereke ji bê bênine ser ziman.

Deme ku Feqiyê Teyran, ji cem şêx ji Îdîrê di vegerihê malê, êdî wilo zêde li malê namêne. Piştre, ne bi gelekî re, hizre çûna Cizîre bota di serê wî de şaq dide û piştre, ew ji, na sekinê û di cih de xatir ji dê û bavê û ji seyda û dordore xwe dixwezê û piştre dikevê ser riyan de. Deme ku dikeve rê de, di rê de, deme ku tê ber çiyayê reş û li wir rastî Dîlberê bidil êş tê, êdî piştre, li wir dimêne. Demekê li wir dimêne. Weke ku di awayê vegotinê ye din de tê vegotin de, Feqiyê Teyran, piştî peyamê ji Dîlberê digirê û dikevê de ku herê mala bavê wê, êdî piştre li ti derî ne sekinê hata ku tê ku were mala bavê wê. Lê deme ku tê mala bavê wê, ew hê ku ne çûyî mala bavê wê, agahiyê dihildê ku wa bavê wê çûya ser dilovaniya xwûdê. Piştre, Feqiyê Teyran, li gor kevneşopîye tevdigerihê û diçê mala birayê Dilberê yê mazin. Ku deme ku diçê mala wî, êdî deme ku li mala wî dimeyîzenê, êdî ku li çi meyîzenê. Dibîne ku wa mirovekî mîr wê di qasrê de ya û li civata xwe rûniştiya û wa li dore wî ji, gelek mirovên ku rûniştîne hene. Feqiyê Teyran, deme ku diçê wir, êdî pêşi weke ku kevneşopîye, pêşi silavê dide dorê û piştre li nav civatê dirûnihê. Civat, pir mazin a. Pir mirov li hevdû li civate birayê mazin wa rûniştî ne. Feqiyê Teyran, pir bi bandûr dibe. Feqiyê Teyran, deme ku dirûnihê. Di cihê xwe

de bêtebat di sekinê. Hadan û qarana wî nayê. Ew dixwezê ku di cih de peyama Dîlberê bide birayê wê yê mazin û ku ew bi wê ve herin. Lê Feqiyê Teyran, çi dike û nake, nikarê bala birayê Dilberê yê ku di wê kêlîkê de li civatê wî rûniştiya bikişêne ser xwe. Lê piştre ne bi gelekî re, wilo li Feqiyê teyran tê ku weke ku wî Feqiyê teyran kifşkir, lê eleqe xwe jê ne anî. Piştre, Feqiyê Teyran, Çend caran, ji cihê i lê rûniştiya xwe derdixe pêş ku balê bikişêne.Lê çi dike û nake balê nakişêne. De ne, Feqiyê Teyran, hê li li cem Dilberê bû, Ji wê hiskiriya ku ne tenê birayekî wê heya. Birayên wê yên din ji hene. Piştre, ne bi gelekî re, Feqiyê teyran, farq dike ku wê çibike û neke wê mafê axiftinê ji bo ku bi birayê wê yê mazin re biaxivê wê ne stêne. Ji ber vê yekê, ew weke ku bê sabr dibe û ji cihê xwe dirabê ku herê birayê wê yên din bibîne. Deme ku ew ji cihê xwe dirabê, Êdî Feqiyê Teyran, ew rabûna wî, yekî ku di wê heyemê de ji civatê re suxratî dikir ji cihê xwe di rabê û bi ber wî ve diçê û ku Feqiyê Teyran derdikeve derve, ew ji pêre derdikeve derve. Ku derdikeve derve, êdî piştre ew digihine hevdû û bi silavdana hevdû re bi hev re diaxivin. Piştre, ne bi gelekî re, ku hinek di axivin, Yê suxurvan, ji Feqiyê teyran re dibêje ku ”birayê mîr wî yên din ji hene û riya qasra birayê bin yê mazin re şanî wî dike û Feqiyê teyran rê digirê û diçê qasrê birayê bin yê mazin re.

Feqiyê Teyran, ku tê wir, li wir ji, heman rewşê dibîne. Dibîne ku wa ew ji li qasra xwe rûniştiya û li dore wî ji, gelek mirov yên rûniştî hene û ew di nav wan de ji wan re diaxivê. Biqasî ku tê vegotin, Feqiyê teyran li wir ji, weke ku çawa ku li mala yê mazin bê eleqe mabû, li wir ji wilo bê eleqe dimêne. Piştre Feqiyê Teyran ji wir ji dirabê û diçê ku derkeve derve û piştre derdikeve ji. Lê deme ku derdikeve, li derve, rastî mirovekî ku navserî xwe tê û ew mirovê ku nav serî xwe ji li cem wî disekinê û jê re dibêje ku birayekî wan yê bin re yê dî ji heya. Ku Feqiyê teyran, wilo ji wî his dike, êdî nasekinê û di cih de ji wî lava dike ku wî bibe wir mala wî birayê wan yê biçûk. Piştre feqiyê Teyran û ew mirov bi hev re diçine mala wî, birayê wan yê biçûk. Lê deme ku herdû bi hev re diçine wir, êdî li wir ji, weke ku çawa ku li qasra birayê mazin û yê bin wî re bê eleqa mana, li wir ji bi heman awayî wilo bê eleqa dimênin. Piştre Feqiyê teyran, ku weke ku tişîbûyî derdikeve derve û deme ku derdikeve ji, ew mirov ji pêre derdikeve derve. Ku derdikevine derve, li devê derî, Feqiyê Teyran li wî mirovê ku wî anîya wir lê dizîvirê û bihêrs dibêje ”ev çi bêkevneşopîya, ti carî ez rastî tiştekî weha ne hatima” û piştre derdê xwe ji wî mirovî re ji serî hata binî dibêje. PIştre ew mirov ji, hinek dihizirê piştre li Feqiyê teyran di zîvirê û dibêjiye de ku ”nahaka ev hersê birayên hevdû yên ku ti

çûyî mala wan, yên ku kurên(zaroyên) mîrê me ne. Hingî, civatên wan hertimî wilo tişî ne, hertimî wilo, weke ku te dîtî, weke ku xwe windakin heya ji axiftina wan ji ti kesekî nemêne. Lê mîrê me yê mazin, ne tenê bi jinekê bû. Ew bi du jinan bû. Ev keça ku te bahsa wê kir, ne xweha van hersêkan ji ye maf(haq) e. Ev keç û ku birayekî wê yên din ji heya, ji jiyana mîrê me ye dawiyê ne. Ew, birayê wê yê maf ji, ew ji li qasre xwe ya û li dore wî ji her weha wilo civata wî li dar e. Ka vêce were ezê tê bime wir cem wî ji. Lê ew, di vê demê de, ew keça ku tê bahs kir, xweha wî, ji ber ku bi kuramê xwe re ravî û çû û bê destûra wî çû, êdî ew ji pir ji wan herdûyan ji bi hers bûya. De ne, bavên herdûyan ji ne lev bûn. ..”Piştre, herdû, Feqiyê teyran û û ew mirov, didine rex hevdû û dikevine rê de ku herine qasra wî birayê wê yê din. Deme ku diçine wir, hingî, Feqiyê teyran, heman, rewşê li wir ji, tê gotin ku dibîne. Lê deme ku diçine wir, li wir ji aliyê wî ve rastî eleyeqeyeke pir mazin ji tên. Piştre Deme ku her weha rastî eleqê tên, Feqiyê teyran, ji serê haya binî meselê ji wî re têne ser ziman. Ku ew birayê wê, her weha ji devê Feqiyê Teyran meselê his dike, Piştre ne bi gelekî re di cih de hêzeke mazin ku mirov bêje artişaka mazin e, lev dide hevdû ku xaberê dide birayên xwe yên din ji û piştre bi hev re dikevine rê de û diçine bi xweha xwe ve. Ku diçine wir, yên ku ew tişt aniya serê wê, ew ji bê bersiv nayê hiştin. Wî ji, bikuştina wî, xwûna xwe dihildin(divir de zargotin, qasîdekirin di kevê devrê de), dihildin, êdî piştre, di rajihine xweha xwe û di vegerihin. Dilberê, hata ku sax e, êdî bi wê êşa dilê xwe dimêne..

Ev aliyê ve gotinê ji, her weha ku tê vegotin, bi civatî tê vegotin û biqasîdeyên ku di nav vegotinê de têne vergotin re hinekî dîrêj ji tê vegotin. Lê di vir de, divêt ku mirov bêje, deme ku bi vî awayî bahs tê kirin, di vegotin e du tişt derdikeve pêş. Yek Dilberê û êşe wê û ye din ji her weha felsefe Feqiyê teyran ye ku di deme vegotinê de bi qasîde bê û an ji bi vegotinên mirovên ku li civatê rûniştî bin, tê ser ziman. Bi vê deme k bahsa hizre wî tê kirin ji, bi hizreke ku têde têgihiştine rastteqîniyê bi nav tê ser ziman, pir mazin tê vegotin. Ev aliyê vegotinê yê vê beşa jiyana feqiyê teyran, ji ber ku deme ku hata vegotin û bala me bi hizirên ku hatina ser ziman re kişand, êdî me anî ser ziman. Ku bahsa hizrên wî di wê de dihata kirin, weke ku yek pirtûkekê ji ber bixwêne dibû. Her weha dihata ser ziman.Bi vê beşa jiyana wî re, beşeke ku jiyana wî ye ku ew li Cizîre bota ya û bi ava Diclê re diaxivê ji, pêve tê ser zimand di wê heyemê de.

Bi rastî ji, ji vî aliyî ve ji, hêjaya ku mirov pir li ser jiyana wî bisekinê. Her aliyê ku pê tê vegotin, hemû ji bi hizir têne vegotin. Ew alî hemû ji

mazin têne vegotin. Bi vê yekê re, em weke gotinekê ji bê, weke gotineke bi bersiv ji wê deme ku di van demên dawiyê de ew tê ser ziman û jê re tê gotin ku ew ”helbestvanak”e re ji, bênine ser ziman. Li gor me û têgihiştine me ye ku bi wî re çûbûya, pêdivî bi vê yekê ji heya. Ji feqiyê teyran re, weke helbestvanekî bahs tê kirin. Bi rastî ji, ew di jiyana xwe de, bi zimanê xwe yê ku pê diaxift, weke helbestvanekî bû. Lê li gor me, ku mirov bêje ku ew tenê helbestvanek bû, wê ne rast bê. Ew zanistek bû û fîlozofek bû. Alimekî mazin bû. Ew, yekî ku di zanebûn û têgihiştine xwe de pir mazin bûbû bû. Her weha divêt ku mirov vê yekê bi teybet bêne ser ziman. Wî, di jiyana xwe ye ku jîn kirî de pir ji nivîsandiya Gelek ji wan nivîsên wî yên ku wî nivîşandina ji, î ro, di destê me de nîn in. Lê ku mirov ku li ser wî lêkolîneke hesanî dike mirov vê yekê fahm dike ku wî pir mazin nivîsandiya. Ew zimanê wî yê helbestî ji, mirov divêt ku bi hebûne pêşketine kurmancitiyê re bêne ser ziman. Kurmancî, di demên xwe yê pêşketine de, piştî demeke pêde, bêjeyên ku di xwe de diafirêne ji, bêjeyên ku yên têgihiştin û demên têgihiştinê ne. Bi wan deman ji, bi hezaran salan pêşketinên mazin di xwe de çê dike. Ew ji deme ku têne ser ziman, wilo bi wî zimanî xweşik têne ser ziman. Ma ku mirov wî weke helbestvanekî ji ber wî zimanê wî yê heêbestî weke helbestvanekî bêne ser ziman, hingî mirov wê Êlî herîrî û wî zimanê wî yê ku bi felsefeye estetîzmê hatiya şiştin çawa û biçi awayê bêne ser ziman? An ji, mirov ku hinek ji deme Êlî Herîrî bi vir de were, mirov wê Seydeyê mazin meleyê Cizîrî, wî û wê zimanê wî yê xweşik û bifelsefeye estetîkê çawa bêne ser ziman? Felsefe, ku bi mirov re bû û têgihiştin bi mirov re dibe, bi xwe re serweriyekê ji bi zimên re bi mirov re têne. Her weha mirov divêt ku vê yekê ji ji bîr neke û bêne ser ziman. Bêguman, ev yek ji, bi Feqiyê teyran re heya. Lê kurmanciya ku Feqiyê teyran pê diaxift ji, kurmanciyaka ku hê î ro ji em kurd di wê astê de ne axiv in…

Cizîra bota, Kurdistan, Abdusamet Yigit

.